

# CİGERXWİN



# FOLKLORA KURDİ



weşanê n  
ROJA NÜ

**CİGERXWİN**

---

**FOLKLORA KURDİ**

WEŞANÊN ROJA NÜ: 25

Döbelnsgatan 16 B, 2 tr.  
113 58 Stockholm/Sweden


Gulan 1988 - Stockholm

ISBN 91 7672 024 1  
© Kesra Cigerxwin

**CİGERXWİN**

**FOLKLORA  
KURDI**

**kurmancı**



**weşanên  
ROJA NÜ**

## **EFRANDINÊN CİGERXWİN YÊN HETA NIHA ÇAPKIRI**

---

1. *Diwana yekem, Pirisk û Pêti, Suriya 1945*
2. *Cim û Gulperi, Çiroka yekem, Suriya 1948*
3. *diwana Duwem, Sewra Azadi, Suriya 1954*
4. *Reşoyé Dari: Çiroka duwem, Suriya 1956*
5. *Gotnînê Péşîyan, Suriya 1957*
6. *Destûra Zimanê Kurdi, Iraq 1961*
7. *Ferheng, Perçê Yekem, Iraq 1962*
8. *Ferheng, Perçê Duwem, Iraq 1962*
9. *Diwana Sêyem, Kime Ez, Libnan 1973*
10. *Midya û Salar, Libnan 1973*
11. *Diwana Çaran, Ronak: Swêd 1980*
12. *Diwana 5'a, Zend Avista, Swêd 1981*
13. *Diwana 6'a, Şefaq, Swêd 1982*
14. *Diwana 7.a, Hêvi, Swêd 1983*
15. *Tarixa Kurdistan-1, Swêd 1985*
16. *Diwana 8'a, Aşiti, Swêd 1986*
17. *Tarixa Kurdistan-2, Swêd 1987*



# PÊSGOTIN

## FOLKLORA KURDİ -Kurmanci-

Bê gomane ko dewlemendî û mezinahîya zimana bi folklor û rewş û pergala tore, rist û nivîsarên waye.

Ci zimanê ko folklor û tore têde fireh û mezin bûne, ew ziman, zar, şîwe ji zimanên mezin têne ji-martin. Her wekû pêşveçûna dezgeh û jîna civakî jî, yek ji van tiştane, ko ziman pêşve dabin û fireh dikan. Lê ji ber ko, em, niha di dabaşa folklor da ne, dixwazin vê dabaşê bidin xuyakirin.

Di vê meydanê de zimanê kurdi -zare kurmancî- gelek dewlemend û mezin û payedare. Ji her nifşî helbeste, lawik, heyran, istiran, serpêhati, çîrok û lîzîkî dagirtîye. Kurd ji biçûkayî de zarokên xwe hîni van tiştan dikan. Hê di pêçekê de, dê, ji wan re dilorêni û dîrok, istiran û çîrokan dibêjî. Di berê dinawireni ji lewra çawa çavê xwe vedikin û zimanê xwe digerînin, dest bi rist û hûnan û istiranen dikan û bi her tiştî dilizîn û di şevbiwérken xwe de hîni van tiştan dabin. Ji lewra dibênin, ko zarokên Kurd xudriste, hozan û hisyarın, dengbêj û çîrokvanin.

Lê pir cihê axîne, ko heta Sedê Bîsta jî, tişteki hêja di vê meydanê de nehatîye çekirin, nehatîye nivîsandin û belavkirin. Belki jî, nehatîye bîra kesî, ko berê xwe bidin vi karî û karekî bi rûmet jî welat û gelê xwe re bikî.

Tenê di vi Sedê Bîstem de çend nivîst bi zare kurmancî li Ermenîstanâ Soviyati hatine belavkirin. Çawa, ko li nav kurdê Iraqê zare soranî jî destek nivîştên hêja hatine çapkirin.

Tenê kurd, pirên kurd nikarin ji van niviştan kareke hêja bikin, herwekû nikarin bi tevayî rewş û pergala zimanê xwe û folklorên xwe nasbikin. Ji ber ko, kurd, hemî ne bi şîwakî tevayî dixwênin û dinivîsin.

Ji i Lewra, di iro de, gereke bi herdû şîwan hemû nifşen xwendewarî bête çekirin û gotin û nivîsandin û belavkirin heta, ko rojekê karibin herdû şîwan bikin yek û bîghênen hev.

Her ciqas şîweyê sorî bi pêşve herî jî, lê nikarı daxwaza xwendewarêñ kurd bi pirîtî bicibenî. Ji ber ko, ne weke şîwê kurmancî dewlemend û firehe, çawa ko di hindameke pir biçük de hatiye givaştin, ko ji sedî bîst kes nikarı jê hin bibî û daxwazê nadî naskirin.

Belam şîweyê kurmancî, tevlî ko zêde dewlemende û her nifşen tore, hel Beste, lawik, heyran, serpê-hatî, istiran, çîrok û lîztkan di nav xwe de digri û ewqas daxwazâ jî didî zanîn û naskirin û nazik û kêm tevger û kêm tîpe.

Xwendewarêñ delal, çendan, ko ev nivişten me ne di reza nivişten xelkê de ne jî, lê gelek bawerim ko winê di van nivişt û nivîsaran de gelek tişten hêja û şayanê şabaş û aferîn bibênin û bixwênin. Herwekû pir hêvidarim, ko winê piştî me re hêj xweştir û çetir binivîsin û bêtir pêşve bibin. Ji ber ko, pir hêvî heye, ko çax û demen we ji ên me xweştir û çetir bin.

Di iro de, ci tişten ko em bixwazin çekin, nikarin tekûz û pêkhatî benin meydanê. Ji ber ko, welate me di iro de bi çend xézan di nav çend dewletan de hatiye perçekirin û hemû jî, nahêlin heta em bi zimanê xwe tiştîkî bibêjin û ji hawîr zor û setem weke hîm û latan bi ser pişta me de hatine berdan û nikarin bi hêsanî xwe ji bin giraniya wan derxin û ji zindanê wî de ji pere bi dest me nakevin û heta dewlemend û miletperweren me jî, ne tenê çikusin, pera nadin, belki şerê me bi hovîti dikin.

Ca eger hin çewti, kêmâsi jî we dîtin, rast bikin û derbasbin, li me negrin. Bê goman rojek heye, ko win van kevnenvişa bixwênin û rast bikin, bi pêşve

bibin û kareke mezin ji wan bikin. Emê ji were kok bingehê wan deynin û win bi serve avabikin yan ji çêtir bikin û wan kevnenivîştan di refikan de bihêlin! Bere başên wan ji werebin û kêmeşî û çewti, guneh û súc ê me bin. Ji berê de dibêjin: "Rûnê genî li ser nanê xwedi".

Di vê niviştê de, wine helbeste, dîlok, heyran, lawik, istiran, serpêhatî, çîrok û lîztikan ji geleka bibênin, herwekû "Bêlote", "Berdestarî", "Berdolabî", "Berdan" û di nav re hin rîstên kurmancî û gotinê pêşîyan ji bibênin û dixwazim hina ji wan vewejerim, ji hev bidim jendin û bîr û awira xwe ji li ser wan bidim xuyakirin û hina ji li hêviya we bihelim.

1965/11/27

CÎGERXWÎN

# PÊSGOTIN

"FOLKLORA KURDI" berhemâ mamosta Cigerxwin ya 18'an e, ku heta niha tê çapkırın. Bili van hijde kitêban, qasi bist-bistûpênc berhemén wi yên neçapkırı hene. Di nav kêm miletan da edib û niviskarên mina Cigerxwin afrandkar hene. Wi piştî xebateke 50-60 salan, xezineyeke mezin pêskêsi literatura Kurdi kîr.

Cigerxwin naveki mezin e. Bêşik navê seydayê mezin, wê bi herfîn zérin derbasi diroka edebiyata Kurdi bibe. Ü bêşik mezînahiya welatparêz û şairê mezin, ne tenê ew e ku, wi bi hejmareke geleki bilind pirtük, nîviştên hêja pêskêsi çand, ziman û edeba Kurdi kîriye, lê herweha ew militaneki şerê azadiya gelê Kurd bû ku, ji 50 sali zêdetir, bêwestan li meydana têkoşinê xwiya kîr. Heta roja dawiyê ji, baweri hêvi û xebata xwe ji dest berneda.

Çiroka jiyana Cigerxwin, têkoşin û xebata wi ya dûrûdîrêj neynîka diroka gelê Kurd ya sedsala 20'an e. Di bendeke pêsgötineki da, derbari vi insanê mezin da nîvisandin, û bi her ali va danasina wi ne mumkun e. Lê bi kurtebiri be ji, di pêsgotina vê xebata wi ya hêja da, em careki disa li çiroka jiyana wi bînhîrin û wi bi hurmet bi bir binin.

Navê CIGERXWIN yê rastin Şêxmûs e. Lawê Hesen û Eyşanê, di sala 1903 da, li gundê Hesarê nêziki Mêrdinê, li Kurdistan Tîrkiyê hatiye dinê. Malbata Şêxmûs, beri şerê cihanê yeke-min, ji ber tengasiyên abori mala xwe ji Hesarê bardîkin dibîne Amûdê. Lî wîr, Şêxmûs hin 9-10 sali büye dê û bavê xwe wînda dike. Piştî mirîna dê û bavê xwe, ew li ba xwişka xwe Asiyayê sîtar dibe, dest bi rîncberiyê, şîvanti û gavantiyê dike. Di navbera salên 1918 û 1920'an da, di riya hesin da dixebite. Di 18 saliya xwe da dest bi xwendîna dini dike. Di sala 1928'an da icaza melatiyê distine û dibe pêşnimêj.

Wextê Şêxmûs feqeh bû, li Kurdistanê geleki geriya, jiyana gelê Kurd, erf-edetên Kurdi, pîrsûrêkên cîvatê baş nas kîr. Bi serhildana sala 1925'a ya Şêx Seid Efendi ra, giyanê niştîmanperweriyê li ba Şêxmûs peyda dibe. Ji wê salê şûnda Şêxmûs Hesen dest bi xebata xwenasiya netewi, propaganda şerê azadiya Kurdistanê dike. Sedemân paşdamayina gelê xwe, zîlm û zorddestiye dewletên dagîrker, kedxwari û sitema axa û şêxên Kurdistanê dibîne û li diji wan şer dike. Cubeyê melatiyê datine aliyeki, disa dest bi rîncberiyê dike û pêra ji helbestan dîniwîse. Edi ew şervaneki azdiyê ye. Ji bo hisi-yarkırına gel, geşkirîna ağıre azdiyê, helbesten wi, li se-

ranseri Kurdistanê dibin defa hawarê. Ew bî riya fegeh û melayên welatparêz xwe digihinin her derê Kurdistanê; dibin mars, dibin stran û li ser lêvên dengbêj û hozanan, keç û xortan digerin.

Cigerxwin, helbestvaneki têkoşer, ronahidar û internasyonalist e. Helbestên wi, bî peyamên şoresger û sosyalist dagirtine. Gelê Kurd ê bindest, beri hertiştî gereke hisiyar bibe, dost û dijmînên xwe baş nasbîke; wek mîlet, bî xwe, bî çand, zîman û diroka xwe serbilind be, xwe këmtîr nebîne, weletê xwe baş nasbîke. Jî bo rîzgariya netewi û cîvaki, pêwîst e karker û gundiyyen Kurdistanê xwe rîz bîkin, qedera xwe û weletê xwe bigrin destê xwe. Pêwîst e jîna Kurd bîxwîne, zane be, dişerê azadiyê da cihê xwe bigre. Hingê gelê Kurd dikare jî jiyanâ sedsalen navin, jî paşverûtiya feodalî xwe xîlas bike, dijmînên ku welat dî nav xwe da parvekîrine, derxe derva.

Şair û mamostayê mezîn, dî praktika jiyanê da, 50 salan jî bo bî cih anîna van ramanan xebiti. Heta roja dawiyê ji 22.10.1984'an da ku çavê xwe li jiyanê gîrt, ew endamê rexistîneke siyasi bû... Militaneki 80 sali bû.

Aha "FOLKLORA KURDI" niha dî destê me da, şahidike dîn e ku Cigerxwin ne tenê bî gotinê, bî kîrinê ji rê nişan daye. Wi dî vê pirtûkê da gelek nimûneyen folklorâ kurdi berhev kîriye, ew jî windabûnê xîlas kîrine. Cigerxwin nemîr e. Gelê Kurd wê vi lawê xwe yê payebilind, dî çand, zîman û diroka xwe da hertim bî bir bîne.

#### X. LEZGİN



**Perçê Yekem: HELBESTE Ü BERDILAN**

**EZ KEVOKİM LÊ LÊ**

Ez kevokim lê, lê  
Kevoka şinim way, way  
Li ser bana lê, lê  
Ez dixwînim way, way  
Ji xelkê weye lê, lê  
Har û dînim way, way  
Ez aşiqê lê, lê  
Çavêñ şinim way, way.

Ez kevokim lê, lê  
Kevoka besim way, way  
Li ser bana lê, lê  
Hûr dimeşim way, way  
Ji xelkê weye lê lê  
Ez nexweşim way, way  
Ez aşiqê lê, lê  
Çavêñ reşim way, way.

Ez kevokim lê, lê  
Kevoka sipîme way, way  
Li ser bana lê, lê  
Xwes danîme way, way  
Ji xelkê weye lê, lê  
Ez xwînî me way, way  
Ez aşiqê lê, lê  
Jinka bî me way, way

Ez kevokim lê, lê  
 Kevoka nêrim way, way  
 Li ser bana lê, lê  
 Xwes diçêrim way, way  
 Ji xelkê weye lê, lê  
 Ez newêrim way, way  
 Ez aşiqê lê, lê  
 Jinka mîrim way, way.

Berî her tiştî müsîqa wê, di Rojhilate Navîn'de deng daye. Şeş tevger têde hene û pir bi sivikî tê gotin. Heta mirovên biyanî jî pê dilxwes dibil û bi ser xwe de dipûjinin û guhdarî dikan. Çawa, ko bi dengê Hesen Cezrawî ketîye qawan û şeritan û hatîye belavkirin. Hesen gelek xwes û sivik dibêjî; lê mixabîn, ko gelek çewti û şâşîyan têkel diki û ji cem xwe jî li ser zêde diki û ne rast dibêjî.

Lê ne guneh û súcê Hesene. Ji ber ko, kore û nexwendîye. Diwabûbihata nivîsandin û jêre bihata xwendin û gotin.

Bi rasti, dengê Hesen Cezrawî gelek xwes û hêjaye, lê ji ber ko nexwendîye, nikarî berepêş gavêndi vê meydanê de bavejî. Çawa, ko müsîqarê kurmancî nûjen peyda nabin û müsîqa kevnare hew bi kêrî guhê mirovên Sedê Bîstem tê.

Hesen dibêjî: "Kevoka dînim", lê diwabû bigota: Kevokê dînim. Ji ber ko, kevokê nêr aşiqê kevoka mê dibî, çawa, ko dibêjî: "Ez aşiqê lê lê çavê şînim" û li xwe vedigerî û dibêjî: "Ez maşûqe lê lê, çavê şînim way way".

Gelek diriste, ko em bi çavê felsefê lê binérin, ko Seydayê Cizîri gotîye: "Aşiq û maşûqi yekbûn, şeme û hem perwane bû", lê ev diriste, eger em xwedenas bin û dikarin wê çaxê bibêjin: "Xwedê hem aşiq û maşûqe, lê di mirovan de ev hinek dijware.

Lê Seydayê Cizîri, di berya vê ristê de dibêjî: "Berî ko ev cîhan -sitêr, çerx, tevger- peyda bibin jî, işq hebû. Lê eger, yek jê bipirsî: Ev cîhan nebi, çawa aşiq û maşûq wê hebin? Seyda, di bersîva wan de gotiye:"Herdû jî yek bûn û herdû jî Xwedê bûn."

Yanî, Xwedê weke findê ronî didî û weke perwane xwe dişewitênî. Lê ji ber Hesen ve, bi awayê felsefi, dikarin bersîv bidin û bêjin: Mirov hem aşiq û maşûq û tev ji hev hez dikin yan jî, ji ber ko, jin û mîr ji hevin û di koka xwe de mirovanî hemû yeke, diriste, ko aşiq û maşûq yek bin.

Çawa, "çavşîn" di awira Kurmanca de ne gelek şerîn û xweşikin. Herwekû di "Çaçanê" de hatîye gotin: "çav şînê, çav şeytanê" û carna Kurmanc dibejîn "çav pisîkê". Ji ber ko, pirêñ kurdêñ welatê me çavres û ji çavêñ reş yan belek hezdikin û istiran û dîlokan li ser dibêjin.

Lê bestebêjê me, weke kelokorê Aliya lê hatîye, ko dibêjî, careke aşiqê çavêñ şîn û careke aşiqê çavêñ reşe; carna aşiqê jinebi û carna aşiqê jina bime-re. Ji lewra tê bîra min, ko ev dengbêj miroveki xwedi kemançeye û di ber govendê re diçî û tê û dixwazî dilê dîlanvana tevan xweş bikî yan ji xwe nehêli.

## AX Û AMAN GULÊ

Ax û aman gulê  
Wey derd û derman gulê  
Wey deşt û zozan gulê  
Wey ebrû nisan gulê  
Keça Mîrê Müsile  
Min destê xwe kir paxile  
Çi paxilek xwêdayî  
Serê memika hildayî  
Min girt û ramûsayî.  
Wey ax û aman gulê.

Hey gul bû, gul bû, gul bû  
Reyhan û qernefil bû  
Baranê lê kir şil bû  
Wey derd û derman Gulê  
Wey deşt û zozan Gulê  
Hey ax û aman Gulê.

Îşev şevka baranê  
Cîka deyne li eywanê  
Eger tu dosta minî  
Eger tu yara minî  
Tu jimir were eywanê  
De ax û aman gulê.

Îşev şeva berfêwo  
Cîka deyne li hewşêwo  
Eger tu dosta minî  
Tu jimir were odêwo  
De ax û aman gulê.  
De ax û aman gulê

Di vir de navê keçikê (Gulê) hatîye xuyakirin û didî zanîn, ko bixwe keça Mîrê Mûsîlê ye, le mixabin navê lawik nadî zanîn û heta em nizanîn ji kîjan welati ye.

Lê kurik gili û gazinan diki û dibêjî "ax û aman gulê, derd û derman gulê" û didî zanîn, ko hem derde û hem dermane û gili û gazinêñ xwe tenê ji gulê, ji yara xwe diki û dibêjî "derd û derman gulê..".

Lê bi rastî pir xweş anîye, ko hem derde û hem dermane. Raste, ko ev derd û kul û nexweşî hemî, ji destê Gulê-keça Mîrê Mûsîlê hatine serê wî û gotineke tenê kul û derdên wî derman diki. Dektorê herî mezin Gula wî ye, ko tenê bêjî ez ji te hezdikim!

Wey deşt û zozan gulê  
Wey ebrû nîsan gulê..

Ez baş daxwaza wî, ji van herdu peyvan, nasnakim. Lê gelek diriste, ko daxwaz ji deşt sînga wê bî û zozan dêmîn Gulê bî? Herwekû ebru navdarin, ko ew herdu kevanêñ zirav, ko qoziyen xwe bi ser hinaren dêman bi civ û şikesti berdane, ko weke qews, qezehêñ meha Nîsanê xweşîya biharê didin xuyakirin.

Lê hin dibêjin, "ebrû nîsan gulê" wê çaxê bi daxwaza erê, na té gotin, yanî ebrîwên te nişanê erê, na didin xuyakirin. Ca eger, bi rexekî ve civandin nişanê erê ye, lê ko berbijor bilind kirin nişana na ye.

Lê ci dema, ko bi xwar ve berjêr bikî û çavên xwe pêre bigri, dibêji: Wey ser herdû çavê min, nişana erê ye.

Pire caran dost û yar bi çavan bi hev re dipeyivin. Ji ber ko, nikarin li ber xelkê her tiştî ji hev re bêjin. Carna bi çavan li hev têñ û carna jî ji hev dixeyidin.

Lê çawa xuya dikî, Gulê-Gula wî erê kiriye û belkî jî, destûra wî li ber û bostanê bejn û bala xwe daye û bê tirs û bê pirs direjî nav sing û beran kiriye û gotiye:

Çi paxilek xwêdayî  
Serê memikan hildayî  
Min girt û ramûsayî  
Wey ax û aman gulê.

Çawa, ko té xuyakirin, xortê kurd gihaye daxwaza xwe, wiло jî kêşan û dawiya dîloka xwe guherandîye.

Gelek caran çend beytan li ser hev direj dikî û carnan sê, çarka li pey hev dibêji û her tim her çend risten dawi digori, xuya dikî daye ser şopa seydayê Cizîri, weke min.

Herwekü di awira min de jî, guherandina dawi di ristê de tiştekî pir hêja û xwes e. Lê, çima şeva barane u şeva berfe dixwazi be civane yara xwe? Bawerim, ko di şevê berf û barana de tevger gelek hindike û kes bawer naki, ko yek bê civanê yara xwe û heta xwedîyê Gulê jî, pê şiyar nabin û meydan ji wan re vala dimêni.

## AX Û EMAN ÇAÇANÊ

Ax û eman çâçanê  
Keça Elî Keyanê

Bûka Ehmed Şabanê  
Çav şînê çav şeytanê  
Ezê çeço birevinim  
Bibim dora Sînanê  
Ax û eman çâcanê.

Min çeço dîbû li nav reza  
Kiras sorê geweza  
Çûme memkê te bi geza  
Ezê çeço birevinim  
Bibim welatê Xerza  
Ax û eman çâcanê.

Min çeço dîbû li ser bîrê  
Av kişiandî bi zencîrê  
Zencîr qetîya ket bîrê

Di vir de, bavê Çaçanê û xezûrê wê dane zanîn, lê negotîye ji kuye. Tenê weke, ko tê xuyakirin, gereke ji rojavayê Diyarbekir bî. Ji ber ko, tim di-xwazî wê birevîni û bibî dora Cizîrê û Xerza û Sînanê, dixwazî ji welatê xwe dûrbikî, ko kes nikaribî heta şopa wan jî nas bikî.

"Çavşînê, çav şeytanê" gazina jê dikî, ne ko êrişî çavên wê dikî. Lê, çavên şîn di Kurdistanê de ne gelek şerîn û cihê rindî û payedarî ne, weke çavên reş çendan, ko li nik min gelek xweşik têne xuyakirin.

Tenê nizanim, ka dawîya rista wî, ko gotîye: "Av kişiandî bi serhêni, ezê çeço birevinim", wê bi kude bibî?

Ü nizanim wê bibî kijan welati? Ji lewra, min pitikênen şîn li cihê wê danîne, lê "serhêni" yan "selhêni" navê nifşek kûze, ko li gundê Selhê çedîkin yan jî weke kûzê Serhanê mezêne Hevêrkaye. Lê ya pêşî bêtir nêzîkî daxwazê ye, tenê r bi l hatîye guhertin û ev di zimanê kurdi de tişteki tevayî ye. Ji ber ko, tipen "Yermelûn" tev bi hev têne guhertin.

Herwekû kûzên Selhê, Batê di welatê me de gelek navdarin, ko ava wan sar dibî, yan ew avê sar

dikin.

Gelek caran lawik dibêjî "Çeçiko", ev, ko gelek caran ji bo şiranî, biçuki di zimanê kurdi de hatîye, herwekû ev nav (Çaçanê) ji navê miletê, "Çaçan" hatîye, ko bi ciwanî û gernasî navdar û bidengin. Çawa, ko gelek caran navê welat û çiya û bajaran ji li zarokên xwe dikin, weke Çaçan, Faris, Ereb, Zagros, Rojhilat, Midya, Silîva, Mehabad, Barzan..

Gewez navê rengekî ye (Sorêgewez). Lê çawa li tevgerên wê temaşa kiriye, çawa çuye ser birê û zencîra wê qetîyaye? Ev tiştekî bê gomane, ko xortekî dilgirtî herdem li şopa yara xwe çavên xwe digerêni û bi kude herî wê ji çav xwe nakî û weke siya bejna wê pêre digerî û heta di xewê şevan de jê dûr nakevi.

Herwekû daxwaza wî ji Cizîrê, Cizîra Bota ye, ko cihê derebegiye Bota bû û ji ber, ko di navbera herdû perçen Dicle de hatîye avakirin, jêre gotine Cizîr. Bi daxwaza Cizîre, navbera du ava, du zevîya, navbera dewlet û miletê.

Lê çima gotîye "Ava binê şerbiko": Ji ber, ko ava binê şerbik gelek hindike û çawa mirov vedixwî, naxwazî tiştekî di binî de bihêlî û pir bi şiranî vedixwî û çavê hevalên mirov jî têde ye. Çawa, ko "dimsa rezê xerzik" jî wilo şerîn û dile mirov xweş dikî. Ji ber, ko mirov nû xwarina xebata destê xwe dixwî.

Lê xwezî dikî û dibêjî: "Xwedê te bi rizqê miko", amîn-amîn. Lê Kurdan berê gotîye: Kes bi xweziya naghe baqê keziya..

Lê, ez nizanim, lawikê kurdi gihaye doz û daxwaza xwe ya na?

\*\*\*

## ÊMOŞÊ

Hey lê lê lê lê lê lê lê lê lê Emo  
Xulem keçka bi dê-mo lêlê Emo  
Xilxalê lingê wê-mo lêlê Emo  
Bazinê destê wê-mo lêlê Emo

Kembera piṣṭa wê-mo lêlê Emo  
Guharê guhê wê-mo lêlê Emo  
Xizêma pozê wê-mo lêlê Emo  
Kilçîvê çavê wê-mo lêlê Emo  
Kile çavê keçkê mo lêlê Emo.  
Heçî xwehkê wan pakin lêlê Emo  
Ez û wan destbirakin lêlê Emo  
Heçî xwehkê wan reşin lêlê Emo  
Ez û wan bi hev nexweşin lêlê Emo.

Kevoka xebxeb şînî lêlê Emo  
Xwel govendê dixînî lêlê Emo  
Mala kala xirab kir lêlê Emo  
Mala xorta dihedmînî lêlê Emo.

Piṣṭa dêrê bi ce ye lêlê Emo  
Binya dêrê bi ce ye lêlê Emo  
Tu kesik lê tune ye lêlê Emo  
Ji xeyrî keçka file ye lêlê Emo  
Dilê min di keçkê heye lêlê Emo  
Dilê wê di min tuneye lêlê Emo

Lê Emo lê Emûşê lêlê Emo  
Kevoka deṣta Mûşê lêlê Emo  
Keroska nav karûşê lêlê Emo  
Çar gamêşa didoşê lêlê Emo  
Dew tune rûn difroşê lêlê Emo.

Berçem, berçem dicûme lêlê Emo  
Benîştê xwe dicûme lêlê Emo  
Pêrgî gewra xwe dibûme lêlê Emo  
Gewr kenya ez şabûme lêlê Emo.

Di vir de , navê keçika fileh didî xuyakirin, lê,  
dîsa navê lawik, bav û gund û sal û demên wê neha-  
tine zanîn û nedane naskirin. Tenê deṣta Mûşê didî  
zanîn, ko ev keçika fileh ji deṣta Mûşê ye.

Herweha didî zanîn, ko gundi û cotkare, ko  
gamêş û çelekan didoşî û rûn difroşî û ji gamêşa tê

zanîn, ko mala bavê wê ne belengazin û hinek dewlemendin.

Lê reben didî xuyakirin, ko her tenê dilê wî ketîye keçika fileh û dilê keçikê neketîyê. Lê, jiber, ko keçik filehe, naxwazî dilê xwe bidî xortekî misilman. Çawa, ko didî zanîn, ko bavê wê serê xwe daniye û tenê diya wê heye û keçikên bi dê herdem xwe bi xeml û xêz dikin û li dor xwe digerin.

Lê reben, lawikê kurd ji xilxalê lingê wê pêketîye û heta kilçivê çavê wê û xwe di tevan re dibêni û dibêjî "Xilxal û kember û bazin û guhar û xizêm û kilçivê wê me", lê di awira kurdan de, ev gotin, pesindana nav dixwedane, di şeran de gelek caran wilo dibêjin. Gelek diriste, ko Seydayê Cizîri ji vir sitam dibi, ko gotiye:

Di pabosa Sîmînsayê,  
Me nêrî bejn û balayê,  
Le-elî eblexulesbabe-esbabesemawatî

Seyda jî dixwazî lingê yara xwe ramûsi, ko belki bighê jorê bejna we jî û bi qozîyen çavan li bejnê temaşa diki û ji xwedê hêvi diki, ko belki bighê jorê wê. Lê çiqas Seydayê mezin bi istûxwarî gotiye, hewqas (lawikê Kurd bênav) bi xurtî û bê fehet û eşkera gotiye û pir hindik mabû, ko bêjî: Ez malxwê mala wê me û ez xwediye male me.

Lê çawa xuya diki, xuyaye, ko Emoşa wî gelek ciwan û zîba û rinde. Ji ber wilo gotiye: "Heçi xwehkê wan basın yan pakin, ez û wan destbirakin" û bicarek pişta xwe daye esmer û reşan. Heval dilbijokên reş û esmeran jî hene, ma te nebihîstîye, ko pêşîyan gotiye: "Morîka bi qul, bi etaran re namenî." Lê destbirakiya xorten xweh ciwan, tiştekî hêja û mezine di qanûna dilgirtinê de. Dixwazî bibî destbirakê wê ko serbest karibî herî mala wan û gelek caran bi yara xwe re mijûl bibî û civana bidin hev û carnan herin riwê hev jî. Lê, reben birayê nezan nizanî, ko hevalê wî ne ji bo wî tê û diçî mala wan û dibi destbirakê wî.

Mala kala xerabkir û mala xorta dihedimêni, ev gelek di cihê xwe de hatîye. Ji ber, ko kalêñ reben

nikarin heta li bejn û bala wan jî temaşa bikin û xelk ji wan re kemasî dibêni. Lê, xort, li ser wan dişewitîn, nikarin heta qasekî li nav civatê jî rûnin û dixwazî malê xwe tev de di bejn û bala dosta xwe bidî û xanîkê xwe jîbihedimêni û ji gund jî barbikî.

Lê "kevoka xebxeb şîn"? Xebxeba Êmo bixwe ne şîne, lê kevoka xebxebşin, gelek ciwan û zîba û rinde. Ji lewra, lawik dosta xwe kirîye weke kevoka xebxebşin.

Herwekü dilgirtina xortê kurdê misilman çawa dilketîye keçika fileh û herdû ne ji olekê ne û di wê çaxê de bicarek ne dirist bû, ko fileh û misilman hevdî mar bikin. Lê didî zanîn, ko qanûna dilgirtinê de ol û êl nikarin devê riya mirovaniyê bigrin û mirovê ci fileh ci misilman û ci eziidî bin.

Lê bi rastî dilgirtin, ji alîkî ve gelek dijwar û bittîne, lê, dost û heval û mirovên nav gund bicarek jere dibejin; "madem dilê wê neketîye te û tu misilmani ew filehe, doza ci lê dikî? Ci jê dixwazî? Çima dile xwe têşenî?

Lê evîndarî, dilgirî tu sînor û çeper û diwaran li devê riya xwe nabêni, zindanan, kelahan, diwarên hasinî di cirêni û derbasdibî û di keleb û bircen asê ve derbas dibi. Lê, ko dilê dostê yarê di we tunebi gelek dijware û mirin jere xwestire û şev û ro di nav goman û sawiran de dijî û nikarî xwe bighêni peravê felatê û doz û daxwaz ji ber çavên wî weke rewrewkê winda dibi. Lê, reben xuyadikî, ko careke tenê pêre keniya ye û bi kenê wê pir dilxwes û sa bûye. Lê kenê dostê dara hêviyê avdidi. Kenê wê, kerş û qerêjê li ser dilê wî, ji ser gomanen wî dimali. Herwekü kenê dostê, nişana erêkirinê ye, peykê mizginê ye. Dema yara wî pêre dikenî, yanî, jere dibejî: Gulistanê bejn û bala min bêderge li ber te vekiri ye; dikarî serbest her tiştî jê biçinî û çend sala mirov didî pey yara xwe, ko carekê bikenî yan jî bi qoziyêن çavên mest û xwinrej, tişteki ji mirov re dibejî, yan kul û derdê evîndar paqij bikî. Ü bi yek awire yare, mirov dighêni delavê felatê û warê lihevhatinê-aştiyê û dilê mirov ji qerêjê paqij dikî.

\*\*\*

## EZ XELEFİM

Ez xelefim, xelefim  
Heware mîro heware,  
Ez xelefim, xelefim  
Ezdînşêr mîrê Botane  
Xwediye şûrê bi sedefim  
Heware mîro heware  
Xwedyê şûrê sedefim  
Ezdînşêr mîrê Botane  
Li nav eşîran bi gefim  
Heware mîro heware  
Li nav eşîran bi gefim  
Ezdînşêr mîrê Botane.

Ez xelefê kinikim  
Heware miro heware  
Ez xelefê kinikim  
Ezdînşêr mîrê Botane  
Xwedyê şûrê bi şirikim  
Heware mîro heware  
Xwedyê şûrê bi şirikim  
Ezdînşêr begê Botane  
Li nav eşîran bi rikim  
Heware mîro heware  
Li nav eşîran bi rikim  
Ezdînşêr mîrê Botane  
Ez xelefê şûvî me  
Heware mîro heware  
Ez xelefê şûvî me  
Ezdînşêr mîrê Botane  
Xwedyê şûrê Misri me  
Heware mîro heware  
Xwedyê şûrê Misri me  
Ezdînşêr mîrê Botane  
Li nav eşîran bengî me

Heware mîro heware  
Li nav eşiran bengî me  
Ezdînşer begê Botane

Di vir de, Xelef, navê xwe û şûrê xwe û mîrê xwe û hinek ji pesnê xwe dane xuyakirin. Çawa, ko navê eşîra xwe ji ji mere daye xuyakirin. Ji lewra, ev (Xelef) ji eşîra Şûva ye, ko di bin destê mîrê Botan de ye. Çawa, ko em zanîn, ko navê mîrê Botan ji, di wê çaxê de Ezdînşer bû yan ji Şerezdîn.

Herwekü didî zanîn, ko di wê çaxê de, kalanê şûrên xwe sedef dikirin û şûrên Misri, Kolmisri gihiştibûn Kurdistanê.

Ev dîlok di ber dîlanê re tê gotin û bi giranî go-vendê digerênin. Çawa, ko bi giranî vê dîloke dibêjin û davejin berhev û li hev vedigerênin û govend li milê rastê dici.

## BARANEK BARÎ

Baranek barî ji hewrêن biharê  
Baranê şilkir lê desmala yarê  
Geşt û seyrane lê li binya vê darê

Baranek barî lê ji hewrêن payîzê  
Baranê şilkir lê desmala qîzê  
Geşt û seyrane lê li binya vê guizê

Baranek barî lê ji hewrêن havînê  
Baranê şilkir lê desmala zînê  
Geşt û seyrane lê li binya Mêrdînê

Baranek barî lê ji hewrêن zivistanê  
Baranê şilkir lê şeml û kitanê  
Geşt û seyrane lê li binya Sînanê.

Di van çend rézikan de her beytek ducar tê gotin û li hev vedigerênin, herwekü dîrok sê gavan davejî:

Baranek barî lê ji hêwren bihare  
Baranek barî lê ji hewrên bihare...

Di vir de "E" bi "h" bi "e" tê guhertin, çawa  
"H" bi "h" tê guhertin, "geşt û seyran": Ger û  
temâşakirine.

Tıştekî pir giran di vir de nehatîye gotin. Tenê  
rewşa geşt û seyrana xwe baş daye, ko di nav  
baranê de cûne seyranê û çawa desmal û şar û kincê  
dosta wî, yan jî keçik û jinan şil bûne û dev jî geşt  
û seyrana xwe bernedane.

\*\*\*

## BEJNÊ

Bejn beyreqê lê van romîya  
Lê bejnê, bejnê lê bejn û bal  
Bejn beyreqê lê van romîya  
Lê devî qeleme, ez gorî

Sîng dikanê lê van morîya  
Lê bejnê, bejnê lê bejn û bal  
Sîng dikanê lê van morîya  
Lê devî qeleme mib-gorî

Bejn beyreqê lê van rimbaza  
Lê bejnê, bejnê lê bejn û bal  
Bejn beyreqê lê van rimbazan  
Lê devî qeleme mib-gorî

Sîng dikanê lê van Bezazan  
Lê bejnê, bejnê lê bejn û bal  
Sîng dikanê lê van Bezazan  
Lê devî qeleme mib-gorî

Di vir de dîtina bejna yarê weke beyreqen bi des-  
tê Romî û rimbaza tıştekî gelek ciwan hatîye; çawa,  
ko dîtina sîga wê weke dikanê morî û bezazan xweş  
hatîye. Lê tıştek heye, ko ew jî eve, ko ev dîrok di  
çaxekî de hatîye gotin, ko beyreqen Kurdistanê ji  
meydanê hatîbûn danalî û beyreqen Romîyan (Tîrkan)

hatine welatê me û di ser sera û bajarên Kurdistanê ve hatine bilindkirin û hejandin. Di wê demê de hattîye çekirin, ko miletê Kurd serê xwe ji dijminê xwe re xwar kiriye û bicarek xwe sipartîye dijmin.

Lê dilgir û evîndar bi carek guhén xwe nadin van tiştan; çawa, ko dengbêjên Kurd li ser Kemal Paşa helbesten mezin çekirine û guh nedane miletê xwe ka çiqas zor setem li wan dibî.

Kemal bavê me tê wer, wer Kemalo  
Şexê şerîetê wer, wer Kemalo  
Kemal bikêrî me tê wer, wer Kemalo..

Rimbaz, ew siwarê, ko bi rimê şer dikî, yan weke bazevêkî rimê dihejêni, pê dilizî. Lê bi rastî, dengbêj, yan istiranvan, di vê wekhevkirina bejn û bala yara xwe û sîngâ wê de di meydana torevanî de cihekî bilind sitandiye û ev nişana dewlemendîya zimanê Kurdiye. Herwekû min di zimanê Erebî de ev reng wekhevkirn nedîtine; çawa, ko gelek diriste ko di zimanê Turkî û Farisi de jî ne hatibi gotin.

\*\*\*

## TU LI VÊ TÊLÊ

Tu li vê têlê vê tenbûrê  
Delîlê dayê, dayê, dayê  
Tu li vê têlê, li vê tenbûrê  
Zeriyê ez mîvanê te me.  
Pêşya heciya çû Xêbûrê  
Delîlê dayê, dayê, dayê

Pêşya heciya çû Xêbûrê  
Zeryê ez mîvanê te me  
Ez radimîsim te gûlî hûrê  
Delîlê dayê, dayê, dayê  
Ez radimîsim te gûlî hûrê  
Zeryê ez mîvanê te me

Tu li vê têlê, têla biçük  
 Delîlê dayê, dayê, dayê  
 Tu li vê têlê, têla biçük  
 Zeryê ez mîvanê te me  
 Dest hine kir tevlî neynûk  
 Delîlê dayê, dayê, dayê  
 Dest hine kir tevlî neynûk  
 Zeryê ez mîvanê te me  
 Keç digirî ez nabim bûk  
 Delîlê dayê, dayê, dayê  
 Keç digirî min nakin bûk  
 Zeryê ez mîvanê te me  
  
 Tu li vê têlê, li têla mezin  
 Delîlê dayê, dayê, dayê  
 Tu li vê têlê, têla mezin  
 Zeryê ez mîvanê te me  
 Dest hine kir tevlî bazin  
 Delîlê dayê, dayê, dayê  
 Dest hine kir tevlî bazin  
 Zeryê ez mîvanê te me  
 Keç digirî min naxwazin  
 Delîlê dayê, dayê, dayê  
 Keç digirî min naxwazin  
 Zeryê ez mîvanê te me.

Di vir de, "delîlê dayê" û "zeryê ez mîvanê te me" ta dawî têne gotin û care yek ji van dikevî pişt beyta pêşî û tim li hev vedigerênin û ducar dikin û bi giranî govendê digerênin û eger em van herdû paşgiran ji koka beytê bidin jimartin, ev rist gelek direj dibî û ji ristên direj tê jimartin; çawa, ko sê gavan davêjin û di her gaveke de heşt (8) tevger hene.

Çawa, ko didî zanîn, ko keçik kirine bûk û destê wê ji hine kirine, lê naxwazî mîr bikî, ji ber, ko ne bi dilê wê dane mîr û lawik didî zanîn, ko ew ji di wê çaxê de li mala bûkê ye û ramûsana ji dosta xwe

distenî û gelek diriste, ko ew nahêlî keçik bi dest-girtiyê xwe dilxwes bibî û dixwazî bidin wî.

Lawik gelek bi xurtî pesnê yara xwe didî û gulî, bazin û guhar bi carek didî hinekirin. Lê nizanim, çawa di vê rewşê de di şeva bûkaniyê de gihaye dosta xwe û ramusan jê sitendine?

Xêbûr, nave cemekî ye, ko dikevî Cizîre û ji Kurdistanê tê. Çawa, ko ristekte min jî li ser Xêbûr hatiye çekirin.

"Xabûr, Xabûr..."

Wek daxwaza min pir direj û kûr."

Lê daxwaza min ji Xabûr jî kûrtir û direjtire. Lê em herdû di jînê de weke hev hatine û ji hevin, lê, ew bêhiş û bir, ez, di iro de bi bir û hisyarim, bi tevger û bawerim. Lê wê rojek bê, ko ez bixwe jî, bî-kevim warê bêhişî û bê tevgerî û bê bir û bawerî.

## TÊ JÎ MEZRÊ DE

Tê ji mezrê de, tê ji mezrê de  
Belê loy loy, belê loy loy  
Tê ji mezrê de, tê ji mezrê de  
Belê loy, loy lawiko qurban.

Şûr girêda mertal pêda  
Belê loy, loy belê loy, loy..  
Şûr girêda mertal pêda  
Belê loy, loy lawiko heyran.

Xwezka bi mala dostam têda  
Belê loy, loy belê loy, loy..  
Xwezka bi mala dostam têda  
Belê loy, loy lawiko qurban.

Tê ji mezrê de sist û pistî  
Belê loy, loy belê loy, loy..  
Tê ji mezrê de sist û pistî  
Belê loy loy, lawiko heyran.

Min bihîstî te yek xwestî  
Belê loy loy, belê loy loy  
Min bihîstî te yek xwestî  
Belê loy, loy lawiko qurban.

Tu bi zava û ez dergistî  
Belê loy, loy lawiko qurban  
Tu bi zava û ez dergistî  
Belê loy, loy lawiko qurban.

Herwekû di vir de tê xuyakirin, diyare, ko lawik hatiye wê bixwazî, bi şûr û mertal li gundê Mezrê ha-hatiye. Le "dergisti" yek ji çewtiyên zimanê kurdî ye, ko li şuna destgirtî hatiye gotin. Çima dibêjin destgirtî? Ji ber ko, gereke keç û xort destê hevdî bigrin û li cem du mirovan bêjin: Em hevdî bi jin û mérani dixwazin. Lê mela ji bo, ko ji xwe re çend kaxetan bistênin, nahêlin, ko herdû destên hev bigrin û gelek caran xwe ji ber zavê yan bûkê ve didin pêş û tiştekî jî dixwênenin, ko karibin çend kaxetên xwe ji wan bistênin.

\*\*\*

## TAQÎBELEKÊ

Taqîbelekê yeman,  
Taqîkê te beleke taqîbelekê yeman,  
Taqîkê te beleke taqîbelekê gewrê.  
Pişkojan sed û yeke taqîbelekê yeman  
Pişkojan sed û yeke taqîbelekê gewrê  
Ramûsim te bi heneke taqîbelekê yeman  
Ramûsim te bi heneke taqîbelekê gewrê.

Taqîkê te sipî ye taqîbelekê yeman  
Taqîkê te sipî ye taqîbelekê gewrê  
Pişkojan sed û sî ye taqîbelekê yeman  
Pişkojan sed û si ye taqîbelekê gewrê  
Ramûsim te bi dizî ye taqîbelekê yeman  
Ramûsim te bi dizî ye taqîbelekê gewrê

Taqîkê te pir sore taqîbelekê yeman  
Taqîkê te pir sore taqîbelekê gewrê  
Pişkojan hawîrdore taqîbelekê yeman  
Pişkojan hawîrdore taqîbelekê gewrê  
Ramûsim te bi zore taqîbelekê yeman  
Ramûsim te bi zore taqîbelekê gewrê.

"Taqî" bi şîwê Omerîyan, bi daxwaza Xeftan û Mîtanî hatiye. Herwekü Xeftano dîlokeke Omeriyaye, çawa, ko mér û jin herdû jî taqî li xwe dikan, ji ber, ko keçika Amûdî dibêjî:

Lolo emro, ji Amûdê heta bi duryanê  
Berfê dayê pêre têن çipkê baranê  
Neketime heyra vê berfê, vê baranê  
Neketime wê heyrê wê li taqîkê sipî  
Vedî sebxa vê qolanê..

Bi ser kirasên xwe de xort û keç yan jî mér û jin werdigrin û qolan û kemberan li bejna xwe bi ser de girêdidin yan jî didan. Lê mîtanî ji xeftan (taqî) kintir dihate çekirin û digiha bin çokê. Lê, min, mîtanî li jina neditî ye. Bermayê Mîtane, ko di iro de Metîna li şûna "Milan" mane. Milan, di navber herdû avan (Cizîrê) de dewleteke mezin lidarxistine û dawî bûne du perçe: Milan û Hewr û herdû jî windabûne.

Mîtan û Hor navê miletê Kurdin, ko di Cizîrê de berî tarixê bi çend hezar sal padîshahî û fermandarı kirine. Çawa ji tarixê té zanîn herdû jî yek miletin. Lê, li ser mezinahîyê bûne du perçe û dijminen wan Asûr û Hêtît, desten xwe xistine nav wan û Asûran alîkariya Hewr kirin û Hêtîtan jî alîkariya Mîtan kirin. Lê dawî herdû alî jî, ketin bin destê dijmin, ko ev di iro de jî heye.

Vê dewletê heta sînorê Misrê girtibû û heta rajorê Mûsil jî di bin destê wan de bû. Heta iro jî, bermayê vî miletî bi navê Metînan li rajorê Mûsil û rajorê Serekanîyê û Wêranşarê mane û li qiraxê Pingava Sipi Ogarit, şop û bermayen wan pir têne xuyakirin û ditin. Li tarixa min temaşa bikin! bi direjî hatiye nivîsandin û ev Mîtanî û Horanî ji kincen leşkeren wan

mane û xelkê Horan ji vî mileti ne. Horanî, fireh û  
mezine, ji çox çedikin û bi ser kincen xwe de li şuna  
Qaput li xwe dikin.

\*\*\*

## SULTANÊ

Sultanê dinya deme  
Lê, lê, lê, lê Sultanê  
Xilxalê lingê te me  
Cîrane, Sultanê..  
Bazinê zendê te me  
Gustila tilya te me  
Kembera li pişta te me  
Guharê guhê te me  
Xizêma pozê te me  
Kilçivê çavê te me  
Kuçikê mûrê te bimri  
Kiryarê bejna te me  
Sultanê, Sultanê..  
Lê, lê, lê, lê Sultanê  
Çav şinê çav şeytanê  
Biçükê mal cîranê  
Buye çaxê razanê  
Tu bide min ramûsanê  
Lê, lê, lê, lê Sultanê  
Lê, lê, lê, lê Sultanê..

Herwekû tê xuyakirin, diriste, ko Sultanê berê  
xwe ji lawik guherandîye û yekî dî ji xwe re dîtî ye.  
Ji lewra lawik dibêjî "Sultanê, dinya deme".

Xuyaye, berî hingî Sultanê li ber digeriya û wî  
poz pê ne dikir. Lê niha ew li ber Sultana xwe dige-  
ri, lê nema poz pê dikî û dest bi gazin û pesnê bejn  
û bala yara xwe dikî û dibêjî:"Kuçikê mûrê te bimri  
/ Kiryarê bejna te me..." Lê çima berî, ko mîrbikî te  
bejna wê ji xwe re nekirî, ez benî! Niha ketiye bin  
darê mîrekî dî û tu bela xwe jê venakî!

Herwekû ev pesn û gotinê, ko di vir de hatine gotinê, ko ji xilxalan û heta kilçivê çavê wê hatine dî risteke di de ji, wê bêñ "de wer lê lê" û disa lawik piştî mirina mêtê dosta xwe ya kevnare dibî kiryarê bejna wê. Lê, dostê Sultanê dixwazî, hê li mala mêt herî nav nivinê wê û dibêjî, "Bûye çaxa razanê" Sultanê! Here mala xwe razê ezenî! Yekî di heye, ko di ber sînga Sultanê de razî, te di havînî de dewê xwe winda kirye ezenî! Dûrî bexçê cameran here! Kurda ji kevnare de gotine: "Heçî nedî axçe, naçî nav baxçe."

Xuyaye, te nexwestiye "axçe" bidî û dixwazî herî nav baxçê xelkê. Ev ne karê dilgiraye, evîndar mal û can tevde di riya dosta xwe de davêjin, weke seydayê Cizîrî dibêjî:

"Dil û can jî li ser danîn,  
û zalim hêj dibêjît deyn"

"Ê gulperes bî can û dil didî", min go:"Kî didî can û dil bi gul?/ Go ev bazare, dil bi kul didî." Lê tu dixwazî bê, ko can û dil bidî, bikevî nav baxçê gulê Sultanê. Lê, ko xwedî bi te şiyar bû, tê ci ji xwe rebibêjî? Xortê tolaz û çikûs, ne ji kuştinê wêde tiştek bi destê te nakevî ezenî!

Çavê wê şîn bin yan reş bin, ci te jê tê? Bi xwendîyê xwe şerîn û xweşe, çima gazin û gili ji xwe na-kî?

Ev Sultanê, di ber govendê re tê gotin û sivik dibêjin û li ser hev tê gotin. "Sultanê dinya deme,/ Lê, lê, lê.....lê, lê, lê, lê....Sultanê" û bi hev re weke sunbilên, ko ba li wan bidî, govendê dihejênin.

\*\*\*

## SÊVÊ

Hey sêvê, sêvê, sêvê!  
Hey hawar, hawar sêvê!  
Hêy sêvê, sêvê, sêvê!  
Sed hawar, kes naxwe sêvê.

Min sêva xwe dî li ber sêvê,  
Hey hawar, hawar sêvê!  
Min sêva xwe dî li ber sêvê,  
Sed hawar, kes naxwe sêvê.

Çigare geşkir li ser lêvê,  
Hey hawar, hawar sêvê!  
Çigare geşkir li ser lêvê,  
Sed hawar, kes naxwe sêvê.

Sêv xeyidye mi naxêvê,  
Hey hawar, hawar sêvê!  
Sêv xeyidye mi naxêvê,  
Sed hawar, kes naxwe sêvê.

Di vir de, tenê Sêvê li ber sêvê gelek xweş hatiye, ko sêva pêşî dosta wî ye û sêva paşî dara sêvê ye. Xuyaye, ko Sêva wi li ber dara sêvê rawesta bû û çigare vedixwar û pêre yarı dikirin û remz û raz jere di nav xelekên dixana çigara xwe de dışandin û digot: Were sêvekê bixwe û ramusana ji sêvekê bide. Lê xuyaye, cî ne vala bû û lawik tenê zikê xwe digivâşt û dikire hawar. Lê, kî li hawar û gili û gazinên me rebena guhdarî diki xortê cizîri! Cizîri dibêjî: "Kes bi dada me nepisit, gileh û dadê çiket./ Tunebit daderesek, beyhûde firyadî çiket."

Raste, hawar û gili tişteki nakin. Çine ev gili û gazin? Divê bi gernasi û mérxasî mirov bighê daxwaza xwe. Gili û gazin çekê reben û bekêra ye ezbenî!

\*\*\*

## XANİKÊ TU XANÎ

Xanikê tu xanî, lê xanê  
Canikê tu canî, lê canê  
Te bi vî zimanî lê xanê  
Konê res danî lê canê.

Li gelîkî tengê lê xanê  
Paşa ji me dixwazî lê xanê

Hewrmêşê penge lê canê  
Bajari dûre lê xanê  
Wê li me derenge lê canê.

Xanikê tu xanî, lê xanê  
Canikê tu canî, lê canê  
Te bi vî zimanî lê xanê  
Konê res danî lê canê.  
Li gelikî kûre, lê xanê  
Ser sîngê xanê lê xanê  
Hewrmêşê hûre lê canê  
Rabe me birêke lê xanê  
Rêka me dûre lê canê.

Hin dibêjin: "Paşa ji me dixwazî hevirmêşê hûre, penge" û hin dibêjin: "Ser sîngê Xanê hevirmêşê hûre, penge." Ca kijan raste, nizanim. Tenê herdû ji, xweş hatine danîn. Lê di van ristan de çend tip gereke winda bibin, yan tevgera wan neyê xuyakirin, weke: Hevirmêş, divê tu hevrmêş bibeji. Di koka xwe de hevîrê mêsê ye. Çawa ko didî xuyakirin, ko ev rista ha di çaxê koçeriya miletê kurd de hatiye çekirin û Kurd yan koçer di çiya de bûn; ji ber, ko gelî li çola peyda nabin û hevirmêş di çaxê wan de gelek giranbiha bû û hevîrmeş Diyarbekir pir bi nav û deng bû; û didî zanîn, ko di guhaztina bûkê de, divabû tiştekî giranbiha bi diyarî bidin paşa, beg û axan. Heta beşa wan li ser jina yan jinguhezê ji hebû, yanî di çaxê koletiya miletê kurd de, ev hatiye çekirin.

Herwekü didî zanîn, ko ev bûk ji koçeran tê guhaztin û dûrketina ji bajaran iş û karê kurdên koçer bû. Çawa, ko geliyen teng bi me didin zanîn, ko Kurd herdem dixwestin dûri bajara herin û di cihen teng û ase de pez û sewalên xwe biçerênin û ev bû, ko Kurd li paş kerwanê pêşveçûn û bajarîtiyê hiştine û nexwestine gavêñ xwe ji ve qonaxê zû bavêjin û bikevin qonaxa bajartî.

Ev ji hin "eshab" hene, ko wilo Kurd li paş hiştine:  
1- Yek jê aborî ye, ko kurdan her tenê pez û se-

wal xwedi dikirin û naçare bi çol û çiya dûri bajaran diketin.

2- Zor û setema dijmin, ko li wan dihate kirin û naçare di cihêن bilind û asê de pez û sewal tenê xwedi dikirin û nêzîki avanî û bajaran nedibûn.

3- Kurd di vê rewşê de serbestî û gerdenazadiya xwe didit û xwe bi keleb û derbendêñ xwe payedar û serfiraz dikirin û li ber dijminen ji xwe zanatir û bîrewertir asê dibûn.

4- Ji ber, ko Fileh ji Kurdan re dixebeitîn û kirin û firotin mirek û paşan dabûn desten wan; tene Kurd weke leşkeren şervan li xwe dinêrin û çawa çavêñ xwe vekirin, ditin, ko pir paşde mane û li dawiya kerwanê pêşketinê mane.

Paşa, beg û axan ev karê hovîti, koçerî bi wan gelek xweş dikir û yekî ji wan newerabû kirin û firotinê bikî û ji xwe re kemasî didit. Ji ber, ko karê mileten bindest ji filehen wan re bûn û ji wan mileten bindesten xwe re digotin "tat" yanî cotkar û bindest. Lê, Fileh, ji wan bêtir bi pêşve çûn û hîni dezgeh, bazirganî û hinermendi bûn û berî me keç û kur dane xwendin û çawa serbest bûn, dane pêşîya me û em li paş xwe hiştin. Herwekû di serê pêşî de, ko Erebêñ misilman çawa ketin welaten rojhîlat û bi zor xistin bindesten xwe; mezinên wan nehiştin, ko ji leşkerî pêve tişteki dî hîn nebin û bi vi rengî li paş hiştin. Mezinên Kurdan jî, nedixwestin, ko Kurd ji şervanî û koçerî pêve tişteki dî hîn bibin û herdem di bin destê xwe de weke leşkerekî şervan digerandin û gelek caran bi wan karêñ giranbiha ji dijmine xwe re ji dikirin.

\*\*\*

## DE WER LÊLÊ

De wer lê lê, de wer lê lê  
Lê biçükê kofî kêlê  
Xwedê mîrê te nehêlê  
Wek qeraşê li ber sêlê

Bîstkê rûnim li tehêlê  
De wer lê lê, de wer lê lê.

De her deme, deme, deme  
Mala barkir çûn Eceme  
Ez xilxalê lingê te me  
Ez bazine destê te me  
Ez gustila tilya te me  
Ez kembera li pişta te me  
Ez guharê guhê te me  
Ez xizêma pozê te me  
Ez kilçivê çavê te me  
Kuçikê mérê te jî bimrî  
Ez kiryarê bejna te me  
De wer lê lê, de wer lê lê.

Ez geleki ji vê kêşan û dîloke hez dikim û gelek caran dibêjim. Risteke pir sivik û bê ko mirov xwe bêşenî govend û dîlan li ber dibi, nerm û sivik hatiye.

Kofî kumekî hişke, ko di jorê wî de textekî yan darekî du perçe biheve datênin û qumaşekî rengin dikişenên ser û ji paşve bilind û di binya wî re geliyekî ne pir kûr, tê xuyakirin. Ev tev didî zanîn, ko Kurd ji kevnare de ji ciya û gelîya bêtir hez di-kin, heta, ko kofîyên jinên xwe di rengê çiyakî bilind de, ko di jêrê wî de gelîkî kûr tê xuyakirin, çedikin. Jin bi vê kofîyê xwe payedar û serbilind dibenin û di istiranen kurdi de "kofî" gelek caran hatiye xuyakirin.

Lê çiqas ji mérê wê ne xweşe, ko wî weke qeraşê ber sélé nişanî xelkê didî û dibêjî: "Xwedê mérê te nehêlê/ Wek qeraşê li ber sélé..." Xuyaye, ko qeraşê ber sélé çiqasî ne xweşik û bi tenî û gemare, bi pîs û tenî ye..

Herwekü "ezxilxalê lingê te me", di çend dîlokan de hatiye. Ji ber ko gelek xweş û giranbihaye.

\*\*\*

## DE BERDE

De berde hay de berde  
Havîne bi kul û derde  
Hay de berde hay de berde..

Lo lawo destê min berde  
Wexte mérêm bê ji der de  
Lo lawoo, destê min berde  
Mib kujî te bi serde  
Serxweşo destê min berde  
Hay de berde hay de berde..

Min û axurê gamêsa  
Lo lawoo, destê min berde  
Destê min girt û kësa  
Serxweşo destê min berde  
Xwedê heqîya min bêni  
Lo lawo destê min berde  
Di nav van bisk û bêsa  
Serxweşo destê min berde  
Hay de berde hay de berde..

Min û axurê van miya  
Lo lawo destê min berde  
Destê min girt û kenîya  
Serxweşo destê min berde  
Xwedê heqîya min bêni  
Lo lawo destê min berde  
Di nav hel û morîya  
Serxweşo destê min berde  
Hay de berde hay de berde..

Min axurê berana  
Lo lawo destê min berde  
Memik weke fincana  
Serxweşo destê min berde  
Xwedê heqîya min bêni  
Serxweşo destê min berde

Di nav hel û mircana  
Serxweşo destê min berde  
Hay de berde hay de berde..

Di kêşan û müsiqa xwe de vê dîlokê deng daye. Herwekû bi şîweyê sorî, rengekî dî, pir xweş û şêrîn dane vê dîlokê. Çawa, ko bi zimanê Erebî jî, ev dîlok bi kêşan û müsiqa xwe ve hatiye guhaztin û sitandin. Lê bi rastî, bi soranî gelek xweş hatiye gotin, lê ji zarê kurmancî hatiye guhaztin û berî pêncî salî bi kurmancî, di qawana de hatiye girtin û paşê Ermena bi kurmancî bi serve zêde kirîye û müsiqa jêrê danîne. Lê niha Sora û Ereba guhaztine.

Lê heta heta iro jî, dijminen Kurd, nahêlin, ko kurmanc bi zarê xwe bixwênin û binivîsin. Herwekû heta iro jî, hêj müsiqarêñ kurmanc xwendewar rane-bûne û müsiqa kevnare hêj di pêş de ye.

Çawa, ko dewlemendêñ kurmanc gelek paşdemayı, kevneperest û malgenî û çikûsin; nikarin yan naxwazin tişteki di vê meydanê de ji miletê xwe re bikin.

Çawa, ko xortêñ xwendewarêñ kurmanc gelek nêzîki meydana müsiqa nabin û jê direvin, bê rûmet û qîmet dibênin!

Ji lewra, dengbêjêñ kurmancî jî, heta niha hêj di qalikê xwe yê kevnare de mane û nikarin gavekê bi pêş de bavêjin.

\*\*\*

## DE KİNA MİN, KİNA MİN LÊ

Hezro ye, Hezro ye lê  
De kina min, kina min lê  
Bişewitî berbiro ye lê  
Zerya zer mala minê

Kina min gezo ye lê  
De kina min kina min lê  
Kinika mi gezo ye lê  
Zerya zer mala minê.

Mardîne, Mardîne lê  
De kina min kina min lê  
Mardîne, Mardîne lê  
Zerya zer mala minê.

Kinika min şerîne lê  
De kina min, kina min lê  
Kinika min şerîne lê  
Zerya zer mala minê.

Bişewitî tim havîne lê  
De kina min, kina min lê  
Bışewitî tim havîne lê  
Zerya zer mala minê.

Alqûşe, Alqûşe lê  
De kina min, kina min lê  
Bışewitî bi pûş û müse lê  
Zerya zer mala minê.

Kinika min dergûşe lê  
De kina min, kina min lê  
Kinika min dergûşe lê  
Zerya zer mala minê.

Cezîre, Cezîre lê  
De kina min, kina min lê  
Bışewitî cihê mîre lê  
De kina min, kina min lê.

Kinika min wezîre lê  
De kina min, kina min lê  
Kinika min wezîre lê  
Zerya zer mala minê.

Gelek diriste, ko kina wî ji nav Silîva bî, lê nave Mardin, Alqûş û Cezîr ji bo ristê anîne. Ji ber, ko nabi kinika wî ji van bajaran tevan bî û her tenê di-xwazî pesnê kina xwe bidî û tiştê, ko ji me re daye zanîn, tenê kina wiye, ko xuyadikî dosta wî kine. Lê gelek gotinêن, ko dûrî daxwazê ne di nav rista xwe de anîne. Tenê ji bo, ko kêtûş û dawî weke hev bêن "kinika min gezo ye"/ "kinika min şerîne"/ "kinika min dergûşê"/ "kinika min wezîre"..., ji bo dawî û kêtûş hatîne.

\*\*\*

## ZÊRZEYNEBÊ

Zêrseynebê, Zeynebê  
Kûz li milan cêr li destan  
Şandime sûka Helebê.

Zêrseyneba Hesenî  
Zêrseynebê, Zeyenebê  
Kûz li milan cêr li destan  
Şandime sûka Helebê.

Tub qolan û bazinî  
Zêrseynebê, Zeynebê  
Kûz li milan cêr li destan  
Şandime sûka Helebê.

Ji bextê min re dipesinî  
Zêrseynebê, Zeynebê  
Kûz li milan cêr li destan  
Şandime sûka Helebê.

Zêrseyneba Ertoşî  
Zêrseynebê, Zeynebê  
Kûz li milan cêr li destan  
Şandime sûka Helebê.

Te li serî qereboşî  
Zêrseynebê, Zeynebê

Kûz li milan cêr li destan  
Şandime sûka Helebê.

Payê ji min re difroşî  
Zêrzeynebê, Zeynebê  
Kûz li milan cêr li destan  
Şandime sûka Helebê.

Zêrzeyneba Şikakî  
Zêrzeynebê, Zeynebê  
Kûz li milan cêr li destan  
Şandime sûka Helebê.

Te kofî ji barê gakî  
Zêrzeynebê, Zeynebê  
Kûz li milan cêr li destan  
Şandime sûka Helebê.

Hero, hero li awakî  
Zêrzeynebê, Zeynebê  
Kûz li milan cêr li destan  
Şandime sûka Helebê.

Hero li cem axakî  
Zêrzeynebê, Zeynebê  
Kûz li milan cêr li destan  
Şandime sûka Helebê.

Koka dîlokê bi vî awayê jêrî tê gotin û hatiye da-nîn:

Zêrzeynebê, Zeynebê  
Zêrzeyneba Hesenî  
Tu bi qolan û bazinî  
Ji bextê min re dipesinî.

Zêrzeyneba Ertosî  
Tel serî qerebosî  
Payê li min difroşî.

Zêrzeyneba Şikakî  
Te kofî ji barê gakî

Hero, hero li awakî.

Le evêñ dî hemî zêde ne. Tenê Dîlok pê xweş dibî  
û govend pê tê gerandin.

Lê xuyaye, ko keçik ji avê tê û li rê ji lêwik re  
gotiye: "Dixwazim xemî û xêza min ji Helebê bikirî!"  
Reben naçare çuye Helebe u xwe jere pesinandiye u  
paye kiriye, gelek caran gotina xwe guherandiye.

\*\*\*

## ZÊRBERBENÎ

Zêrberbenî, berbenî  
Xala li gerdenê, li gerdenê  
Zêrberbenî, berbenî  
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Wêl nav bexçê gul çinî  
Xala li gerdenê, li gerdenê  
Wêl nav bexçê gul çinî  
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Mel hev nerî keç kenî  
Xala li gerdenê, li gerdenê  
Mel hev nerî keç kenî  
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Zêrberbenî, em yekin  
Xala li gerdenê, li gerdenê  
Zêrberbenî, em yekin  
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Hafê reza bi helekin  
Xala li gerdenê, li gerdenê  
Hafê reza bi helekin  
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Lawno qîzik henekin  
Xala li gerdenê, li gerdenê  
Lawno qîzik henekin  
Zêrê li ber çenê, ez benî.

Zérberbenî em done  
Xala li gerdenê, li gerdenê  
Zérberbenî em done  
Zérê li ber çenê, ez benî.

Hafê reza bi hirmone  
Xala li gerdenê, li gerdenê  
Hafê reza bi hirmone  
Zérê li ber çenê, ez benî.

Lawno qızık gezone  
Xala li gerdenê, li gerdenê  
Lawno qızık gezone  
Zérê li ber çenê, ez benî.

Zérberbenî em çarin  
Xala li gerdenê, li gerdenê  
Zérberbenî em çarin  
Zérê li ber çenê, ez benî.

Hafê reza bi hinarin  
Xala li gerdenê, li gerdenê  
Hafê reza bi hinarin  
Zérê li ber çenê, ez benî

Lawno qızık gulnarin  
Xala li gerdenê, li gerdenê  
Lawno qızık gulnarin  
Zérê li ber çenê, ez benî.

Zérberbenî em şeşin  
Xala li gerdenê, li gerdenê  
Zérberbenî em şeşin  
Zérê li ber çenê, ez benî.

Hafê reza bi şebeşin  
Xala li gerdenê, li gerdenê  
Hafê reza bi şebeşin  
Zérê li ber çenê, ez benî.

Lawno qızık keleşin  
 Xala li gerdenê, li gerdenê  
 Lawno qızık keleşin  
 Zêrê li ber çenê, ez benî.

Ev rista han li ser awayê Ewrûpî tê gotin û gelek  
 bi tore hatiye danîn. Weke: "Zérberbenî", "Xala li  
 gerdenê", "ez benî" gelek bi tore hatine bidarveki-  
 rin. Meger çenda li pey hev çend car hatine jî, lê  
 gelek xweş hatine danîn.

Lê tene "Wê li nav bexçe gul çinî", "Me li hev  
 nêrî keç keni" min zêde kirine. Ji ber, ko beyta pêsi  
 kurt û bê heval bû. Lê bawerim, pir xweş hatiye  
 gotin. "Gulnar": Gula hinarêye; "Keleş": Rêgir û ta-  
 lankerin. Lê em yekin, em done, em sêne, çarin-  
 pênc negotiye. Ji ber, ko dîlokvan nikaribû li wê  
 gorê pesnê keçikan bibejî û ez divêm ji cem xwe bi  
 serve zêde bikim, ko gazina jê nekin.

\*\*\*

## Zeko, Zekiya

Zeko, Zeko, Zekiya  
 Zeko dî li ser xaniya  
 Tena-tena dimeşîya  
 Berfa bişev bariya  
 Li ser zimana helîya  
 Kevanê libûdçîya  
 Bi ser mi de teviya  
 Mi dest avêt guliya  
 Hel û morî qetiya  
 Bîna misk û mawerê  
 Bi ser mi de fûriya  
 Ketim dilêm eşîya.

Zeko, Zeko, Zeynebê  
 Hat kerwanê Helebê  
 Danî li devê neqebê  
 Temêniya mil tebê

Tul nerînê miqatebê  
Mi devê xwe kir xebxebê  
Tez kustum, tez helandîm  
Kirim darê lewlebê  
Xwedyâ şara qesebê  
Lê Zeko, Lê Zeko..

Mi Zeko dî li ber dîwêro  
Bisk berdane ji hawêro  
Ramûsankê bide min  
Ji qirikê berjêro  
Ji binya qulpa guhêro  
Ji kê tîrî ji kê newêro  
Tirsa te kûçikê mero  
Teres çûye bajêro  
Kengî wê bê ne bixêro  
Lê Zeko, le Zeko..

Lê, lê lêlê lê Zeko  
Tu bi qedrê bavê xwe ko  
Tê derî li min veko  
Tê xeta sor simbêla  
Di boxaza qirka xwe ko  
Bere mîrê te bimrî  
Xwedê te bi rizqê meko  
Lê Zeko, lê Zeko..

"Libûdçî", gotineke ji Erebi û Turkî gihaye hev û ketiye nav zimanê kurdi; "Mawer", ma u werd e, ji du gotinêni Erebi hatine nav zimanê me. Bi daxwaza "gulav"e, "xebxeb"e hindama têrgoste, ko dikevi binya gerdenê (di bin cenê re ye). "Gerden" qirike û "gerdenî" ew toqê zérîni yan jî zîvîni, ko dixin gerdena qizik û jinan. Lîwleb , ko di dolabê de sivik digeri, herwekû "boxaz": tengasiya qirikê ye; dengbêj, gerden keçikê weke Boxaza İstanbul dibenîn û jere dibejin: Boxaza qirikê.

Rist nerm hatiye u govendê li ber wê bi nermî dîkin. Lê gotinêni wê ne sade kurmanciya gewrin û

herkes nas diki. Lê bi rasti, "berfa bişev bariya", "kevanê libûdçîya" gelek xweş û bi tore hatine."Berfa bişev bariya", gelek sipî û paqije; dilgir riwê yara xwe di bin perda weke şeve de gewr û sipî dîtiye, ko weke berfa bişev hatiye û li ser zimanê mirov diheli.

Lê "kevanê libûdçîya" didî zanîn, ko yara wî gelek bejin bilinde, ko çawa destê xwe tavejî guliyen wê, weke kevanê libûdçîya bi ser bejna wî de xwar dibî yan jî, belkî reben bixwe kinik bî, ko hemberî dêmê guli nabî û naçare destê xwe tavejî guliyen wê û bi ser xwe de xwar diki.

Çawa ko tê zanîn, ko wê çaxê keçikên kurdan misk û mawer bixwe dadikirin, ko bîna wan bi xortan xweş bibî. Çawa tê zanîn, ko sinbelê lêwik sor û ziravin.

\*\*\*

## ZEYNO, ZEYNEBA MİN

Kirasê Zeyneb melese, Zeyneba min  
Min dabû ber meqese, Zeyneba min  
Herçi dosta wî tune, Zeyneba min  
Li herdû dinya bêkese, Zeyneba min.

Kirasê Zeyneb mebrûme, Zeyneba min  
Hûrik-hûrik didrûme, Zeyneba min  
Herçi dosta wî tune, Zeyneba min  
Li herdû dinya mehrûme, Zeyneba min

Kirasê Zeyneb tırgale, Zeyneba min  
Min daye ber pergale, Zeyneba min  
Herçi dosta wî tune, Zeyneba min  
Li herdû dinya bêmale, Zeyneba min.

Kirasê dostê ci dibî bere bibî, lê bi rasti, herçi dosta wî nîne li herdû dinya (eger dinyake dî hebî?) bêkese, mehrûme û bêmal û mirove, heta jîna wî jî, békér û nehêjaye.

Lê "tırgal", min ji cem xwe daniye; ji ber, ko "tırgal" di wê çaxê de nebû û "pergal", rastika terzi û feleknasa ye, pê xêzikan çedikin.

\*\*\*

## ZEYNO

Hey lêlê, lêlê lê lêlê Zeyno  
Evare cîka deyno lêlê Zeyno  
Sibhê cîka hilmeno lêlê Zeyno  
Ramûsankê bide min lêlê Zeyno  
Heta salek dî bideyno lêlê Zeyno  
Navê keçkê nizanim lêlê Zeyno  
Navê lêwik Hiseyno lêlê Zeyno

\*\*\*

## ZİRAV, ZİRAV

Zirav, zirav, zirav, zirav  
Lê keçko ziravê  
Gewrê bozê, li mala bavê  
Lê keçko ziravê  
Mij te pêve kesek navê  
Lê leylo ziravê  
Lê mij te pêve kesek navê  
Lê Leylo ziravê.

Ew zirave weke müye  
Lê Leylo ziravê  
Devê deryê me re çûye  
Lê keçko ziravê  
Mid go ax û ted go ûye  
Lê Leylo ziravê  
Lê mid go ax û ted go ûye  
Lê keçko ziravê.

Ew zirave weke teşî  
Lê keçko ziravê  
Devê deryê mere meşî  
Lê Leylo ziravê  
Misk û mawer jê diweşî  
Lê keçko ziravê

Lê misk û mawer jê diweşî  
Lê keçko ziravê.

Ew zirave weke dezî  
Lê Leylo ziravê  
Devê deryê mere bezî  
Lê keçko ziravê  
Mid go ax û ted go xwezî  
Lê Leylo ziravê  
Lê mid go ax û ted go xwezî  
Lê keçko ziravê.

Ew zirave weke taye  
Lê Leylo ziravê  
Devê deryê mer bazdaye  
Lê keçko ziravê  
Mid go ax û ted go aye  
Lê Leylo ziravê  
Lê mid go ax û ted go aye  
Lê keçko ziravê.

Bi rastî di vir de, ristevanê me ne pêzanekî mezin bû, ko bejna dosta xwe kiriye weke "teşî", "mû", "dezî". Belkî tenê ji bo kêşan û lihevhâtina ristê ani bin. Lê ji ber, ko "teşî", "mû", "dezî" li cem Kurdan berûmet û nehêjane tiştekî; gereke nexista nav rista xwe. Tenê, reben gelek axîn û xwezî xistine nav rista xwe; herwekû ne bihîstiye, ko kurmanca gotiye: "Kes bi xweziya nagri baqê keziya"; herwekû ax, oy, ay tev alavên eşe ne, alaven keser û nexweşîye ne. Xortê Kurd tenê ji me re didî zanîn, ko Leyloka wî bejin zirav û rista xwe bi veger anîye û veger di ristê de ne gelek ciwane.

Çaxa ez li Bexdayê seydayê perchê Kurdi bûm, min ji xwendevanên xwe xwest, ko her yek ji wan ji min re di pesnê keçekê yan tiştekî de nivîsarekê binivîsî û tevan her yek tiştek nivîsin. Lê yekî ji wan xalê ýara xwe weke getranê reş nişan dabûn û çawa min jê pirsi: "Eger dosta te qetranê di riwê xwe bidi gelek ciwan dibî?" Lê wê çaxê mîrik naskir, ko ez ci

dibêjim. Ji lewra got: "Belê mamosta, min şası kiriye, gereke min wilo negota." Meger, çendan daxwaza wî her tenê reşayî bû ji, lê kes xal û xet û nişanên yara xwe naki weke qetranê.

Ca ristevanê me ji, bejna yara xwe kiriye weke teşî, mû, dezî. Lê ci xweşikayıya wan heye? Heta, ko bejna Leyloka xwe weke wan bikû! Tenê di kêşan û dawî de pir xweş anîne.

\*\*\*

### Jİ PELÊ DARÊ

Ji pelê darê, lê ji pelê darê  
Kirasê Meymo, lê ji pelê darê  
Min dirûti lê par biharê  
Kirasê Meymo, lê ji pelê darê  
Sed pîroz bî lê li bejna yare  
Kirasê Meymo, lê ji pelê darê.

Ji pelê gwîzê, lê ji pelê gwîzê  
Kirasê Meymo, lê ji pelê gwîzê  
Min dirûti lê par payîzê  
Kirasê Meymo, lê ji pelê gwîzê  
Sed pîroz bî lê li bejna qîzê  
Kirasê Meymo, lê ji pelê gwîzê.

Ji pelê ketê, lê ji pelê ketê  
Kirasê Meymo, lê ji pelê ketê  
Min dirûti lê ji bo dawetê  
Kirasê Meymo, lê ji pelê ketê  
Sed pîroz bî lê li bejna te tê  
Kirasê Meymo, lê ji pelê ketê.

Ji pelê bîyê, lê ji pelê bîyê  
Kirasê Meymo, lê ji pelê bîyê  
Min dirûti lê bi derziyê  
Lê kirasê Meymo, lê ji pelê bîyê  
Sed pîroz bî lê li te zerîyê  
Lê kirasê Meymo, lê ji pelê bîyê.

Di vir de, cara pêşîne, ko mirovek kirasē yara  
xwe ji pelê dara çedikî, bi derzî bidrû û pêşkêşî  
dosta xwe bikî. Herwekü tê xuyakirin, lawik terzî ye  
û her kes ji karē xwe mijûl dibî. Lê wekî dî, tiştekî  
hêja têde nîne, ko em bidin xuyakirin. Tenê nave  
dosta xwe daye zanîn, ko Meymo ye û kirasē wê di-  
dirûyī û geleka li ser kirasē yara xwe gotine.

\*\*\*

## ŞEMLÊ, ŞEMLANÊ

Şemlê, şemlê, şemlê, şemlê  
Li mala bavê Şemlanê

Ew hêlinê qaz û maza  
Li mala bavê Şemlanê  
Hêlin çekir li serê gaza  
Li mala bavê Şemlanê  
Ez ramîsim gerdengaza  
Li mala bavê Şemlanê.

Ew hêlinê qaz û çûka  
Şemlê, şemlê, şemlanê  
Hêlin çekir li ser sûka  
Li mala bavê Şemlanê  
Ez ramîsim qız û bûka  
Li mala bavê Şemlanê.

Ew hêlinen qaz û beta  
Li mala bavê Şemlanê  
Hêlin çekir li serê xeta  
Li mala bavê Şemlanê  
Ez ramîsim van hirmeta  
Li mala bavê Şemlanê.

Ew hêlinê çûk û zîza  
Li mala bavê Şemlanê  
Hêlin çekir li serê gwîza  
Li mala bavê Şemlanê  
Ez ramîsim bûk û qîza  
Li mala bavê Şemlanê.

Navê dosta xwe daye zanîn, ko Şemlê yan Şemlanê ye. Çawa, ko didî zanîn, ko herdû çûne li hêlinâ digerin, lê qaz, çûk, bet û zîz ji bo ristê anîne. Te-nê "gaz û maza", "gerdengaza" ne bi daxwazekê ne: Gaza pêsi çiya ye û gaza paşî ew hasine, ko cil û caw pê dipivin. Lê daxwaza dengbêj, ne dilgirtine, belki tenê ramisan û tolazî ye; tenê gelek ji Şemlanê hezdikî.

\*\*\*

### ŞÊRÎNÊ TEVDE GUL

Ez ji gula gule zerim  
Şêrînê tevde gul  
Devê deryê wer diherim  
Şêrînê tevde gul  
Dosta lawkê xwey esmerim  
Lê şêrînê tevde gul.

Ez ji gula gule sorim  
Lê şêrînê tevde gul  
Devê deryê wer diborim  
Lê delalê tevde gul  
Devê deryê wer diborim  
Lê şêrînê tevde gul.

Ez ji gula gule sipî me  
Lê şêrînê tevde gul  
Devê deryê wer borî me  
Lê şêrînê tevde gul  
Dosta lawkê xwey gundi me  
Lê delalê tevde gul  
Dosta lawkê xwey gundi me  
Lê delalê tevde gul.

Di vir de navê keçikê Gulê ye û lawik dibêjî: "Şêrînê tevde gul/ lêlê gulê tevde gul..." Carna Gula wî sor û sipî û zere û Gula wî ser û pa weke guleke ges li ber çavê wî tê xuyakirin. Lê bi rastî "şêrînê tevde gul" gelek xweş hatiye. Çawa, ko

keçik ji didî xuyakirin, ko lawikê wê gundiye û esmerek û gundi ji xwe hemî esmerin. Ji ber, ko kar dîkin û li ber tava havînê dixebeitin.

Herwekû keçik ne belaş di devê deryê mala bavê lêwik re diçî û tê. Dilê malwêran, mirov naçare bişer mala bavê dostê de dibî û mirov bi kude diçî di devê deriyê mala bavê dostê re derdikevî, weke kehreba evîn mirov bi ser mala bavê yarê de dikşenî.

Helbeste gelek xweş hatiye danîn û këşan û dawî ji pir xweş hatine.

\*\*\*

## LÊ MEYRO, MEYREMÊ

Erdik bi dare lê Meyro, Meyremê  
Erdik bi dare, li erdiķê rûmenê.

Gur tê bixare, lê Meyro, Meyremê  
Gur tê bixare, li erdiķê rûmenê  
Çavê wî l'kare, lê Meyro, Meyremê  
Çavê wî l'kare, li erdiķê rûmenê

Erdik bi erxe lê Meyro, Meyremê  
Erdik bi erxe, li erdiķê rûmenê  
Gur tê bi çerxe lê Meyro, Meyremê  
Gur tê biçerxe, li erdiķê rûmenê  
Çavê wî l'berxe lê Meyro, Meyremê  
Çavê wî l'berxe, li erdiķê rûmenê.

Erdik bi nîske lê Meyro, Meyremê  
Erdik bi nîske, li erdiķê rûmenê  
Gur tê bi tîske lê Meyro, Meyremê  
Gur tê bi tîske, li erdiķê rûmenê  
Çavê wî l'gîske lê Meyro, Meyremê  
Çavê wî l'gîske, li erdiķê rûmenê.

Erdik bi geze lê Meyro, Meyremê  
Erdik bi geze, li erdiķê rûmenê  
Gur tê bi leze lê Meyro, Meyremê

Gur tê bi leze, li erdikê rûmenê  
Çavê wî l'peze lê Meyro, Meyremê  
Çavê wî l'peze, li erdikê rûmenê.

Didî xuyakirin, ko Meyro hêj zaroke û li ber berx  
û kar û peze û bi hevalên xwe re rûniştiye û destûra  
gur li berx û pez daye. Lê eger li erdê rûmêne  
wê li ku rûnê? Vaya dixwazî, ko li ser çoka wî rûnî  
yan tim ji piya bî û pêre bigerî.

Dawî û kêşan gelek xweş hatine û dîlan sivik li  
ber dibî û carna jî bi lotik xwe tavêjin.

## XEYDA

Xeyda, xeyda  
Lê, lê Xeyda  
Xulama keçka seyda  
Lê, lê Xeyda  
Ezê bêjim me xeda  
Lê, lê Xeyda  
Ramîsankê bide min  
Lê, lê Xeyda  
Siba vî çaxî eyda  
Lê, lê Xeyda.

Mala Xeyda li derê çeme  
Lê, lê Xeyda  
Ez mîvanê Xeyda xwe me  
Lê, lê Xeyda  
Îsev ez mîvanê te me  
Lê, lê Xeyda  
Kûçkê mîrê Xeyda bimrî  
Lê, lê Xeyda  
Ez kiryarê bejna te me  
Lê, lê Xeyda.

Lêlê Xeyda, xeydokê  
Lê, lê Xeyda

Biçûkê şemamokê  
 Lê, lê Xeyda  
 Şerînê xweş bihokê  
 Lê, lê Xeyda  
 Ramîsim te zarokê  
 Lelê Xeyda.., lêlê Xeyda..

Di vir de, Xeyda, navê keçikê ye. Çawa, ko Xeyda ji mala mîrê xwe jî xeyidye û hatiye mala bavê xwe, ko seydayê gunde. Lawik pir xweş gotiye, ko "iro ramisanek bide min, lê sibê vî çaxî eyde û dizanî, ko roja eydê mala seyda vala namenî, ko karîbi ramisanekê ji Xeyda xwe bistêni.

Govend sivik digerî û xwe pêre dihejênin. Kêsa sivike û dawî gelek xweş hatiye, ko him navê dosta wî ye û him gotin û peyvên bilind û xweş anîne  
Wek: Ezê bêjim mexeyde, ez kiryarê bejna te me.

Ev ji rêza ristêx xweş û baş tê jimartin. Lê çîma gotiye: "Ez mîvanê Xeyda xwe me / İşev ez mîvanê te me", wilo gotiye, ko baş deng herî Xeyda û dile wê gelek xweş bibî. Çawa, ko Ebûnewas gotiye: "Xemrê bide min û bêje ev xemre! da wekû guhê wî ji xweş bibî. Ji ber, ko her pênc alavêñ hişyari çev, guh, tam, bin, destdan pê xweş bibin tiştekî zede ye.

Lê çîma dibêjî: "Küçikê mîrê Xeyda bimrî, ez kiryarê bejna te me, lê lê Xeyda". Ji ber, ko jîna bêdilî wan didin mîr û difroşin, nadîn xor текî, ko dilê wê giirtiye û pirê caran mirovên gemar û çepel bi perên pir, jînen ciwan û xweşik dikirin û naçare jîn çavê xwe li dostê xweye berê yan jî, xor текî ji mîrê xwe çêtir û ciwantir digerêni; û mîrik dixwazî zû mîrê wê bimrî, ko karîbi bi jinebitî ji xwe re bêni.

Serpêhatiyêñ Kurdistanê, pirê wan li ser jînen bi mîr hatine. Ji ber, ko bi zor yan bi pera keçen xwe difiroşin û didin mirovên çepel, ko keçik naxwazî riwê wî bibêni. Naçare, jînen kurd çavê xwe berdidin tolazî û gazina ji mala bavê xwe dikin, ko çawa nedane yekî, ko bixwe ji xwe re dîbû û dane vî gende-lê mîra û gelek caran jîn û yarê wê têne kuştin û

carna jî hevdî direvînin û bi çolan dikevin. Çawa, ko pirê caran hevdî berdidin û jinik yekî dî dikî, lê ca-reke dî ne bi dilê wê ye. Ev hemî jî, ji ber ko qelen gelek distenin û jina, ko qelenê we pir bî, sere xwe bilnd dikî û xwe payedar dibêni.

Lê bi rastî, gereke ev qelen ji nav kurdan bê rakin û jin bi dilê xwe ji xwe re xortekî bistêni. Ji ber, ko jin jî weke mér serbest û gerdenazade û ne kole ye. Çawa, ko dibêjin: "Bere dilî bi dil bî,/balîfa bin serê me kevir bî,/ tûrê parsê li mil bî,/ xwarina me gilgil bî.."

Ciqas mér dewlemed û xwedî gund bî, lê jin jê hez naki, ko ne bi dilê wê bî! Wê her û her çavên xwe berdi derive û gili û gazinan ji mala bavê xwe biki û belki carnan jî, nifira li wan biki. Tenê ji ber, ko bê dilî wê dane mérique, ko jê hez naki.

Tenê dermanê vê nexwesiyyê, xwendin û pêşveçûna miletê Kurde. Paştamayîna miletê me, ev reng-çewti afirandine.

\*\*\*

## XEZALA MİN

Xezala min, delala min  
Hey hêri, hêri, hêri  
Xezala min, delala min  
Xezala li berya jêri  
Xezala min, delala min  
Koçera ser bixêli  
Xezala min, delala min  
Koçeran pez da bêri.

Xezala min, delala min  
Xezalel beryê çarin  
Xezala min, delala min  
Her çar jî, bi kum û şarin  
Xezala min, delala min  
Her çar jî, bi dost û yarin.

Xezala min, delala min  
 Xezalêl beryê şesin  
 Xezala min, delala min  
 Xezalêl beryê şesin  
 Xezala min, delala min  
 Her şes jî, bi şarêñ reşin  
 Xezala min, delala min  
 Her şes jî, xweş keleşin.

Di vir de tê xuyakirin, ko di çaxekî de jinêñ ko-  
 çera jî bi kum bûn. Lê iro li serej jinê koçeran kum  
 nayêñ xuyakirin. Ji ber, ko Kurd û Ereb gelek ca-  
 ran têkeli hev dibûn û Kurdan xwe Erebî giredane.  
 Lê gelek diriste ji koçeran jî digotin: "Ereb, tenê bi  
 daxwaza koçer hatiye û di awira misilmana de, heçi  
 kesê di kona de Ereb têñ jimartin. Ji ber, ko koçeri,  
 bi daxwaza Bedewî ye."

Ev helbeste giran hatiye û govenda li ber wê jî  
 girane û diriste, ko bi tiliyêñ hev bigrin. Daxwazên  
 bilind têde xuya nakin. Tenê këşan û dawî gelek  
 xweş û nerm hatine.

\*\*\*

## FERHO

Ferho bavê Uzêre  
 Axa bavê Uzêre  
 Talan anî ji berjêre  
 Talan anî ji berjêre.

Ferho tu bavê Eminê  
 Axa tu bavê Eminê  
 Talan anî ji Mardinê.

Ferho ez birîndarim  
 Axa ez birîndarim  
 Ji derdê gewran dinalim.

Belki hêj bêtir bî, lê -ez hew jê dizanim. Ferho,  
 kurê Uzêr Axa ye, ji malmezinêñ Xerza ye. Di nav-  
 bera wan û Ezidîyêñ Xaldan de gelek şerêñ xwîndar

çêbûne û bi hezaran mirov ji herdû rexan hatine kuştin û dawî Ferho Axa bixwe hatiye kuştin û Xalita çûne Şengale.

Lê rojekê, hespê Ferho Axa di bin de hate kuştin û dijmîna nézîkî lê kirin, tenê Mehmûdê Xulem le ber axê peya bû û got: "Axa! bere maleke bêxwedî bî û ne êleke bêserî bî!" û hespê xwe da axê û ew hate kuştin.

Di wê çaxê de û belkî di her çaxê de, ev tistikî raste. Ji ber ko, eger malek bêxwedî bimêni axa û êl dikarin wê malê xwedî bikin, lê, ko êl bêserî bimêni gelek dijware, ko eger yekî dî ji êlê yan ji malbatê weke ê kuştî hebî yan bibî.

Ela bêserî, weke miletê bê dewlet û sereke; di nav destan de belav dibî û dikevî ber zor û setema dijminan û ji hev belav dibî. Herwekû Plıxanov di-bejî: "Dewra peyayê baş di tarîxê de heye, ko ne mirovekî baş bikevî pêşîya mileteki, partîyekê, wê zû ji hevde bikevin û nikarin tiştekî bibin seri."

Çawa, ko heta iro ji, rûpelên tarîxan ji kar û qenciyêن mirovê baş, di her warî de hatine dagirtin. Eger bi xeydin yan nexeyidin, mirovên baş, lîzeke mezin di tarîxê de digerênin û şopeke mezin bi şûn xwe ve dihêlin.

Ev ji giran hatiye û li ber wê dilan giran digere.

\*\*\*

## KEZÎZERÊ

Kezîzerê, kezîzer  
Xulam memkê gilover  
Serî sor û bînî zer  
Mîna berfa zinare  
Sîka dara tim li ser  
Mîna sêvîn Xelatê  
Serî sor û bînî zer  
Mînane penîrêñ ter  
Min givaşt û av jê her  
Tu ji govendê were der  
Te ramûsim, cardî her  
Te divê her û te divê mer.

Kezîzerê lewendê  
Gewrê, bozê, bilindê  
Kevoka nava gundê  
Sîng doşek, balîf zendê  
Ez ramûsim te rindê  
Destê xwe bi destê min de  
Tevde herin govendê.

Kezîzerê hithîti  
Li binya mala şemiti  
Dawa têqî lewiti  
Dilê lêwik şewiti.

Kezîzeren me çarin  
Her çar jî bi kum û şarin  
Hilma memkan em xwarin.

Kezîzeren me şeşin  
Her şeş jî bi şarêñ reşin  
Hilma memkan ci xweşin..

Didî xuyakirin, ko por zerîne û serê memikên wê  
nû hildane, weke sêvên Xelatî ne, serî sor û bin si-  
piñe, weke berfa zinarê Mêrdinê, ko siya daran tim  
li sere..., ci tiştên giranbiha gotine!

Kezi, gulî, ew porê hûnayî yan jî badayî ne, ko  
bi paşde te berdan û bisk, ew porê, ko bi ser  
dêmén jinan de têne xwar u carna çivan didin xwe û  
bi alîkî de serê xwe xwar dikin yan jî jin wan bi ser  
hinaren riwê xwe de xwar dikin, ko karibin nêçîre li  
dilê rebenê weke me bikin. Lê zulf, ew çend tayêñ  
porin, ko bi ser enîya jinan de tene xwar û gelek  
caran jî perçe-perçe dibin û hin ji wan weke dûvê  
dûpişkan serê xwe berjor, bi ser erpri, boşî,  
temezî, qolêñ zérän de bilind dikin û enîya gewr  
weke rojeke, ko bikevî nav hewran û carnan li me  
ronî didî, tê xuyakirin û tîrejeke tava evîndarı tavêjî  
dilê evîndar û bi carek di nav pêtî û agir de diheli.

Lê dengbêjê me gelek bi memikan ve maye û gelek  
pesnên giran ji wan re anîne. Lê ji ber, ko sev hişk

û berf sare, li xwe vege riya ye û gotiye: "Mînane penire ter", ko mirov bigivêşî û av jê herî, wey mal-wêran! Te çiqas bi hostayî pesnê memik û sîngâ yara xwe daye, ko te Cizîrî û Xanî bênav û deng hiştine!

Herwekû ne tenê li ser memik û sîngê maye û bêrê xwe daye zendên dosta xwe û gotiye: "Sîng doşek, balîf zende", eger wilo bî, raste, yara mîrik lewende; gewrê, bozê, bilindê! idî ka jina ji vê lewenda te şerîntir û xweşiktir bî ez benî! Lê camér dixwazî go-vendê ji, erê wele! Eger wilo ji kê ji me re herî seri, emê pêre herin govendê û lotika ji bidin. Ma, kî ji ramîsanê jinê wilo gewr, boz, lewend direvî. Ma nabenî, seydayê me Cizîrî ci dibêjî:

"Di pabosa sîmînsayê,  
Me nêri bejn û balayê.  
Le êli Ebalexulesbabê,  
Esbabesemawatî."

Gerîti, rengeke di navbera esmer û boz de ye. Lê boz çend rengin. Şînboz, reşboz, sorboz ewin, ko rengê sor, yan şîn yan reş di nav bozîtiya wê de hebin; çîlboz, zêde sipî ye.

Lê hithiti, ewe, ko xalêñ sor ketibin nav de û çawa şemiti ye dile lêwik pê şewiti ye. Xuyaye, ko ge-lek çavdêriya wê dikir.

\*\*\*

## KEMALO

Kemalo, Kemalo, wer wer Kemalo  
Min çavê seri xwaro, wer wer Kemalo.

Kemal bavê me tê, wer wer Kemalo  
Reysê cemhûryetê, wer wer Kemalo  
Şexê şerîtê, wer wer Kemalo  
Kemal bikêri me tê, wer wer Kemalo.

Kemal go ez nakim, wer wer Kemalo  
Sulhê qebûl nakim, wer wer Kemalo  
Şexan ji vir rakim, wer wer Kemalo  
Axa ji vir rakim, wer wer Kemalo.

Kemalo rēzane, wer wer Kemalo  
İsmeto rēzane, wer wer Kemalo  
Çarox girēdane, wer wer Kemalo  
Şerîl ser Yewnane, wer wer Kemalo.

Herwekû tê xuyakirin, Kurd, herdem dilxwaz û  
dilbijokê mirovên mér û gernasin, meger dijmin bî jî û  
heta li ser dijminên xwe jî, dibêjin û pesnê wan  
didin. Ji ber, ko nexwendî û nezan û bê bir û  
bawerin, nezanin welatperwerî çiye. Tenê dizanin, ko  
misilmanin û dewleta, ko dibil destê wê de dijîn,  
dewleta xwe dihejmîrin. Ev helbesta han  
nişana nezanî û paşvemayîna wane, ko bi sedhezaran  
ji Kurd kuştine û hejî dibêjin! "Kemal bavê me tê!"

\*\*\*

## ŞEREFO

Kumê Şeref kulave  
Şerefo were kumê xwe  
Kumê Kurdo kulave  
Lo Kurdo were kumê xwe  
Umrê Şeref ev gave  
Şerefo were kumê xwe  
Umrê Kurdo ev gave  
Lo Kurdo were kumê xwe.

Ev kum ne kumê mine  
Lo lawo were kumê xwe  
Kumê hevalê mine  
Şerefo were kumê xwe.

Dijminê Kurd heta kumê wan diçirandin û ji bo  
her gotineke kurdi pênc (5) kaxetên Turki ji wan  
distandin û kincêñ Kurdi diçirandin.

\*\*\*

## KERİM LAWO ÇEQİLMAST

Kerîm lawo çeqilmast  
Min meyand û nebû mast

Küçikê Mexmer alast  
Bûme koçerke birast  
Kerîm lawo çeqilmast.

Ez çûme Şam û Heleb  
Anîn sê biznê celeb  
Yeke kwîr û yeke pîr  
A dinê bizna tiştîr  
Bûm hemberê mala mîr

Kerîm lawo çeqilmast.

Xuyaye, ko miletê Kurd tiştek nemaye, ko li ser tiştek negotiye, heta li ser mast û dew jî beste go-tine.

Kerîm û Dawid ji gundê Zêdiyê, ji nav seyîda-Degorî ne û Kerîm zaroke û li mast digerî û dixwazî bixwî. Lê diya wî jêre dibêjî: "mastê me meyiya ye û bizinên me nebaşin, bêşîrin." Ev beste li ser devjenka navbera kur û dê hatîe çekirin.

### DAWID LAWO MERE DEW!

Dawid lawo mere dew  
Naxum dew, naçînim dew  
Çi taştêke bi derew  
Dawid lawo mere dew.

Dew dewê bizna kirre  
Dawid lawo mere dew  
Ava Zêdiyê pirre  
Dawid lawo mere dew.

Di van herdu dîlokan de keşan û dawî xweş hatîne, tevlî, ko serpêhatî ne tiştekî xweş û giranbiha ye jî. Lê rewş û pergala belengazên miletê Kurd didî zanîn. Didin zanîn, ko di nav pêlên tarixê de belengazî ji welatê me derneketiye û xwarina dew, bê goman, taştêke derewîne. Ma çi tewaş tê heye? Dê ji kure xwe re dibêjî: "Meçe parsa dew meke!" Ji ber, ko taştîya bi dew nehêjaye.

\*\*\*

## GUNDO BĒRÎ

Gundo bērî, bērî, bērî  
Gundo ber xopano bērî  
Mala gewram li taxa jērî  
Gundo ber xopano bērî  
Gewram rinde pez da bērî  
Gundo ber xopano bērî  
Ez ramîsim li mala mērî  
Gundo ber xopano bērî.

Gundo, bêrya berx û mîya  
Gundo ber xopano bērî  
Wêl pêsingê av û giya  
Gundo ber xopano bērî  
Gewram rinde, mîr kotîya  
Gundo ber xopano bērî.

Gundo bêrya berx û peze  
Gundo ber xopano bērî  
Wêl pêsingê av û heze  
Gundo ber xopano bērî  
Gewram rinde, mîr tereze  
Gundo ber xopano bērî.

Li vir ji, dengbêjê me, dilê xwe daye jineke bimîr  
û direjî mîrê wê dikî û dibêjî: "Gewram rinde, mîr  
terezê". Lê çîma gewra wî dane vî şîndolê mîra? Gu-  
neh di gerderâ dê û bavê wê de bi! Lê gelek diris-  
te, ko mîrê wê yekî pir maldar yan zirzop û mezene,  
ko danê. De bere keç zorê bidin xwendinê, ko wan  
nedin mîrén şîndol û teres; de bere jin xwe zû ji vê  
bextreşiyê xelas bikin û çavên xwe vekin, ko dê û  
bav nikaribin wan bizor bidin mirovên nebaş.

Lê pir diriste, ko mîrê gewra wî baş bi ji! Lê di  
çavê wî de, bê goman, teres û şîndol û nebaş tê xu-  
yakirin.

Kêşan û dawî gelek xweş hatine danîn û tenê  
rewşa gelê Kurd nişan didî, ko çawa diçin bêriyê û

gewra wî pez daye bêrî û hin çêr ji mîrê wê re da-ne.

\*\*\*

## GULÊ HEY NARÊ

Gulê hey narê, narê, narê Gulê  
Gulê hey narê, narê, narê delal.

Gulê min çavê belek xwarê Gulê  
Gulê min çavê belek xwarê delal  
Gulê ava kwizê kevnarê Gulê  
Gulê ava kwizê kevnarê delal.

Gulê ava Şamê şerbete Gulê  
Gulê ava Şamê şerbete delal  
Gulê ramisanê keçkokê Gulê  
Li mala bavê adete delal.

Gulê mid pacê re meyzekir Gulê  
Gulê ted pacê re meyzekir delal  
Gulê şamqutnî li bejna xwe kir Gulê  
Gulê şamqutnî li bejna xwe kir delal  
Gulê a min bû xwedê nekir Gulê  
Gulê a min bû xwedê nekir delal.

Gulê mid pacê re nehêrî Gulê  
Gulê ted pacê re nehêrî delal  
Şamqutnî li bejnê birî Gulê  
Şamqutnî li bejnê birî delal  
Gulê a min bû xwedê birî Gulê  
Gulê a min bû xwedê birî delal.

Navê dosta xwe daye zanîn, ko Gulê ye û "min di pacê re nehêrî" û "şamqutnî li bejna xwe kir...," ev hemî gotinên xweşin û pesnên hêjane. "á min bû xwedê nekir", li hev rast nehatiye û yekî dî ji xwe re birîye. Belkî jî, belengaz û reben û ji qata jêrî bî û Gulê ji malmezin û dewlemenda bî. Ji ber, ko di pacê re lê dinêrî, ko Gula wî di olîya bilind de ye û

destê wî nagihê, tenê bi awirê çavan dibêni.

Helbeste xweş hatiye û govend li ber dibî û xwe pêre dixelênin û bi giranî dîçin.

Şamqutnî: qumaşeka li Şam çedikin û ji penbûye.  
Lê di sere pêşî de gelek giranbiha bû, le vê dawîyê erzan bûbû, tenê belengazan lixwe dikirin.

\*\*\*

## LEYLO, LEYLO!

Leylo, Leylo, Leylo, Leylo!  
Leylo, Leylo xanimê canê.

Leylo tê ji kaniya bi şiriike  
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo!  
Leylo, Leylo xanimê canê.

Destek cêre, yek şerbike  
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo!  
Leylo, Leylo xanimê canê.

Te xerabkir mala lêwike  
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo!  
Leylo, Leylo xanimê canê.

Leylo tê ji kaniya jorîne  
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo!  
Leylo, Leylo xanimê canê.

Destek cêre, yek misîne  
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo!  
Leylo, Leylo xanimê canê.

Te xerabkir mala lêwîne  
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo!  
Leylo, Leylo xanimê canê.

Leylo tê ji kaniya nav rezo  
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo!  
Leylo, Leylo xanimê canê.

Lêv şerînê dims û gezo  
Leylo, Leylo, Leylo, Leylo!  
Leylo, Leylo xanimê canê.

Mêr şindole, evdal ezo

Leylo, Leylo, Leylo, Leylo!  
Leylo, Leylo xanimê canê.

Di vir de, kêşan girane û ger û govend ji pêre  
giran têñ. Herwekû didî zanîn, ko Leyloka wi xani-  
me. Lë çawa xanim avê dikşenî, nizanim. Kanî dûre  
ji lewra, avê bi cêr û şerbik û misinan dikışenî. Lë  
çawa bî, bi vê çûn û hatinê mala bavê lewik wêran  
dikî. Ji ber, ko tim lê dinêri û nema dikarî karekî ji  
xwe re bikî û disa dil ketiye jina bi mér û dibêjî:  
"Mér şindole û ez evdalim!"

\*\*\*

## LEYLANÊ

Leylanê, ho bi Leylanê, ho bi Leylanê  
Leylanê, ho bi Leylanê, rih û canê.

Leylanê çima, çima ho bi Leylanê  
Leylanê çima, çima sîng dermanê.

Halhala li nav geneka ho bi Leylanê  
Halhala li nav genima sîng dermanê.

Fincanali dest hakima ho bi Leylanê  
Fincana li dest hakima sîng dermanê.

Leylanê wesa, wesa ho bi Leylanê  
Halhala li nav garisa sîng dermanê.

Fincana dest fêrisa ho bi Leylanê  
Fincana dest fêrisa sîng dermanê.

Halhal, kulîkeke, ko dixine nav qehwê, ko iro de  
jêre dibejin Hal yan Hêl; qehwe pê bêtir tal dibî.  
Çawa, ko ji kevnare de Cizîri gotiye: "Qehweya telxê  
digel zihra helahil bide min." Lë Melayê Zivingî goti-  
ye: "zehra helahil, jehra mérkuje." Lë bawerim sey-  
dayê Zivingî, di vir de, şaş bûye û zehra Farisi bi  
zehra Erebi şaş kiriye. Lë çawa xuya dikî ji Ereba  
ev gihaye welatê me?

Evîndarê me, sîng û memikên yara xwe yan ji  
herdû lêvên wê kiriye wek fincana qehwê, ko didin

destê hakim û fêrisa.

Lê sîng dermanê, di istirana bavê Fexriya de hatiye gotin. "Sing u berê min keçikê bike melhema de ve ve birînê", birîna bavê Fexriya, delalê ber dile wê. Çawa, ko di istirana Fatimê de jî hatiye, ko la-wik Fatimê Kiriye "dermanê ber serê tawîyan û ne-saxa."

Lê bi rastî, sîng û berê dosta birast û ronî, dermanê dile evîndar, xemgîr û nexweşa ne.

Ev helbesta ha jî, giran hatiye û tevgera ber wê jî giran têñ û xwe pêre xûz dikin û dixelénin.

\*\*\*

## LÊLÊ KINÊ

Lêlê kinê lê, lê, mala minê way way

Ez ne kinim lê, lê, pel direjim way way  
Tak rihana lê, lê, pel direjim way way  
Aqlê xortan lê, lê, ez tavêjim way way.

Ez ne kinim lê, lê, ne kinikim way way  
Tak rihana lê, lê, pel hûrikim way way  
Aqlê xortan lê, lê, sivik dikim way way.

Weyla kinê lê, lê, mala minê way way..

Gereke em bidin zanîn, ko istiranek bi vî navî  
heye, ko dibêjî:

"Xwedêwo! kinika min kine bi erdêre,  
Ezê herim bajare Erzeroma şewiti qûnderekê bînim  
jêre

Ezê kinika xwe bimeşînim bi dijê di xelkê re,  
De hay kinê lê mala minê.."

Lê min di ristek xwe de gotiye: "ne direje, ne  
kine, gewr û rinde, ya mine.." Pîrê mexan dibêjî:

"Win ji hev re hatine,  
yar, di hembêza mine,  
dinya lihevhatine.  
Sazên me avêñ cêma,  
bisk û kezî tê sema,

İdî tiştek kêm nema,  
Ev dinya tev a mine."

Pîrê Mexan, pîrê evîndarî ye. Lê di koka xwe de pîrê Moxolane, ko mey didane serxweşan. Hembêzki-rin ewe, ko mirov yekî bixî ber singa xwe û bi ser xwe de bigivêşî. Çawa, ko sema govend û dîlane. Her weha di awira min de, jina navçe, ko kin û ne direj bî, ji kin û dirêja xweşiktir û şerîntire.

Kêşana wê sivik û dîlaneke sivik li ber tê kirin û kêşan û dawî xweş hatine û keçikê xwe kiriye takrihan û hişê xortan direvêni. Lelê û way way du gotinê dengîne, ji bo bang û gazikirin hatine.

\*\*\*

## LO ŞIVANO

Lo şivano lolo şivano  
Dil bi kulo bi kovano  
Serê dostê bi qurbano  
  
Navê şivanê min Elî ye  
Pez berda dora gelî ye  
Keç dosta lawkê gundi ye  
  
Navê şivanê min Emere  
Pez berdaye dor mexere  
Dost qurba, lawkê esmere  
  
Lo şivano lolo şivano  
Dil bi kulo bi kovano  
Serê dostê bi qurbano.

Dilgirtin ne tenê di qata bilind û mezin de ye, belki jî, qata jêrî-belengaz bêtir ji hevdî hez diki û dila digirin; diwar û çeper xwe li ber dilketin û evînê ranagirin û evîndarî heta di giya û dar û ber de peyda dibî û sinor jêre peyda nabin.

Kurmanca heta li ser şivan û derwêş û zembîlfi-roşan beste û istiran gotine û hevdû tebandine. Kovân, xemin û kul û nexweşîyeke, eşeke.

Lolo şivano, pez hêrhêr ke  
Serê nêri ser berjêr ke  
Dost xeyîdye xwedê xêrke.

Lo şivano, lolo şivano  
Dil bi kulo, bi kovano  
Serê dosta bi heyrano.

"Pez hêrhêr ke", yanî jêre tiştekî bibêje, ko bidî pey pişta te, ko bêni mal. "Serê nêri berjêr ke", yanî bere nêri bidî pêşîya pez û berê xwe bide mal. Ji ber, ko dosta te xeyîdye; Xwedê xêr biki! Nizanim çima xeyîdye? Hema Xwedê biki dosta şivan jî ne jineke bimêr bi.

\*\*\*

## LAWIKO NOBEDARO

Lawiko nobedaro, belê loy loy...  
Kuriko nobedaro, wî dile min, emrê te!  
Tu ji nobê were xwaro, belê loy loy loy, loy lo..  
Şev reşe diz hezaro, wî dile min, emrê te!  
Lawiko mele Isa, belê loy loy loy, belê loy loy,  
Kuriko mele Isa, wî dile min, emrê te!  
Qeytana devê kîsa, belê loy loy loy, belê loy loy  
Qeytana devê kîsa, wî dile min, emrê te!  
Dest girt û rû ramîsa, belê loy loy, belê loy loy  
Dest girt û rû ramîsa, wî dile min, emrê te!

Di vir de, lawik bi xwe melaye, lê herwekû tê zanîn, zirmelaye. Ji ber, ko bûye nobedar û navê wî Mela Isa ye; ji ber, ko melayen mezin nobedariyê nakin, ji lewra, xuyaye yan feqe ye û yan jî zirmela ye. Çawa tê zanîn, gereke bi paye û ciwan û xweşik bî jî, ji lewra keçikê ew kiriye qeytana devê kîsa. Lê keçikê pir xweş kiriye, ko dibeji: "tu ji nobê were xwar, şev yeke yan şevreşe û diz hezarin", kî zanî vê şevreşe kî hatiye mala me? Ji ber, ko şevreş şevê dizane û bi rastî ev gotin rewşa welatê me, di çaxekî de baş dide xuyakirin. Di şevreşê de bi hezaran diz digerîyan û her kesî derîyen xwe asê dikirin û sitûn û tişten giran didane pişt derîyen xwe,

ko diz nikaribin vekin û gelek di van şevreşan de dihatin kuştin û gelek jî talan dibûn. Çawa, ko gelek qız û xortan di van şevreşan de hevdî direvandin û gelek diçün civanê hev. Lê gelek dijware, ko eşkera u li oda digotin: "Ez ketime mala (...) û min sewal û pezê wî, nivîn û malê wî dizin û derketim..."

Bê şerm û fehêt pesnê xwe didan û xwe gernas û payedar didîtin û kesî dengê xwe nedikir û beg û axa ew li cem xwe xwedî dikirin û ci tiving û rextên baş hebûna ji wan re dikirîn.

Lê iro, dizi tiştekî pir şerm, fehêt û pîse. Kes li xwe danayêni, ko bêjî bavê min dizi dikir! Lê diziyeke dî, ko ketiye nav bazirgan û karbidest û beg û axan, diziya bajarı, ko carnan bi milyona didizin. Tenê diziya lêwik ji sîng û berê dosta wî bû. Ji lewra, jêre tenê ev reng dizi diriste.

\*\*\*

## LÊ NÛRË

Lê Nûrê, Nûrê, Nûrê lêlê Nûrê  
Lê Nûrê, Nûrê, Nûrê heyla Nûrê  
Biçükê, bê qisûrê lêlê Nûrê  
Biçükê, bê qisûrê hay lê Nûrê.

Porsorê, guli hûrê lêlê Nûrê  
Porsorê, guli hûrê hay lê Nûrê  
Qîza şexê Bizgûrê lêlê Nûrê  
Qîza şexê Bizgûrê hay lê Nûrê.

Navê wê Nûrê ye û keça Şexê Bizgûrê ye. Bizgûr gundekî Omeriya ye, di kevî rajorê Nisêbinê, û mala Şexê Bizgûrê dibejin "em Berzencî ne". Herwekû tê zanîn, xuyaye keçikê Bizgûrê xweşik û delalin. Lê hevalê me dibejî: "Kinikê bê qisûrê". Lê bi rastî, kinkayî jî, ji jina re kemasîyeke û her kes naxwazî jina kin bêni. Lê gelek istiran li ser kinika hatine gotin. Tenê min awir û bawerîya xwe di biwara jinê de ji were berî niha daye xuyakirin, ko ez dixwazim hemî jinêne Kurdistanê ne kin û ne direj bin, le herdû jî, ji istiran û dîlokan ne bê par û pişkin.

Ji ber, ko geleka li ser bejin kin û gelekan jî li ser bejin bilinda gotine û bêtir Kurd ji bejna zirav û bilind hez dikan. Çawa, ko jin jî, ji bejinbilinda hez dikan û dixwazin mûrê wan bilind û girtikên milê wî jî, bilind bin. Ji kin û ziktelêre weke min hez nakin.

Lê ev jî şasî û çewtiyeke, ko jin pê hatine xapandin. Ji ber, ko mî ne bi bejn u bala xwe ye, çawa jin jî, ne bi bejn û bala bilinde. Tenê ji teva bêtir gereke çend pesnên hêja di herdûwan jî hebin.

1- Gereke zana û bîrewer bin. 2- Gereke comerd û nandar bin. 3- Gereke xwendewar û çekrox bin.  
4- Gereke nerm û dilovan bin û ne diz û derewîn bin, welatperwer û partizan bin.

Pêşîyan gotine: "Ez wî mîrî dixwazim, ko li oda li jor û li aşa bêdor û mafê xwe distenî bîzor û li oda rûnê li jor."

Jinê gotiye: "Bere mirov jin bî, lê jina yekî çê bî."

Çawa, ko dibêjin: "Jin jî hene, jinkok jî hene", "jina çê bere di nav beyreqê romê de bî", "li jinê bigere weke ko tu li rehêne ronê risê bigerî!"

\*\*\*

## LURKA - LURKA

Lorka, lorka, lorka, lorka  
Lê Xatûnê lorka  
Mi-b xulama gulyê sorka  
Lê bêmalê lorka.

Çûme mala Hemê Heso  
Lê Xatûnê lorka  
Liber min danîn nan û gezo  
Lê Xatûnê lorka  
Navê qîza malê Erzo  
Lê bêmalê lorka.

Çûme mala Hemê Eli  
Lê Xatûnê lorka  
Liber min danîn nan û qelî  
Lê bêmalê lorka.

Di vir de, dosta dengbêjê me Xatûn e. Ne şivan û gavan e, eger navê wê ne Xatûnê bî. Lê di warê evindarî de, herwekû derbas bûye, Xatûn û gündî weke hevin. Evîn weke tîn, germî, serma ye; weke jîn û vîn. Evîn di her candarî de (bivê-nevê)heye. Çiqas ji wan bixeyidin, çiqas hawîr wan sênc û çeper bikin, çiqas diwarên hasını li ber wan ava bikin, naçare wê evîn di laşê wan de biggerî û naçare wê çavêن xwe li hev biggerênin. Nêr û mî, belki jî hemî candar hetta geya û dar jî, evîndarêن hevin û bê evîndarî, herwekû hin dibêjin, "hevdi ranagirin."

Lorka, fermane, ji dosta xwe re dibêjî: "ji zaroka xwe re bilorêne, bihejêne!" Ji lewra tê xuyakirin, ko careke dî xortê Kurd berê xwe daye diya zaroka-jina bimêr- û jinik dema dixwazî zaroka xwe bixî xew, jêre dilorêni û dibêjî: "De lori, de lori!.." heta wî di xew re dibî.

"Gulyêن sor", di vir de ji kezîyan re hatiye gotin. Lê gulî ji çiqliyêن dara re tê gotin, gulya darê çiqliya wê ye. Lê ji ber, ko kezyen keç û jinan weke guliyêن dara şeng û delalin, ji wan re jî dibêjin gulî. Guliyêن wê çiqas şerîn û xweşik bin jî, lê bawerim, ko porê zer yan kestaneyî şerîntire. Tenê li nav Kurdan şebisk û gulînsor deng dane û çavêن şîn jî, carna di nav istiranêن Kurdi de hatine. Lê çavêن kesk nehatine gotin, tevlî, ko çavêن kesk ji çavêن şîn xweşiktirin.

\*\*\*

## LÊ GEWRÊ

Kanya hêlê li mîrgêwo  
Lê, lê, lê lêlê lê gewrê  
Lêlê, lêlê, lê gewrê.

Kanya hêlê li mîrgêwo  
Xulam sê biske şêwo  
Berdan alîkê bêwo  
Mi-1 eslê gewrê pirsi  
Gewrê bi esil ji Golê wo

Ezê gewrê birevînim  
Xwe bavêjim Sitewrê wo  
Hay lê lê....  
De lê lê lê lê gewrê.

Kanya hêlê li Mezreqa  
Lêlê, lêlê, lêlê  
lêlê, lêlê, lê gewrê  
Kanya hêlê li Mezreqa  
Eniya gewrê mi-b deqa  
Ezê gewrê birevînim  
Xwe bavêjin Senceqa  
Hay lê lê....  
De lê lê lê lê gewrê.

Bi rastî, müsiqa vê helbestê gelek xweş hatiye û navê gewra xwe nadî zanîn. Eger navê wê ne Gewrê bî? Tene navê gundê Golê didî xuyakirin, ko gunde-kî mezin ji gundênen Omerîya ye û dikevî rojhilate Mardin û di ber qeza Sitewrê de ye. Çawa, ko navê Kaniya Hêlê jî didî xuyakirin, lê carna dibêjî li merge, carna jî dibêjî li Mezreqa ye. Gundê Mezreqa jî li nav Omerîyan dikevî, ca nîzanim li kîjan gundiye?..

Lê bi rastî pir xweş kiriye, ko gotiye: "Xulam sê biskeşê", ko "berdane alîkê bê". Bê goman, ba, wan biser hev de radiweşenî û biser dêmên gewrê de belav dikî. Lê "eniya bi deq" li cem min ne gelek şerîn e û diriste, ko ji nav Ereban hatibî nav Kurda.

Di hindama Amûdê de vê helbestê pêlakê deng dabû û di govenda de pir dihate gotin. Herwekû min jî gelek jê hez dikir. Ji ber, ko rojekê ez ji bajêr vedigeriyam, ko min dî serê pozê Keyo di pêçekê de deqandine û ez gelek xeyidîm û min got: "Kê wilo li vi lawikî kiriye?" Diya wi got: "Wele keçikên gundiyan ew deqandine". û çawa min pirsî, gotin: "Xalo! bere weke zarokên Ereban bî, ko xwedê pê razî nebi û ji xwe re nebi". Wê çaxê du tişt hatin bîra min:

Yek jê ew e, ko ev deq ji nav Ereban hatine nav

Kurdan û yet jî ew e, ko ji kevnare de dijminahî di nav miletan de heye, ko wilo hevdî kêm û pîs dibê-nin. Tevlî, ko Turk, Ereb û Ecem ji Kurd mezintir û bilindir bûn jî, lê dîsa Kurdan bi çavekî pîs li wan temaşa dikirin û digotin: "Ereboşk û Romiyên qûn bi cilik!", lê êrişî Eceman nedikirin. Tenê nizanim, gelo ji ber, ko em ji wan dûr bûn yan jî pismamîn hevin ji lewra naxwazin wan pîs bikin?..

\*\*\*

### LÊ NAZÊ, NAZÊ, NAZÊ

Nazê, navê du dîloka ye: Yek ji ber Paleyê re tê gotin û yet jî, di Bêlotê de tê gotin.

(Naza Palevanan)

Lê Nazê, Nazê, Nazê  
Şerînê gerden gazê  
Xwezya bi kesê te bixwaze  
Yê di ber sînga te-d razê.

Navâ naza min Fate  
Kember zîvê toqatê  
Mala paşê nava bî  
Esker anî bi qatê.

Navê naza min Sîsê  
Kember kete ser kîsê  
Mala paşê nava bî  
Esker anî ji Bedlîsê.

Di vir de, zîv hatiye xuyakirin, ko kembera dosta wî ji zîvê bajarê Toqatê ye. Lê navê yara xwe carek Fate û carek jî Sîsê anîye. Lê pir xweş anîye, ko dibejî: "Xwezî bi kesê te bixwazê! Yê di ber sînga te de razî" û paşa û leşker anîne. Dibî Mîrê Bedlîsê bî. Pir xweş hatiye danîn û ger û govend li ber xweş e.

\*\*\*

### LÊ NAZÊ! NAZÊ

Lê nazê nazê, lê naza min!  
Şerînê gerdengazê delala min!  
Xwezî bi kesê te bixwazê, lê naza min!  
E d'ber sînga te'd razê, delala min!

Du çiya li Elmokê hene lê naza min!

Şîşe û Mengene ne delala min!

Zozanêd zeryên me ne, lê naza min!

Zozanêd zeryên me ne delala min!

Du çiya li Elmokê bilindin, lê naza min!

Şîşe û Mengene bilindin lê naza min!

Zozanêd zeryên gundin, delala min!

Lê nazê nazê nazê lê naza min!

Gerden şûşa şirazê delala min!

Nazê navê dosta wî ye. Ji nazdar hatiye, nazik-nazdar, ter û nûhatî û zaoke. Çawa ko Nazenîn cihê nazdar û nazika ye.

Lê bi rastî: "Şerînê gerdengazê/ Gerden şûşa şirazê/ xwazî bi kesê te bixwazê/ yê di ber sînga te'd razê"... gelek xweş hatine danîn û pesn û daxwazêن pir giranbiha û mezin û xweşin; şayanê pesn û şabaşin û gelek ciwan û bi tore danîne.

Şîraz, bajarekî Iranê yê navdare, ko Hafizê Şîrazi ji vî bajariye. Herwekû Elmok, navê gundekî Kurdistane ye û Şîşe û Mengene navê du ciyane, ko li hindama Elmokê ne û gelek diriste, ko di van herdû ciyan de şûşe û mengene (mexnatis) hebin, ko gelek giranbihane.

Zozan, di iro de ji wî cihê sar û hênik re tê gotin. Lê di tarîxan de dibêjin: "Zozan, hindameke dikevî navbera Mûsil, Erzerom û Azerbeycan?" Pirê xelkê vê hindamê, Kurd û Ermen bûn. Lê di iro de hemî Kürdin û kûrê esir dibêjî: "Çend kelekên Kürdên Becnewî û Bextî yan Mehranî di vê hindamê de hene, ko navê wan kelehan jî dibêjî.

Zerî, navê Xatûna ye, lê nizanim gelo ji ber ko porê wan zere ji wan re dibêjin Zerî yan jî naveke wilo hatiye danîn? Lê Zerî, di nav istiranen kurdi de gelek hatiye gotin. Lê di iro de em dikarin ji keçikan re ji bo payedarı û şîranî bibêjin, Zerî. Lê ez jî, keçikan re di iro de dibêjim. Şerîn, ji ber ko "şerîn" tevlî ko tîpeke mî bêtire jî, lê xweştir û ciwantir tê ser zimanê mirov. Lê ji keçen malmezinan re em dibêjin, Zerî.

\*\*\*

"Canê..... Cana min!" Dîlan liber wê sivik tê û ge-  
lek hejandin têde heye.

\*\*\*

## MASİKO

Masîko perbeleko yar yeman  
Masîko perbeleko yar yeman, dost yeman  
Vê avê şêlû meko yar yeman  
Vê avê şêlû meko yar yeman, dost yeman  
Yar gewre ji xew rameko yar yeman  
Dost gewre ji xew rameko yar yeman, dost yeman.

Masîko perhêşîno yar yeman  
Masîko, perhêşîno yar yeman, dost yeman  
Vê avê me çelqîno yar yeman  
Vê avê me çelqîno yar yeman, dost yeman  
Dost gewre me tîrsîno yar yeman  
Yar gewre me tîrsîno yar yeman, dost yeman.

Di vir de, tenê Kêşan gelek xweş hatiye û daye xuyakirin, ko mala dosta wî li ser çemekî mezin yan jî pingaveke mezine, yan jî hewzekî avê di hewşa wan de heye, ko masî têde xwedî dikirin û bi masî re mijûl buye. Dosta wî razaye û naxwazî heta masî di nav avê de xwe bihejînin da, ko dosta wî ji xewa şerîn ranebi, êh?1.. Çiqas xemxwarê dosta xwe ye! Bere dilketin tenê wilo bî, yanî weke vi xortê Kurd bî, ko naxwazî masî tevbigerin, ko dosta wî ji xew ranebi.

Lê di vir de, min daniye, "Masîko perbeleko" û hem diriste, ko bê gotin: "Masîko pirbeleko" tu kîjanî bibêjî diriste.

Helbest gelek xweş hatiye gotin û govend liber vê dîlokê giran tê gerandin. Feqehan "Bêlote" li ber vê dîlokê dikirin. Pir xweş û nerme. Jin jî dikarin liber vê dîlanê bikin, jî ber ko giran digerin, Herwekû didî xuyakirin, ko Kurdan-kurmancan- ji her tiştî û li ser her tiştî dîlok çekirine.

\*\*\*

## LÊ CANÊ

Lê canê, canê, canê, cana min  
Qirik tije mircanê Cana min  
Sorgulê bel û banê, Canê lê  
Şîn bû li Aşê Hecîko cana min  
Li ser dika Şabanê, canê lê.

Doşeke ji bo razanê, Canê lê  
Balîfe ji bo paldanê cana min  
Rû kul bû ji ramûsanê, Canê lê  
Sîng kul bûye ji tevdanê, Canê lê.

Min dî li gir fitili, Cana min  
Bi tena xeftanê gulî, lê Canê  
Li seri Sara Mûsili lê Canê  
Gulkê şarê giran bûn, Cana min  
Li kêlekê edili Cana min  
Çarik li bejnê herbili lê Canê  
Neynik danî xemili Cana min  
Kulên te pir giranin, Canê lê  
Şax dane ser vî dili, Cana min  
Xwezî min gewra xwe bidîte, Cana min  
Li ser kewna ewili, Canê lê, Canê lê...

Di vir de, evîndarê me-torevanê Kurd- pir ciwan  
û bi tore gotiye û pesnên pir bilind û peyedar ji Ca-  
na xwe re anîne, weke: "Qirik tije mircanê/ Sorgulê  
bel û banê/ Doşeke ji bo razanê/ Balîfe ji bo paldanê/  
Rû kul bû ji ramûsanê/ Sîng kul bûye ji tevdanê/  
Tena xeftanê gulî/ Çarik li bejnê herbili/ Neynik da-  
nî xemili.../ Lê kulên te pir giranin/ Şax dane ser  
vî dili". Tiştek ji dengbêjan re nehiştîye, ko pê pes-  
nê dosta xwe bidin û Ebûnewas û Seydayê Cizîri bi-  
zor karibin van pesna bênin.

Lê di Kezîzerê de, "Sîng doşek balîf zendê" berî  
niha derbas bûne. Lê bi rastî vî ji xwedîyê "Kezîze-  
rê" kêmîtir negotiye û belkî jî xwestir gotibî.

Di gotinê de, kengî giha dawî, "Lê Canê Canê  
Canê lê", tê "ê" hinekî bi jérde dirêj bikî û bibejî:

## MAMŪRO

Mamûr, mamûr, mamûra  
Ketme kodê tenbûra  
Ketme oda maqûla  
Ketme devê sakûla  
Yadê gidî li mamûra.

Mamûr hat û tirtirî  
Li Metîna engirî  
Xwedyê cezma çekurî  
Eger cezma te qetya  
Tê yeke dî bi çibkîrî  
Hûr ü biçûkê bajarya  
Li gulka kumê te birî  
Delîl dayê li mamûra.

Mamûr hatî ji Terê  
Xwendî qoçana kerê  
Mamûra li bextê te me  
Kerê-m mexe defterê  
Yadê gidî li mamûra.

Mamûr hatî ji Xirbika  
Deftera kera ve ka  
Terya kerê Xeliko  
Di qoşa jina xwe veka  
Delîl yadê li mamûra.

Ev helbesta sivik li nav Omeriya hatiye çekirin û  
ji devê yekî dengbêj bi navê Xeliko, ji gundê Xirbe-  
kavir hatiye danîn û di biwara mamûrê kera de,  
hatiye çekirin. Di wê çaxê de qoçanê kera distendin  
û vî mamûrê bextreş, kera Xeliko jî, girtibû û doza  
qoçanê lê dikir û Xeliko rahijte tenbura xwe û ev  
helbesta ha li ser çekir. Di şerê Pêşî de, berî 50  
salî ev ketibû qawana û dihate gotin.

Bi rastî, niviştek ji bo jîndariya Xeliko û Cimo  
gerekî û divê helbest û serpêhatiyen wan têde bêne  
komkirin.

"Sakûl", "sêwlek" sêwî ne yan jî zarokên biçûk û pîsikin. Herwekû, Metîna, Tere, Xirbekâ, Xirbekavîr gundêñ Omeriya ne û ev Xelikê Üsê-Xeliko- li welatê Mardînê navdare.

Kêşan û dawî gelek xweş hatine û helbeste di êrişê de ye. Herwekû, divê hindamê de helbeste û stranêñ êrişî pir têne çêkirin. Weke: "Ecemê yarê" û "Besna Xelîl" û Hiso way" gelek xweş hatine, têne daxwaz ne başin.

\*\*\*

## MAMÎRO

Mamîr, Mamîr, Mamîr, Mamîro  
Mamîr, Mamîr, Mamîr, wezîro  
Mamîr ji çiyê tê Mamîro  
Bîna gula jê tê wezîro.

Xelkê dosta te bir Mamîro  
Xwelî li serê te kir wezîro  
Hespê quer li meydanê Mamîro  
Sor bûye ji xwêdanê wezîro.

Lê nizanim, "Mamîr" ji Mamê mîr hatiye yan jî Mamîr serbixwe yek nave? Lê herwekû tê zanîn, navê mirovekî ye, ko çuye ciyekî û dosta wî xwestine û guhaztine û hê ji nû vege riyyaye. Ji lewra keçik dibêjî yan jî dengbêj dibêjî: "Xelkê dosta te bir / Xwelî li serê te kir". Lê ji xwelîyê ji mezintire, ko dosta mirov bibin. Li vir tê zanîn, ko Mamîr hatiye xapandin û çawa xuyadikî ev dîlok pir kevnareye, belki jî berî çend sed sal bî, ko çax û di dema mirekan, derebegän bû.

"Wezîr" didî xuyakirin, ko bixwe mîrek bû yan jî ji mala mîr bû û li ber destê kurmame xwe wezîr bû. Çawa, ko ji hespê wî tê xuyakirin, ko di meydana şer de hatibî kuştin yan jî girtin. Û paşê xelkê dosta wî biribî û dosta wî yan xuşk û diya wî, ev dîlok li ser gotibin.

Weke, ko diya Sulêymanê Emer li ser kurê xwe dibêjî:

"Hekîmo qurba te ji Ana,  
tê ji birîna Sulêymanê min re çêkî derman û sê  
barî di hetwana,  
Ez neketime heyra kuştina Sulêymanê Emer,  
Kuştin, kuştina mîra ye Silêmano!  
Lê ketime heyra we heyrê  
Cotê xanim û zerîyan  
Li birca belek bê xwêdan û xwedî mane,  
Lo Sulêymano....."

Ji ber, ko hespê quer ko li meydanê maye û ji  
xwêdanê sor bûye, nişana kuştina Mamîre, ko hespê  
wî bê xwedî maye û dosta wî ji xwe re birine.

Kêşa vê helbestê nîvçeyê ye. Ne gelek sivik û ne ji  
gelek girane û dîlan bi nermî liber dibî û ev helbeste  
serpêhati ye, gelek xwes hatiye danîn. Pirê caran,  
keçik di govendêن xwe de dibêjin.

\*\*\*

## MEMYANÎ MEMO

Kemyanî memyanî Memo, memyanî kemyanî  
Xwezî biskek bûma Memo, ji biskê berana  
Hûr hûr biçêryama Memo, li dora zozana  
Çavî li xewka şérîn Memo, destî li ser karbana.

Xwezî pezkek bûma Memo, ji pezkê nêriya  
Hûr hûr biçêryama Memo, li dora gelîya  
Çavê li xewka şérîn Memo, destê li ser morîya.

Xezka ez pezkek bûma Memo, ji pezkê berxika  
Hûr hûr biçêryama Memo, li dora tatika  
Çavê li xewka şérîn Memo, destê li ser morîka.

Xwezka pezkek bûma Memo, ji pezkê bizina  
Hûr hûr biçêryama Memo, li dora kizina  
Çavê li xewka şérîn Memo, destê li ser bazina.

Navê lêwik Mihemed Memo ye. Lê  
nizanim, ne biskê berana yan pezkê berana ye?  
Keçik dixwazî, ko pezkekbuña û di ber şivanê xwe

de li van hindaman biçerîya û herdû biketana xewa şérîn, destê şivanê wê li ser memik û morî û bazina bûna.

Şivan gelek ji pezê xwe hez dîkin û hawîr digerênin û diçerênin; dilgirtina şivan û paşa ji hev nadî alî û keçik herdem dixwazin bi dilê xwe ji xwe re xortekî vebijerîn. Ci dibi ne xema wê ye; ne xema waye. Çawa, ko hatiye gotin:

"Bere dilî bi dil bî  
Xwarina min û te gilgil bî  
Tûrikê parse li mil bî  
Balîfa bin serê me kevir bî..."

Van tiştan tevan dixwazî, ko tenê dilî bi dil bî. Çawa, ko ristevanê Ereb dibêjî: "Xwezi Selma di gorê de bi min re paldana, di teniştâ min de bûna". Li cem ristevanê Ereb, dojeh û bihiştakesk weke hevin, ko dosta wî "Selma" di teniştâ wî de paldayı bûna. Evîn, li her der û di nav her candarı de, bi xurtî hatiye meydanê, meydana hebûnê. Weke "Mem û Zîna" Kurdi, "Romeo û Juliet" ya Ewrûpi, "Leyla û Mecnûn" ê Erebî û "Bêjîn û Menîca" Farisi.

\*\*\*

## NAZLİYÊ

Lê limin, lêlê limin, lê limin..  
Lê limin, lêlê limin, lê limin nazlıyê  
Kinikê çelebiyê lê nazlıyê  
Lêlê limin lê limin nazlıyê  
Biçükê efendîyê lê nazlıyê  
Mi-j xwere li çolê dîyê lê nazlıyê  
Lê limin, lêlê limin, lê limin nazlıyê.  
  
Lê nazo sebra dila, nazlıyê  
Lê limin lê, lêlê limin nazlıyê  
Lê limin nazlıyê  
Sîng gewrê, bexçê gula  
Lê limin lêlê limin nazlıyê  
Lê limin lê nazlıyê.

Heydê em hevdî birevînin  
Lê limin, lêlê limin  
Lê lê limin lê nazlıyê  
Xwe bavêjin nav Mila  
Lê lê limin, lêlê limin  
Lê lê limin lê nazlıyê.

Nisêbînê bi bexçeye  
lê lê limin lêlê limin  
Lê lê limin lê nazlıyê  
Gul û rihan têde ye  
Lê lê limin lêlê limin  
Lê lê limin lê nazlıyê  
Meskenê min û te ye  
Lê lê limin lêlê limin  
Lê lê limin lê nazlıyê

Nazlıyê gelek xwes hatiye gotin û gelek pesnên giranbiha têde hatine, weke: "kinikê çelebiyê", "biçûkê efendiyê", ko du gotinê Turkiyê ketine nav zimanê Kurdi; ko herdû ji bi daxwaza xwedîrûmet û xanzade hatine, çawa, ko "Sebradila, Bexçê gula" gelek ciwan hatine, ko ristevanek bizor karibî van pesna ji dosta xwe re bibejî. "Nisêbîn", bajarekî Kurdistanê ye, dikevî Rojhilate Mardinê, ko paytexta "Hewr û Mîtan" bû. Çawa, ko iro ji, Heverka û Omeriya ko bermayê Hewr û Mîtan in, li ser Nisêbînê ne.

Ev Nazo, ji kevnebajarê Darê ye û Yûsifê Axê Darê ew revandîye, çawa, ko di bendekê de hatiye gotin:

"Roja şerê newalê  
Ehmed çûbû hewarê  
Yûsif Nazo revandî  
Dane banê enbare  
Lê Nazo nazlıyê..."

Îskê zirnevan, ev li Amûdê berî 50 salî ev Nazo digot. Lê roj biroj xweştir kirine û çetir gotine.

Lê hin dibêjin, Nazo ji gundê Amûdê ye û Yusif ji kevnebajarê Darê - gundê Darê ye?

Tenê tê bîra min, ko xelkê Amûdê li ber vê hel-bestê dîlan dikirin û govend dihejandin.

\*\*\*

## NOFA NOFELÊ

Lê nofa nofa nofa..  
Lêlêlê lêlê lêlê lê nofa!  
Lêlê lêlê lê nofa.

Rêka Qûlê bi ecûre  
Lêlêlê lêlê lê..  
Lêlêlê lêlê lê nofa  
Singê te bi deqê hûre  
Lêlêlê lêlêlê lêlêlê lê nofa  
Lêlêlê lêlê lê nofa  
Mîna bexçê Zinarê  
Ji xorta re destûre  
Lêlê hey lêlê lê nofa.

Rêka Qûlê bi şebeşe  
Lêlêlê lêlêlê lêlêlê  
De lêlêlêlê lê nofa  
Singê te bi deqê reşe  
Hey lêlêlê lêlê lê nofa  
Ramûsankê bi min de  
Li mala bavê ci xweşe  
Lêlê lêlê lêlê le nofa.  
Min dî li bîra Bamiştê  
Lêlê.....  
De lêlê lêlê lê nofa  
Ez rûniştim teniştê  
Lêlê lêlê lêlê lê nofa  
Min destê xwe kir ber piştê  
Jê têbihna bihiştê  
Lêlêlê lêlê lê nofa.

Ev Nofa ji gundê Çûlî, ji nav Mila ye û berî pêncî salî li Amûdê digotin. Lê vê paşyê, Cizrewîya bi ser

ve zêde kirin û xweştir kirin û gotin:

"Eyndîwerê paytexte

Keç kevoka ser texte

Te ne dîne, ne bexte

Bîstkê rûnim li rex te.."

"Mîna bexçê Zinarê, jê têbihna bihişte" gelek  
xwes hatine gotin.

Herwekü didîzanîn, ko bexçê Zinarê gelek xwes û  
têr dar û çandînî û hatin û hebûne. Ji hemî dost û  
yaran bihna bihişte tê ez benî!

\*\*\*

## NE Lİ MALE

Nelmale hoy nelmale, nermokê nermê nelmale  
Nelmale hoy nelmale, delala xorta bêhale.

Hatim derî dadayî

Nermokê nermê nelmale

Hatim derî dadayî

Delala xorta bê hale

Li ser doşekê paldayı

Nermokê nermê nelmale

Li ser doşekê paldayı

Delala xorta bê hale

Min girt û ramûsayî

Nermokê nermê nelmale

Min girt û ramûsayî

Delala xorta bê hale

"Nermokê nermê nelmale" gelek bi tore hatiye da-nîn; "Delala xorta bêhale" ji vir têxuyakirin, ko destûra xorta teva li xwe dida ko wê ramûsin, ji lewra jere gotine: "Nermokê nermê". Ev dîlok di ber paleyê re dihate gotin û belki jî, koçer û feqeha jî li ber vê dîlokê governî û dîlan û bêloote dikirin.

Lê herwekü têbîra min, bi vî navî dîlokeke din jî hebû, ko li destaran digotin: "Nelmale, nelmale lêlê lêlê, Nelmale ha nelmale canê lêlê bêmale".

Lê mixabin, ko nayê bîra min. Tenê dixwazim lê bikolim, bibênim û binivîsim.

Di vir de gelek gotinê dengî hatine, wek "hoy hoy, lêlê.." û ev reng helbestê didin zanîn, ko hel-bestvan ne gelek jîr û serdeste. Lê weki dî gelek xweş hatiye. Ji bo dîlaneke giran û paleyê jî dibî û tê gotin, herwekû Bêlote jî pê dibî.

\*\*\*

## NÊRGİZÊ

Lê nêrgizê, nêrgizê  
Xwedê mîrê te-bkujê (kuzê)?

Şeva mîrê te bimrî  
Ezê xwe-1 te-bkim dizê

Lê nêrgizê koçerê  
Teresbavê koçerê  
Şerînê reng esmerê  
Evarde ketme berê

Lê nêrgizê Heldayê  
Teresbavê Heldayê  
Mi-d pozê bavê gayê  
Kanê soza te dayê  
Tu-1 pey soza xwe nayê.

"Nêrgizê", "koçerê", du navê kurdî ne. Ji jina re têne danîn û ji bo, ko Nêrgiz geyakî xweşike û koçer şerîn û xweşikin, ev herdû nav li jinan kirine.

Di vir de jî, dosta mîrik bi mîre û bi serde dijûnan didî û dibêjî: "Teresbavê/ mi di pozê bavê ga-yê", weylê bêoli! Çawa van dijûnen dijwar ji dosta xwe re didî?

Herwekû dixwazî mîrê wê bimrî, nifira lê dikî û dibêjî: "Xwedê mîrê te bikujê/ Şeva mîrê te bimrî/ Ezê xwe li te bîkim dizê". Malwêran! tu nahêlî jinik ji reşa xwe derkevî û di wê şeva pêşî de, ko şîn, girî, herkes dil nexweş, tê çawa herî diziya dostika xwe?

Lê pir diriste, ko ji ber xwe û dosta xwe ve nifira

li şindolê mérê wê dikî û berê civan dane hev, ko di wê şevê de bighêne hev. Lê heta eger wilo bî jî, ne diriste, ko di wê şevê de, di wê şevê bixwe de, herî diziya wê. Ma şevrêş peyda nabin? Ma winê ji ber hev birevin? Malwêran!

Dengbêjekî dî jî dibêjî: "Mêrik bimrî naçim çûnînê" ya "naçim çûnê". Tenê ev çetire, ko di şeva mirina mérê wê de herî diziya dosta xwe.

Lê pir diriste, ko yekî Zazî gotibî? Ji ber, ko dibêjî: "Xwedê mérê te bikujê/ ezê xwe li te bikim dizê". (z) û (j) ne weke hevin û ne diriste, ko bikevin dawîyeke, ya "xwedê mérê te bikuzê/ ezê xwe li te bikim dizê" û Kermanc nabêjin: "xwedê mérê te bikuzê", tenê Zaza wilo dibêjin.

\*\*\*

## NARÛNÊ NARÛNA MÎN

Çi dara li nava dara  
Narûnê, narûnê narûna min  
Çi dara li nava dara  
Kurtikê, rindikê, şerîna min

Tefşokê dest necara  
Narûnê, narûnê narûna min  
Çedkim dergûşê yara  
Kurtikê, rindikê, şerîna min.

Çi dara belalûkê  
Narûnê, narûnê narûna min  
Tefşokê dest biçûkê  
Kurtikê, rindikê, şerîna min.

Çedkim dergûşa bûkê  
Narûnê, narûnê narûna min  
Çedkim dergûşa bûkê  
Kurtikê, rindikê, şerîna min.

Di vir de jî, helbestvanê me bela xwe di jineke bimîr daye. Lê lî ser narîna xwe xweş gotiye û di-

xwazî jêre dergûşa zaroka wê çêkî, lê nema zanibî kîjan dar başe, ko jê çêkî? Carna dara Belalûkê û carna dara li nava dara, kî dizanî bê çend dar di çav xwe rakirine, ko zanibî ka dergûşa diya kurik ji kîjanê çêkî?..

Belalûk weke Qeresî ye. Sivqelûn û Tîrika ji dara wê çedîkin. Çawa, ko Belalûk navê pizikekê ye jî, ko pirê caran li ser dest çedîbi û hin dibêjin: Heçî destê xwe bidî Beqa ev belalûk li ser destê wan çedîbin. Lê bawer nakim.

Lê bi rastî ez nizanim, ev gotin raste yan derewe! Ji ber, ko ez ne dektorim. Lê gelek caran min diye, ko vê belalûkê dibirin yan jî dişewitênin.

Herwekû tê xuyakirin, helbestvanê me xerate, ko dixwazî ji yara xwe re dergûsekê bi dilê xwe çêkî. Gelek xweş hatiye.

\*\*\*

## NARÎNÊ HEY NARE

Hey narê narê narê  
Hey narê narê narê  
Sorgulê yemanê!  
Min çavê belek xwarê  
Narînê hey narê  
Min çavê belek xwarê  
Sorgulê yemanê.

Melazgir, xoş Melazgir  
Narînê hey narê  
Çavreşan çav qeyas kir  
Sorgulê yemanê!  
Me-b çavan hevdî naskir  
Narînê hey narê  
Me-b çavan hevdî naskir  
Sorgulê yemanê.

Melazgir tim ava bî  
Narînê hey narê

Melazgir tim ava bî  
 Sorgulê yemanê!  
 Ji çavreşa xalî nabî  
 Narînê hey narê  
 Ji çavreşan xalî nabî  
 Sorgulê yemanê.

Navê keçikê Narînê ye. Lê navê lêwik winda maye  
 û Narînê ji bajare Melazgir e, ko bajarekî kevnar û  
 tarîxî ye, li jorê Kurdistanê dikevî. "Sorgulê", "çavê  
 belek xware", "çavres", "me bi çava hevdî nas-  
 kir..." tevde pesnên ciwan û peyvên xweş û  
 şerînin, ko nişanen dilgirtin û evindarî ne. Ko ci  
 dema rê nekevî herdûwa, ko bi devê xwe bi hev re  
 mijûl bibin, naçare bi dest û çav û birûwan bi hev  
 didin zanîn û civana ji hev dixwazin û didin hev.

Weke ko tê xuyakîrin, herdû ji, ji xelkên Melazgi-  
 ré ne û nizanim golên avê mezîn li Melazgirê hene,  
 ko ordek bikevinê yan na? Lê kurikê Melazgirê xweş  
 gotiye.

\*\*\*

## HEY MÎRO

Hey mîro, mîro, mîro  
 Hekîmo xwes wezîro  
 Roj hat qîya nîro  
 Şer xweşkir, bi qefta şîro.

Hey hatin, hatin, hatin  
 Koçer ji zozana hatin  
 Dora mîrgê wer hatin  
 Hemî Ereb û tatin.

Hey têno, têno, têno  
 Koçer ji zozana têno  
 Dora mîrgê wer têno  
 Hemî koçerê çêno.

Di vir de didî zanîn ko êl û koçerên dibin destê  
 mîren Bota de koçerên Kurd û Ereb bûn, lê Tat, ew

Erebêñ cotkarin, ko hikarin li ber eşîra desthilênin.

Çawa ko didî zanîn ko mîrê wê heta Qiyala nîvro şerekî xweş bi şûre xwe kiriye.

Çawa ko tê zanîn ev koçer diçûn Zozana û vedigeriyan Germiyana, bê wekû havîna diçûn Zozana, cihêñ xweş û hênik û zivistana vedigeriyan Germiyana, cihêñ germ û têr geya û xweş.

"Zozan" derbas bûye, ko me daye naskirin û cihê koçerên Bota û Becnewîya bû û her yek ji wan çend kelehêñ wan di zozan de hebûn û dibêjî: Navê melikê wan Atîl bû.

Ev tiştê ha, kûrê Esîr, di Sedê 6. Koçî de gotiye, lê di iro de Kurd gelek têde cî girtine.

Lê gotinêñ Torevanî di vê helbestê de nînin ko bidin xuyakirin. Lê tistê ko tê bîra mirov, ev e ko ev helbest gelek kevnare ye û di çaxê şerê şûr û mertala de ye.

Her wekû dîlan bi giranî li ber dibi û koçer di govendêñ xwe de dibêjin. Her wekû feqehan jî ji koçeran wergirtine."Qiyala Mîro", piştî mîro bihindîye, ko palewana hinek nan di vê qiyale de dixwarin û hineki xwe divesihandin. "Qefta şûr" ji Erebî û Kurdi biheve hatiye; "qeft, qebd e; meqbede, ew cihê ko mirov pê digri ko hin Kurd dibêjin: perçiçeş, lê ez nizanim "perçiçeş" ji ku hatiye?

\*\*\*

## HAY CELEBE

Hey celebe, hey celebe!

Wele bavo xweş celebe!

Ji Mûsil birye Helebe,

Wele bavo xweş celebe!

Ew celebê berx û miya

Wele bavo xweş celebe!

Min jimartin, sed û sî ye

Wele bavo xweş celebe!

Mi-j gewrê re da bi derzî ye

Wele bavo xweş celebe!

Ew celebê van bizina  
Wele bavo xweş celebe  
Min çerandî li dor kizina  
Wele bavo xweş celebe  
Mi-j gewrê re da bi bazine  
Wele bavo xweş celebe!

Ew celebê berx û kara  
Wele bavo xweş celebe  
Min jimartin sed û çare  
Wele bavo xweş celebe  
Mi-j gewrê re da bi guhare  
Wele bavo xweş celebe!  
Ew celebê van karika  
Wele bavo xweş celebe  
Min çerandî li dor tatika  
Wele bavo xweş celebe  
Mi-j gewrê re da bi qiflika  
Wele bavo xweş celebe!

Ew celebê van berana  
Wele bavo xweş celebe  
Min çerandî li zozana  
Wele bavo xweş celebe  
Mi-j gewrê re da bi karbana  
Wele bavo xweş celebe

Ew celebê pezên qere  
Wele bavo xweş celebe  
Min çerandî li dor mexere  
Wele bavo xweş celebe  
Mi-j gewrê re da bi kembere  
Wele bavo xweş celebe!

"Celeb", ew kerîyê pezên, ko bazirgan dikirin û ji bo kar bikin dibin bajaran difiroşin. Ev helbesta han didî zanîn, ko ji kevnare de bajarê Heleb cihe firotina pezê Kurdistanê ye û abora Kurd li sere. Çawa ko xuyadikî, lawik pezê xwe firotîye û xeml û

Wele te mala-m xerakir  
Bile te mala-m xerakir  
Bi destê xwe agir berdayê  
Hay de nayê, hay de nayê.  
Min dîtibû di derencê de  
Min milê xwe li milê wê da  
Em tev ketin nêv hewşê da  
Mi-l ser sîngâ gewrê pal da.

Heta stêra sibhê lêda  
Heta dengê melê lêda  
Hay de nayê, hay de nayê.  
Tu kevoka li ber çayê  
Tu xezala-l ber çemayê  
Tu keroşka li nav lemeyê  
Wele te mala-m xerakir  
Bile te mala-m xerakir  
Bi destê xwe agir berdayê  
Hay de nayê, hay de nayê.  
Min dîtibû li nav şenî  
Qozyê çava li min dişkêni  
Destê gula ji mi-r dişenî  
Ji min pêve kes nabêni  
Hay de nayê, hay de nayê.  
Wele te mala-m xerabkir  
Bile te mala-m xerabkir  
Bi destê xwe agir berdayê  
Hay de nayê, hay de nayê.

Ev helbeste gelek xwes û bi tore hatiye danîn û hin gotin û peyvên xwes û ciwan têde hatine. "Keroşka li nav lema/ xezala li ber çema/ û kevoka li ber çayê.." gelek bilind û xwes hatine. Çawa ko, "te mala-m xerabkir/ û /bi destê xwe agir berdayê" gelek bilind hatine û dîlan li ber sivik dibî.

"Tu xezala li ber çemaye", "tu keroşka li nav lemeyê", "tu kevoka li dere çayê", "wele te mala min xerakir û bi destê xwe agir berdayê" bê pîvan xwes

Pîr bûm dil pîr nabi  
Wey malê-m dil  
Pîr bûm dil pîr nabi  
Wey emrê-m dil.

Şahê Ecem rabî  
Hay, hay, hay dil  
Şahê Ecem rabî  
Wey emrê-m dil.

Dil ket ra lê nabi  
Hay, hay, hay dil  
Dil ket ra lê nabi  
Wey emrê-m dil.

"Pîr bûm dil pîr nabi" tenê gotineke pir xweş hatiye. Eger Şahê Ecem jî rabî û bê ser dilê malxerab, nema dilê min dev ji dosta xwe berdidî, nema ra lê dibî. "Ra", çare ye, her wekû di şeran de "ra" bi daxwaza "bexte". Bişarê Çeto dibeji: "Heseno lawo! ra, ra Xwedê ye, were rayê", lê Hesenê Osman neçû rayê û naçar ji gundê Baximzê derket û revîya û xwe neda deste dijmine xwe. Lê gund şewitandin û kurekî Hesen büçük têde kuştin, lê hevalên Hesen jî Mihemedê Derwêş-mezinê Kejika kuştin û istiraneye bi dilxurtî li ser vi şerî hatiye gotin.

Lê kengî dil pîr dibî, belkî jî, dilê pîra bêtir dijware? Ji ber ko, ji xweşîya vê cîhana xweş dûr dikevî û dikî bi carek rawestî, ji lewra jê têr nabi û raborîyen wî tenê ber çavên wî û ji xwe dixeyidî: çîma wilo, wilo... nekiriye?

Govend bi giranî li ber dibî û di kêşan û dawî de xweş hatiye danîn.

\*\*\*

## HAY DE NAYÊ

Hay de nayê, hay de nayê  
Tu xezala-l ber çemayê  
Tu keroşka-l nav lemayê  
Tu kevoka li ber çayê.

xêza destgirtîya xwe yan jî dosta xwe kiriye û morîk, guhar, kember, qiflik û bazina..., ji hevala xwe re dikirî.

Çawa ko didî zanîn, ko ji Mûsil dibî Heleb ko her-dû bajar jî, ji kevnare de weke bajaren Kurdistanê dihatin jimartin.

Lê piştî hatiye mal, bav û bira û mirovên wî pê kenîyane û gotine: "Wele bavo xweş celebe"! xweş bazirgane! Xwedê parêzî, ka te çi kiriye ji perên xwe?

Helbest bi xwe ji alî kêşan û dîlana wê ve xweş hatiye; govendeke bi giranî li ber dibî, lê tu gotin û peyvên zêde xweş û şerîn nanîne, ko mirov karibî pesnê wan bidî û pê dilxweş bibî; tim "celebe" û tim "wele bavo"ye, tenê Gewrê, eger ne navê yara wî, destgirtîya wî bî, xweş hatiye.

"Min çêrandî li dor tatika; li dor kizina; li zoza-na...", tev gotinê nav gunda ne û her kes dizanî, lê carek "sed û sî" û carek "sed û çare" ne weke hev hatine; lê gelek diriste, ko ji bo kêşanê anînê, wiло gotiye? Çawa, ko carna "celebê berx û mi" û carek "celebê bizin" û carek "karikin". Ev jî, ko ji bo kêşan û dawî bî, newekhevi têde heye.

Lê gelek diriste, ko ji bo dawî wiло gotibî? Lê çîma ji Mûsil dibî Heleb! Diriste, ko em bejin, belki ji xelkê Badîna yan Şengalê bî?

Lê "kareban", gotineke Farisi-Kurdî ye, ji (ka) û (revan) hatiye. Ji ber ko, karevan baş ew e, ko bi tişteki zivir bifirkêni û bidî ber kayê, ca eger ka revand ew karevan e? Lê ko ne revand, ne karevane.

Govend bi giranî li ber dibî, her weku "Bêolute" jî li ber dibî.

\*\*\*

## HAY DÎL, HAY DÎL

Hay dil, hay dil, hay dil  
Wey malê-m dil  
Hay dil, hay dil, hay dil  
Wey emrê-m dil.

û bi torevanî hatine danîn û weke dir û yaqûta rîjandine ser riwê rûpelê Torevanî. Ançex hostakî mezin û ristevaneke zana bi hezar dijwari karibî van pesnên giranbiha li peyhev û her yek di cihê xwe de deynî.

Helbestvanê gundi çawa ev gewheren yekane bi heve danîne? Çawa ku di cîkî de dibêjî:

Min dîtibû li ser xaniya  
Tena, tena dimeşîya  
Bi serê lêva bi mir kenîya  
Min devê xwe xîste gerdenê  
Devê min kete ser benîya  
Hay de nayê.....

Weylê çavê serê min bûyi? Ji xwe, ko bi serê lêva bi te re kenîya, ci dimenî qurba?

Ji xwe mirin û mayîn di serê lêvan da ne ez benî! Ca eger kenî destûra te li bexçê sîng û berê xwe daye, lê, ko tifkir ber piyên xwe û bi piyan ew tifperçiqand, mirina malwérane û wê çaxê ji te re dibêjî: Ez te weke vê tifê bê rûmet dibênim û dixim bin piyen xwe..

Lê tenê di qanûna evîndarî de gerek bicarek bimrî, lê tolaz berxwe nakevin, xwe lê dikin bela û ji pey venagerin heta ko xwe bighênin daxwaz û armanca xwe.

Ca bere hezar dijûnen pîs û dijwar jê re bidî ji, lê ew dibêjî: Keça kûçika! derewa dikî, û gelek caran xwe digheni we u sere we dixî bin destê xwe û weka berxekekê hogirî xwe dikî û jinik nema bela xwe jê vedikî..

Jin ji, mirovên dilxurt û rûhişk hezdikin. Ji mirovên bi paye û xeydok heznakin, dixwazin ko mîr li pey wan bigerin û bela xwe ji wan venakin, gelek ji zorê hezdikin û zordesti pir bi wan xweş tê..

Ez gelek ji vê helbestê hezdikim û gelek caran ji xwe re dibêjim. Biravo xortê Kurd!

\*\*\*

## HEYLA BÊZÊ

Heyla bêzê, li te bêzarê!  
Çelemcîtî da ber şarê  
Sêva sorê li gulîya darê  
Lawno! lêxin bînin xwarê!

Bêzê kevoka beleke  
Firek da xwe çû feleke  
Yarê bêzê sed û yeke

Bêzê kevoka sipî ye  
Firek da xwe çû banî ye  
Yarê bêzê sed û sî ye

Bêzê, navê dosta wî ye, lê navê lêwik nehatiye zanîn. Lê Bêzê û Bêzarê ko peyhev de anîne, tişteki pir ciwane, torevanîyeke pir bilinde. Di zimanê Kurdi de, bêzî, neguhdana tişteki ye, lê bêzar, bê ziman û rebene. Seydayê Cizerî dibêjî:

Bêzî dikan ji qencan  
Ji gewr û naz xuncan  
Qedrê gula ci zanin  
Kelbes divê kerê reş.

Daxwaza seydayê mezin ev e, ko mirovên xwe dûri qenca û xunca dikan weke kerane, ko kelbeşê ji gulê çetir dibênin, bêzî dikan, yanî ji qencan direvin, guh nadin wan. Ji ber ko weke kerane, weke kerê reşin, ko kelbeşê dixwazin û guh nadin gulan.

Herwekü sevasora li ser gulîya darê gelek giran-bîha û xweşe, ji ber ko bi tenê maye û tişteki kes-nedîti ye. Ji lewra, bi dilxurtî dibêjî: Lawno! lêxin bînin xwarê!

Herwekü Çelemcît, terîseke cawînî, ji çit çedikin û zêra pêva didirûn û tevlî zêran didin ber şarê xwe. Lê, ji ko hatiye ez nizanim. Dibî ko ji Kurdi û Erebî hatibi.

Ev helbeste di ber paleyê ra tê gotin û giran tê gotin. Herwekü govendê jî li ber digerênin û dîlane-ke giran li ber dikan. Ji bili "Bêzê - Bêzarê" û "sê-

va sorê li gulyê dare" tiştekî dî sezayê dabaşê têde  
nehatiye.

\*\*\*

## WÊ LI SER BANÎ

Wê li ser banî, wê li ser banî  
Lo kuro dîno, wê li ser banî!

Destê rastê li min hilanî  
Lo kuro dîno wê li ser banî  
İşaret kir min nezanî  
Lo kuro dîno, wê li ser banî!

Wê li ser banî çek dişûştin  
Lo kuro dîno, wê li ser banî  
Zend û bazin tev hilmîştin  
Lo kuro dîno, wê li ser banî  
Xortê xelkê li çola hiştin  
Lo kuro dîno, wê li ser banî!

Wê li ser banî cil raxistin  
Lo kuro dîno, wê li ser banî  
Bisk û kezî li ber ba xistin  
Lo kuro dîno, wê li ser banî  
Xortê xelkê bi çola xistin  
Lo kuro dîno, wê li ser banî!

Wê li ser banî cil kutane  
Lo kuro dîno, wê li ser banî  
Zend û bazin tev hildane  
Lo kuro dîno, wê li ser banî  
Xortê xelkê li çola mane  
Lo kuro dîno, wê li ser banî!

Yara xwe li ser xanî dibêni, ko kinca dişoyî û ra-  
dixî, biskên xwe dane ber baê, zend û bazin tev  
hilmîstine û bi destê rastê jêre raz û remzan dibêji.  
Lê reben qey hê ji nû dil girtiye, bi van raz û  
remzan nizani.

Lê bi rastî rewşeka ciwan û xweşik ji yara xwe re  
daye, ko ev pesnên ciwan jêre anîne û camêr li xwe  
datêni, ko dibêjî: "Wê ji min re bi destê rastê işaret  
dikir, lê min nizanibû çi dibêjî." Ma îcar súc û  
gunehê wê çiye ezbenî?

\*\*\*

## WELE NAÇME BER GARANÊ

Wele naçme ber garanê  
Bileh naçme ber garanê  
Serê malê bidî nanê  
  
Wele naçme ber garanê  
Keçik nedî ramisanê  
Bileh naçme ber garanê  
  
Ew garana ga û golika  
Wele naçme ber garanê  
Min çérandî li dor tatika  
Bileh naçme ber garanê  
  
Serê malê nedî nanê  
Wele naçme ber garanê  
Keçik nedin ramisanê  
Bileh naçme ber garanê.

Bere xortê xwendevan zanibin, ko dîlok û istiran  
heta li ser şivan û gavana ji hatine çekirin û gotin,  
heta şivan u gavan ji, hejane, ko dila bigrin û evîndarî  
ne tenê ji beg û axa û dewlemenda re ye.

Bere xorten me zanibin, ko evîndarî, Sosyalîstî  
ye, para herkesî têde heye; bejinbilind û bejinkurt,  
gewr û boz, esmer û çerdtûz hemî di vê babetê de  
yekso ne, weke tîna laş û tava rojê û ava baranê ji  
herkesî re ne.

Gavanê delal dibêjî, ko "serê malê nanekî nedin,  
û keçik ji ramisanâ nedin min, ez naçim ber garana  
gund." Nan dayîn tişteki raste û hemî gavan nanê  
xwe distênin. Lê min bi carek nedîtiye, ko gavan  
doza ramisanê keçîka ji bikî!

Tenê gavanê me jî carna kiriye garana ga û golika  
û carna jî kiriye garana ga û kera.. Lê ev tev ji bo  
kêşan û helbestê hatine û di gelek ristan de wilo ha-  
tiye.

Kêşa wê sivik û dîlan sivik li ber dibî, wekî dî  
tişkekî pir xweş têde nehatiye. Ev jî di paleyê de tê  
gotin û koçer jî di ber dîlanê re dibêjin û carna fe-  
qeh jî di Bêlote de dibêjin.

\*\*\*

## YAR YAR Lİ MİN QUDRETÊ

Yar yar li min, yar li min  
Yar yar li min Qudretê!  
Topa Xwedê lê ketê  
Yar yar li min, yar li min  
Yar yar li min Qudretê!  
Keç dixwêni Tebetê  
Yar yar li min, yar li min  
Yar yar li min Qudretê!  
Ji bo xatirê umetê  
Yar yar li min, yar li min  
Yar yar li min Qudretê!  
Ramûsim te hurmetê  
Yar yar li min, yar li min  
Yar yar li min Qudretê!

Di vir de, "tebbet, ummet, hurmet, qudret" bi  
carek jî zimanê Erebî hatine nav zimanê me û belki  
tev ji bo dawî û lihevhatin anîbin vir.

Lê, dîlok xweş û sivik hatiye danîn û "topa Xwe-  
dê lê ketê" nifireke navdar û bi denge, ko Kurd di-  
bêjin. Herwekû tê xuyakirin, ko dosta wî "Qudreta"  
wî quranê dixwêni û hêj zaroke. Lê çawa vê zarokê  
dil girtiye, bîra dila biriye, nizanim?

Lê dibêjin: "Keçik zû dila digrin û çavê xwe zû  
vedikin." Herwekû gelek diriste, lêwik ew hînî dil-  
girtinê kiribî. Çawa ko keçikên xwendewar bêtir ji  
jîn û evînê hezdkin û bêtir agirê dile wan gur dibî,  
zû hişyar dibin.

Heta hina gotiye, ko keçika (9) nehsalî diriste ko mér biki û dibêjin: "Ayşe, (jina Muhemed peyxember) neh salî mér kiriye."

Ca, bê gomane ko Qudreta helbesvanê me ji neh salî bêtir bû, ko çuye ber xoce û quran xwendiyê. Ji lewra, ko dil girtiye. Gazin ji herduwan jî, nabin. Eger peyxemberê me yeke neh salî ji xwe re anî bî! Wey pîroz bin ji hevre! Amîn, amîn!

\*\*\*

## Perçê Duwem: BERDAN

### BERDAN

Berdan, ew dîlokin, ko Kurd di ber dankutê re dibêjin. Dema savara dikutin, mér hin dîlokan dibêjin û em ji wan re dibêjin, Berdan.

Çawa, ko dema jin savare xwe dihêrin, di ber ve hin dîlokan dibêjin, ko em ji wan re dibêjin, Berdestari.

Herwekû ev dîlok gelek caran di hin cihêن dî de jî, têne gotin. Lê, ne herdem û her car têne gotin. Lê ji ber ko, herdem di ber dana re têne gotin, me ev nav ji wan re daniye. Weharenge "Berdastarı" jî wilone.

Herwekû ev Berdan, li ser yek kêşanê têne gotin, lê tenê dawî têne guhertin carna sivik carna jî giran dibêjin.

Dankut ji van dîlokan gelekan dibêjin. Lê ev ên, ko min nîvisîne tenê hatine bîra min û min hew kari-bû ji devê wan bistênim. Ji ber ko, dankut nemane û çax û demen min jî, nahêlin, ko ez bigerim û bibi-hizim û binivîsim.

Ü naçare ew dîlokên, ko di bîra min de mabûn, min di vir de nîvisîn û ev çend dîlokên, ko min di vir de nîvisîne, tev di bîra min de ne û min ji ber-kirine. Berî sîh-çil salî ko hêj ez melayê gundê Has-dajorî bûm, çend caran min ev dîlok nîvisîn û ji devê Dankut û Destarhêriya girt, lê çend caran jî hatine windakirin, yan jî ji min hatin dizîn û sitandin.

Lê niha ez van dîlokan, ko bes di bîra min de  
mane, dinivîsim, bi hindiki qenebi bere ev jî winda  
nebin.

\*\*\*

## BEJNA ZÎRAV

Bejna zirav şiva zêro  
Poz bi qulê xizêm têro  
Ez xebitîm, tu xebitî  
Lê lê Gewrê! ma ji xelkê ro.

Çi hewrekî reş û tarî  
Berf û baran jê dibarî  
Ya ko hate serê min û  
Xelka delal nehat serê  
Wî Eyûbê kurma xwarî.

Çi hewrekî li ser Mêrdinê  
Ya ko hate serê min û  
Xelka delal nehat serê  
Serê Mem û Zînê.

Çi keçika çarde salî  
Hewşa bavê xwe dimalî  
Keçik çûye hewş ma xalî

Hezro bişewitî qesebe ye  
Sed û sî mal jê file ye  
Meymo gewre dest maneye.

Erê wele, hime û yela  
Hêw-ha.....

Hezro bişewitî bi kanya zuxur  
Min av vexwari, bi koda çerxê  
Bi tasa sifir  
Meymo gewre çibkim şuxul.

Erê wele, hime û yela  
Hêw-ha.....

Devê deryê mér bihirî  
Küçik çûnê, nego wirî  
Gava çavê mi-l çava ket  
Xwîn li canê min tewirî.

Erê wele, hime û yela  
Hêw-ha, him-ha.....

### Dî vir de kêşan hate guhartin:

Golik çûne ziyane  
Keçik vêre bezyane  
Xortino wernê talane  
Erê wela, hime û yela

Lê lê dînê, keça dînê  
Kiras sorê pêşmal şînê  
Haydê-m hevdî birevinin  
Xwe bavêjin dor Mêrdînê.  
Erê wela, hime û yela

Lê lê tolê, keça tolê  
Pêşmal şînê gol bi golê  
Xortê xelkê te dîn kirin  
Te har kirin berdan çolê.  
Erê wela, hime û yela

Lo Xwedêwo, xweş Xwedêwo  
Av di konê me bize wo  
Keça malê rabe pê wo  
Çi bejnika zirav lê wo  
Çi xeftanê şamî lê wo  
Her alîkî cêbek tê wo  
Her cêbekê sêvek tê wo  
Kes nizanî rizqê kê wo.  
Erê wela, hime û yela

Min çi got û tu xeyidi  
Ava gola li me cemidi

Geyayê çola li me seridi  
Çi aybika te-l dor min dî  
Dev ji min berda, yeke xwe dî.  
Erê wela, hime û yela

Min gewrê dîbû li kaniya cila  
Teşt û beros li ser mila  
Haydê-m hevdî birevînin  
Xwe bavêjin nava mila  
Xwe bavêjin gundê fila.

Erê wela, hime û yela

Min gewrê dîbû li ser kaniyê  
Zêra zer kir li aniyê  
Reşo lawo! her pêsiyê  
Jê bistîne méraniyê  
Ji bo xatrê cîraniyê  
Erê wela, hime û yela  
Hêha, himha!.....

Min gewrê dîbû li ber qûbê  
Ser bi zêrê kum bi ribê  
Were rûnin heta sibê  
Min ci got û wê go libê.  
Erê wela, hime û yela  
Hêha, himha!.....

Herê wayê, herê wayê  
Qeda bikevi li xwedyê kayê  
Ji wi were bihar nayê  
Dosta xwe da bi selika kayê.

Herê wayê, herê wayê  
Şex û mele çûn zekayê  
Berf û baran bevre dayê  
Xwedo-Rebî, yek ji wa nayê

Himew hayê, herê wayê  
Dikim nakim dan dernayê

Qeda bikevî vê dinyayê  
Kes di hana kesî naye  
Heçî naye, bigri tayê.

Ta xerabe jê ranabe  
Îşev bigri  
Sibe bimri  
Jin û mère  
Mal ji te re  
Bibe û here  
Tu li ci digere  
Ma ti kere?

Erê wela, hime û yela  
Hêha, himha.....

Li vir germ dibin û bi hêrz û tîn dibêjin û giran  
mêkutên xwe radikin û xwe li ber veditelenin.

Lê gereke em bidin zanîn, ko her beytek ji van  
dîlokan ducar dibî û li hev vedigerênin; carek Eh-  
med dibêjî û carek Reşo lê vedigerêni. Herwekû Eh-  
mo dibêjî: "Io xwedêwo" û Reşo ji lê vedigerêni û  
dibêjî: "Io xwedêwo". Ev nifş pire lê nikarim tevan  
di vir de bibêjim.

\*\*\*

## BERDESTARÍ

Ew kî bû-l ser erzêlê, li ser erzêlê lê  
Ne-m go wê bê, te-dgo, na  
Xesro bû li ser erzêlê, li ser erzêlê lê  
Ne-m go wê bê, te-dgo, na

Perekê hûr dijmêrê, hûr dijmêrê lê  
Ne-m go wê bê, te-dgo, na  
Qelenê serbizerê, kofî kêlê, bisk bi têlê lê  
Ne-m go wê bê, te-dgo, na.

Herweha navê xorten gund teva dibêjin û tev ji  
hatine keçikê bixwazin, perekê hûr dijmêrin û li ser  
Erzelê rûdinin.

Xuyaye havîne û bişev lawik tê li ser erzêla mala  
bavê wê rûniştiye û perên hûr ji bavê wê re dijmêri..

Ev dîlok gelek xweş û bilind hatiye û li ser vê  
kêşanê hêj dîlokêñ dî min nedîne.

Li ser Erzêlê, li ser Erzêlê, li ser Erzêlê lê  
Perekê hûr dijmêrê, hûr dijmêrê, hûr dijmêrê lê  
Qelenkê serbize, kofî kêlê, bisk bi têlê lê  
Ne min go wê bê, te digo, na.

Oh... Çiqas xweş hatiye! Daxwaz, kêşan, dawî  
tevde xweş û bilind hatine, daxwaz di virde xwestî  
na keçikê ye û kêşan (7) heft kart û tevgerin û sê  
caran li pey hev wê karta (4) çar tevger dibêjî,  
weke: "ser erzelê, ser erzelê, ser erzelê/ kofî têlê,  
ser bi zêrê, bisk bi têlê..."

Ji pesnên bilind û giranbiha ne û di virde des-  
tarê xwe sivik digerênin.

\*\*\*

## BARAN BEGO! DİBARİ

Pezê kê û kê li wî diyarı  
Baran bego! dibarî  
Pezê Şero li wî diyarı  
Baran bego! dibarî.

Ew kî bû çû bêrîyê  
Baran bego! dibarî  
Gewrê bû çû bêrîyê  
Baran bego! dibarî  
Zêr ketin ser enîyê  
Baran bego! dibarî  
Potîn kete herîyê  
Baran bego! dibarî  
Ew kî bû çû pêsiyê  
Baran bego! dibarî  
Ferhad bû çû pêsiyê  
Baran bego! dibarî.

Herweha bi vî rengî keçikêñ gund tevan dişenin bêriyê û pütinê teva dikevin heriyê û xorêt gund yeka yeka dişenin pêşîyê..

Rewş û pergala dîrokê xweş hatine, weke: "Baran bariî, potîn" çawa lawik diçi pêşîyê.

Herweku té zanîn, ko pezê mala beg-mîre û zerîyên malê çûne bêriyê û potîna dotmama lêwik-pismam ketiye heriyê û nikarî kunê şîr bigihêni mal û naçare pismam bi dotmamê ve çûye û ji ber ve kun hilgirtiye û hatine malê. Lê nizanim pismêm, ramisanek ji xwe re ji dotmamê sitendiye yan na? Hema xwedê bikî rênberiya wî bertelef, badihewa neçûbi?

\*\*\*

## Perçê Sêyem: B E R D E S T A R I

### DESTAR GERÎYA

Destar geriya li dora bajêre  
Ser sîngê kê û kê madena zêre  
Ser sîngê gewrê xurmîna zêro  
Pismam sekinye nabî ji xelkê re.

Navê keçikêñ gund tevan tênin û li ser sînga tevan dikin madena zér û dibêjin: "Pismam sekinye", nabî ko didin xelkê, bidin yek dî û bi vî awayî keçikêñ gund tevan bêmîr dihêlin.

Ji ber, ko di qanûn û destûra kurdêñ kevnare de heta ko pismam hebî, nikarin dotmama wî bidin yekî dî û gelek caran kuştin li ser vê yekê çêbûye û di-vabû, ko pismam ji rê, riya dotmamê derkevî heta ko karibin wê bidin yekî dî.

Lê di iro de, ev destûr bere bere radibî, jin ji vê bextreşîyê tene parastin û hinek serbest dibin û hêvidarim, ko di çaxekî nêzîk de bi carek ev kevnedestûr ji welatê me derkevin û hew vegezin û jin bi carek serbest bibin.

\*\*\*

## DE HÜRİK HÜRİK

De hûrik hûrik, hûrik devîya,  
Çemê Leylanê girtî herîya  
Hero heware, hero gazîya  
Pêşya hewarê kî bû bezîya  
Pêşya hewarê Xurşîd bezîya  
Şûrî bi deste, eba li pîya.

Di virde, Xurşîd, navê kurekî min bû, ko li gun-de Hasdajor çêbû û li wî gündî serê xwe danî û piştî wî Cemşîd çêbû û wî jî serê xwe li Hasdajorê danî. Dema min ev dîlok ji devê destarhêriyan distand û dinivîsin, keçika navê Xurşîd peşî digotin û naçare min jî ev nav xiste nav dîlokê û nivisi.

Herweha xorten Gund tevan dişenin heware û şûr û eba li milen wan dikin û didin desten wan û wan dixin peşîya heware.

Ev nifş gelek xwêş hatiye danîn û mirov dikari di ber dîlanê re jî bibêjî; hetta jî hin ristan jî xweştir hatine û min jî sala (27) bîst û hefta de ev berdestari nivisiye.

\*\*\*

## DE BİHÊR, BİHÊR

Debihêr, bîhêr dayikê  
Te ci-j min e, xwayikê  
Ezê te bidim nûşokê  
Nûşoka min û kê ye  
Nûşoka te û Xurşîd e.

Xurşîd didim ber avê  
Lê bireşînim gulavê  
Birakê mine mi navê.

Herweha xorten Gund bi carek tênen û keçik wan didî ber avê û gulavê li wan direşenî û dibêjî: "Birakê mine min navê".

Lê çawa digihê dostê wê, wî xortê, ko jê hez dikî wilo nabêjî û hew dengê xwe dikî.

Nuşok, şokirine, mérkirine, ji farisi hatiye û li nav Soran tê gotin: "Gewrê şokirdiye, kirdiwe, yanî mér kiriye. Lé Nuşo, xuyaye cara pêşîne, ko mér diki.

Ev rista ha ji gelek xwes hatiye, ko keçikên gund tevan didin şokirin û xorten gund tevan dikan zava, lê keçik yekî ji, ji dostê xwe pêve naxwazî û tişte pir heja eve, ko çawa digihê ser navê dostê wê, keçik dengê xwe nakî û ev nedeykirin nişana erékirinêye. Xwayîk- xuşk- xwehe, herwekû Amudiya carna digotin: Hakê!, bi daxwaza xwakê ye, dibî ko ji bo şiranî bi.

\*\*\*

## EBA-GEWRO

Ew kî li hewşê sekinî Eba-gewro!  
Reşo li hewşê sekinî, Eba-gewro!  
Eba, li pîka mekinî, Eba-gewro!  
Welet pismamê minî Eba-gewro

Careke dî xorten gund bi carek li hewşê diseke-nin û eba gewr li piyên wan di mekinênen û bangî pismamê xwe dikan.

Lê di virde gelek gotinê Erebi hatine gotin, we-ke: "hewş", "sekinî", "eba", "mekinî". Lê pirê folklorêن kurdî paqij ú sade hatine gotin û kêm gotinê bêgane têde peyda dibin.

Mirov dikarî li ber dilanê re ji bibêjî.

\*\*\*

## GİRTİKÊ HEBSA

Wele nadim, bile nadim  
Girtikê hebsa bernadim  
Ezê bînim, ezê bînim  
Şivan axa ezê bînim  
Girtikê xwe ji te bistînim.

Wele nadim, bile nadim  
Girtikê hebsa bernadim

Ezê bînim, ezê bînim  
Ezê Hemo axa bi xwe re bînim  
Koma eşirê pê re bînim  
Girtikê xwe-j te bistînim.

Wele nadim, bile nadim  
Girtikê hebsa bernadim  
Ezê bînim, ezê bînim  
Şemû axa bi xwe re bînim  
Koma eşirê bi biberxînim  
Girtikê xwe-j te bistînim.

Herweha axayên hindamê bi carek têni û eşîrên hindamê tevan bi axa ve têni, ko karibî girtikê xwe ji zindanê derxîni. Lê hembera vê girtikê wê bernadî û di zindana evîndarî de dihêlî. Lê çawa dostê wê têni dîlekê hevalê wê dibêjî:

Wele raye, bile raye,  
Min girtikê te j-ter berdaye.

Di virde ji këşan û rewş û pergâl gelek xweş hâtine. Keçik, dost û destgirtiyê xwe bi van beg û paşa û şex û axa û êl û eşîran tevan nadî û ji tevan mezintir û bi rûmettir dibêni, ko girtikê hevala xwe ji bo xatirê çavê wî berdidi.

Pir diriste, ev reng di zimanê bêgane de peyda nebin. Ca eger lawikê wê pê agah bibî wê çiqas serê wî mezin û bilind bibî û xwe payedar bibêni, ko dosta wî ewqas jê hez dikî û di çavê wê de wilo mezin û payedare.

\*\*\*

## XANIMOKÊ

Min xew tê, ha min xew tê  
Xanimokê xewarê.  
Xewa te l-mala kê tê  
Xanimokê xewarê.  
  
Xewam li mala Remo tê  
Xanimokê xewarê

Serê xwe deyn ser çokê  
Xanimokê xewarê.

Di virde jî xewa wê li mala gundiya tevan tê û hevala wê serê wê datêni ser çoka xortê male, lê herwekû tê bîra min tiştekî dî jî dibêjin: "heta .... bê ji derde", yan jî dibêjin:

Ew kî bû hat ji derde  
Xanimokê xewarê  
Reşo hatî ji derde  
Xanimokê xewarê  
Kurd bû bi turkî xeber da  
Xanimokê xewarê.

Di virde "Xanim", "xewar", li pey hev anîne, xewa wê li mala kê tê û çiqas xwe delalî dikî, ko serê xwe datêni ser çoka xortê male. Pir rast û xweş goitiye, ko dibêjî: "Kurd bû bi turkî xeberda". Çiqas kemasi dibe, ko Kurdek bi turkî bipeyivî! Û careke dî li male gundiya tevan radikevi û gundiya tevan mirov û dostê xwe dibêni, ko karibî li male wan rakevi.

Herwekû di virde Sosyalîzm tê ber çavê mirov, ko li vê rewşê meyze bikî, çawa gundi rûmeta hev digirtin? Le weke, ko Markis dibêjî: "Ev wekheviya destpêkê, jîndariya koçerî tê xuyakirin, ko di wê çaxê de, axa, xwe ji gavan mezintir nedidît, tev di xér û û şerên hev de bûn, bi hev re digeriyan, datanîn û bi hev re bar dikirin; kesî nikaribû zordes-tiyê li yekî ji êlê bikî û qad bi carek ji teva re bû, bexwedi bû, tevayî bû û tevan pez û sewalén xwe lê dicêrandin û têra tevan dikir. Weke ba û av bû".

Ev rist didî zanîn, ko di wan çaxan de çêbûye û heta iro jî, yanî çaxê ko min ev nivîsîne berî pêncî salî ev helbesta kevnare maye. Û bere dijminê gelê Kurd û dosten me jî zanibin ko em ne Tirk, Ereb û Farisin.

\*\*\*

## HEYLA DELALE

Heyla delalê, weyla hevalê

Ez û delalê çûne qırşika  
Wê-l me derketin siwarê şimika  
Wê-j me bistênin delalê cotê memika

Heyla hevalê

Weyla delalê

Ez û delalê çûne piştîya  
Wê-l me derketin siwarê romîya  
Wê-j me bistênin hel û morîya

Heyla hevalê

Weyla delalê

Ez û delalê çûne çolê wo  
Wê-l me derketin siwarê romê wo  
Wê-j me bistênin qeza piştê wo

Heyla hevalê

Weyla delalê

Ez û delalê çûne sergîna  
Wê-l me derketin siwarê Badîna  
Wê-j me bistênin cotê potîna

Heyla hey lêlê

Heyla hevalê

Weyla wey lêlê

Weyla delalê

Di virde, naxwazin jin tenê herin çolê, yan kare-kî bikin. Ji ber ko, ditirsin siwarêni dijmîna li wan rast bêñ û wan tazî bikin, yan birevênin! Wê çaxê ji êlê re gelek kemasî û şermikarı ye.

Herwekû çend ristêñ dijî di vê meydane de hene, ko tenê navê wan dizanim, weke:

1- Narînê, narîn canê.

2-Malê me li ebre.

3- Lolo pismamo.  
Çend gotin ji lolo pismamo:

Lolo pismamo, lazim bi lazim,  
Sê tiştên giran ej te dixwazim:  
Kember û bazin, cotek berbazin.

Lê gereke ez li van bikolim, ko karibim bixim destê  
xwe, binivîsim.

\*\*\*

## Perçê Çarem: BERBÜKİ

Rojên, ko bûkê diguhêzin, hin dîlokan dibêjin û car na li ser zava jî têne gotin.

### BERBÜKİ

Xanîyê bavê bûkê korte  
Li ser xêni morte morte  
Bûkê megrî! zava xorte

Bavê bûkê gurê nêro  
Li ser xêni bê didêro  
Bûk hêjaye türek zêro

Xwakê bûkê hatin teyo  
Bike kar û bara xweyo  
Zava xorte bi dilê teyo

Bûkê delale! rabe xwe karke  
Sûşa gulavê bi ser xwe dake  
Zava ciwane xortekî pake

---

Zava zava, kekê mino zava  
Min bazara bedlê te kir  
Kekê mino zava  
Mi-j bîr kir û te-j bîr nekir  
Birakê mino zava.

Cûme Şam û Diyarbekir  
Kekê mino zava  
Min bazara sola te kir  
Birakê mino zava  
Min ji bîr kir boyax nekir  
Kekê mino zava.

---

Terqînek ji çiyê tê  
Îşev ewro  
Dengê bûk û zavê tê  
Îşev ewro

Herwekü ji van bêtir hene, lê min nikaribû biguhêzim û ne bihîstîme. Çawa, ko ev perçê xwe de jî di nav folklorêñ me de hindikin û min pirêñ wan nedîtine.

\*\*\*

Pêşgotina Vê Nivişte

Stran: Bê kêşane lê tenê bi dawîye. Herwekû hin peyvên wê direj, hin jî pir kinin. Ji lewra gelek caran dengbêj van kurtebeytan naçare hê hê yan lo lo û lê lê bi serve cem xwe datînin. Lê divê mirov jibîr nekî ko di van stranan de hin gotin û daxwaziyênil bilind û peyvên cuwan û giranbiha têne dîtin û gotin ko ristevan jî nikarin di nav ristên xwe de wilo bêjin. Ji lewra hin xorten nûhatî dixwazin riste jî weke stranê serbest bikin û guh nedîn kês û dawîyê. Di awira min de ev jî ji ber çend tiştane: 1- ev e ko bi xwe ne ristevan in, nikarin ristê bi kêşan û dawî çê bikin. 2- Yek ev e ko baş bi zimanê kurdî nizanin. 3- Ü yek ev e ko kurdî baş nexwendine. 4- Ü yek ev e ko gelek dilbijok e ristevanî ye, lê nikare ristê baş çêke.

Tenê tiştek heye ko nayê veşartin ko evreng ristê klasîkî-kurdî wê rojekî ji welatê me jî winda bibin. Lê kengê welatê me bikevî qonaxa dezgevanî û abora welet berpêş herî ko heta serxweş karibin van ristên bêkêşan û dawî bibêjin. Lê di iro de ev ristên klasîkî bi müsiqe ji gelê Kurd re bêtir bi kér ve têن, ji ber ko Kurd û hemî miletên paşdamayı bêtir ji müsiqe hiz dikin.

Stockholm 1982.

BAZO QURBA!

Bazo qurba! li ser xanîya li çi dinêrî?  
Dawa taqîkê sîpî dikî herî!  
Wele zanim tu li kuştina min û xwe digerî

Bazo qurba! li ser xaniya tu meş meke  
Diwê çigarê bi ser simbêlên xwe de tu ges meke  
Dilê tog û tewagê gundê min rebenê bimi xwes meke  
De were bazî, were bazî, were bazî, were bazî  
Tu feqîrî, tu rebenî, tu bê malî, belengazî  
Qelenê te nîne, tu nikarî min bixwazî  
Ezê muhbata apê bavêjime ser birazî.

De were bazî, were bazî, tu bazîyê xelkê  
Bejna te zirave bazî heyra, ji dara belkê  
Minê soza mezin li ber destê Xwedê daye  
Heta li darê dinyayê saxim nadim terkê.

Di virde, keçika Kurdî delalê ber dilê xwe weke  
bazekî neçîrvan, perbelek, çeleng û gernas ditiye û  
navê wî kiriye Bazî.

Rastê, li ber dilê wê kesî dî weke lawikê wê di  
nava gund û êlê de, belki di cihanê de peyda nabi û  
li ber dilê wê gelek gernas û çelenge, ko di nav tirs  
û sawiran de, li qozyê xaniya û li malen pirebiya, li  
bendê reza di rojêن kakişîn û destarherîyan de;  
weke bazekî çeleng êrişî ser kevokê dikî û bi dare  
zorê talanê mîrê cîna dibî û êrişî nav bax û bostanê  
keleşgewra xwe dikî û cotê memikan, dêmê gulî,  
lêvîn şekerî, çena gewherî, enîya mîkewî; boxaza  
qirikê, xala gerdenê talan û berbad dikî û bi carek  
kuştin û mirin nakevin bîra wî, ji kesî paxavê nakî;  
bav û bira û pismam û mirovên wê weke kelmêşan li  
ber çavêن xwe dibêni. Di çavêن wê de paşa, beg,  
axa ne hêjane müyekî ji sinbelên palikkirî, ko  
dikevin boxaza gerdenê.

Hin dibêjin, "bazî", û hin ji dibêjin, "bazo".  
Herdû ji diristin. Wek ko te xuyakirin, ev stran li  
hindama Mardin çebûye û gelek navdar û bi denge,  
keçik, jin pir dibêjin.

\*\*\*

## BAVÊ SEYRO

Bavê Seyro qurba! çîma tu deynakî?  
Her çar malê Alûca li qûna diyêr deman nakî?

Sîng û berê min keçikê weke bexçê zinara Mêrdînê  
Ji xwe ra tapo nakî.

Yadê! navbera min û bavê Seyranê  
Xwes dîware  
Ezê rabim pehînkê lêxim bere  
Ji jorde bêyî xware  
Heke dê û bavê min keçikê gotin:  
Lawo ci bû ci qewimî?  
Ezê bêjim: Yabo! Yadê! bû girêna destare.

Yadê rebenê! min bavê Seyranê dîbû li wî milî  
Xwezi sê biskên dişê biketa ber  
Sinbelêñ bavê Seyro, reşe palikkirî  
Min sond xwariye terka bavê Seyranê tu car nakim  
Heta teresê Çoxreşa li min û  
bavê Seyranê nekin gili.

"Bavê Seyro", "Bavê Eli", "Huseynê Axê" Kurê Sadûnê Mihemed Cizîrî ye, ko ji axayê Omeriya bû. Dibêjin, bi ciwanî û rindiya xwe bi nav û deng bû, li gundê Terê rûdinişt û çend salan bûye serkare hindama Omeriya. Yazde kurên wî hebûn, ko navê mezinê wan Eli bû û Seyro-Seyran, navê keça wî bû.

Çawa, ko ev keçika ko li ser bavê Eli ev stiran gotiye, ji gundê Alûca ye, ko gundekî Omeriya ye.

Jîndariya Huseyn axa ji me ve ne xuyaye, lê weke ko tê xuyakirin, di sedê (19.) nozdeha de ye? Ji ber, ko heta niha ji, hê hin ji zarokên wî saxin.

Mala Mihemed Cizîrî, axa û mezinên Omeriya ne, lê bûne du perçe: Mala Mele Mistefa bûne mezinên Mehmûdkiya û mala Mihemed Cizîrî ên mayîn, bûne mezinên Etmankiya û ji bo mezinahîya xwe, gernasê Omeriyan bi hev didane kuştin.

Lê di iro de, ev reng berberî û kuştin bere bere winda dîbin û hêvidârim, ko di çaxekî nêzik de navê eşîrtî ji nav Kurdistanê winda bibî.

Tarîxa vê malbatê ji di nav rûpelên tarîxa min de hatiye nivîsandin, ko hêj ne çapkiriye.

\*\*\*

## BAVÊ BEHCET

Lolo bavê Behcet, navê min keçikê  
Xêrya, Xêrya Hecî.

Bejna min zirave, qutikê min  
çoxê sorê dor bi xercî  
Îsal heft sal min û bavê Behcet  
dil girtîye, kalê bavê min dibeeçî.

De lolo, bavê Behcet gidyano,  
Rêka Safya xir û pane,  
Ezê bala xwe bidimê hemî şopa  
nalên di hespa ne,  
Xwezya mizgîna xérê ji mi-re bihatana  
bigota: Bavê Behcet li odeka mala bavê min mîvane.

Li mi, li mi, li mi...  
Li mi, li mi, li mi dîno!

Bavê Behcet! gidyano!  
Çığa sitêrê li ezmana li qublene  
Heçî kesê derdê dila diye  
Diaçikê min û te ne.  
Ma te ne bihîstiye, Kemal Paşa  
di qanûna Cumhûriyetê de gotiye:  
Heçî kesê dile şérîn bihebînî,  
Musteqîlê bi destê xwe ne!

De lolo bavê Behcet! rêka Safya serejêre  
Minê xulama kolosê kevej, sinbêlên di res,  
diranê zêre,  
Xwedê hebî! gava destê bavê Behcet girtin  
û berê wî dane welatê xerîbiyê,  
Destê min evdala xwedê bigrin, bişînin vêre!

Di virde mirov dikarî bêjî, ko stiran, ristêr ser-  
bestin û ji kevnare de ev reng- ristêr serbest di  
nav kurdan de hene. Lê gereke dawî weke hevbî,

ko em karibin bêjin: rista serbeste û kart û gavêñ  
ristê têde hebin!

Navê "Bavê Behcet", Şêx Fexrî ye, lê bi vî navî  
deng daye. Ji mala Şêxen Qamişlo, li nav Silivaye û  
birazyê Şêx Şemseddîne, ko di sala 1925 de li Diyar-  
bekir, digel Şêx Seid efendî hate bi darvekirin. Ça-  
wa, ko ev bavê Behcet bi heftê-heştê peyayî ve li  
Çiyayê Hevêda hatin kuştin, lê ser destê Elisamî  
beg, li Pira Govedê hatin kuştin, lê bi gernasî  
hatin kuştin.

"Dilşa" û "Nefya", herdû jinêñ wî bûn. Dengbê-  
jan li ser zimanê wan herdû jinan istiranek li ser  
kuştina Bavê Behcet çêkirine, ko gelek xweş û dil-  
şewat hatiye.

Bi rasti, Bavê Behcet, rindî û ciwanî ji kesî re  
ne hiştibû û hêjaye, ko "Xêrya Haci" ev istirana han  
li ser gotiye. Xêriya Xanim agirê evîna dilê xwe  
berdaye dilê guhdar, dilgir û dilbikula û derd û  
nexweşîya dilê xwe ji dektorê tarixê re daye xuya-  
kirin. Lê, kî li derdê me dilgir û evîdar û rebena  
dipirsi.

Serpêhatîyen evîndarêñ reben û dilbikul û cîger-  
sotayı dîbin istiran, çîrok û di civata de dengbêj,  
çîrokvan dilê xelkê, civatê pê xweş dikin. Lê dawi,  
di nav dilê tarixê de winda dîbin û diciñ.

Lê gereke ji iro pêve, zana û xwendevan, bîre-  
wer û rezanê Kurd van serpêhatîyan di nav rûpelên  
nivişt û nivîsarêñ xwe de bidin xuyakirin û binivîsin  
û ji pêlén windabûn û destêñ dijminan biparezin.  
Bav û kalêñ me gelek kêmâsi kirine, lê bere em wan  
kêmâsi û çewtiyan nekin. Eger nikaribin bi kiraskî  
torevanî ji binivîsin, lê bere tenê winda nebin.

Ev Bavê Behcet, min bixwe dîbû. Xortekî gelek  
ciwan û berbiçav bû. Herkesi xwezî dikir, ko lê te-  
maşa bikin. Lê dijminê miletê Kurd gelek xorten de-  
lal û ciwan û şerîn û gelek ciwanikêñ xemrevîn xis-  
tine bin axa sar..

\*\*\*

## BAVÊ FEXRİYA

Bavê Fexriya qurba!  
Dora kaniyê dora mine..  
Bavê Fexro li gêjo siware,  
Diki nakî gêjo di binde nasekine  
Weyla li min, min porkurê!  
Çavê bavê Fexriya li hêvîya tasek  
ava destê mine! Xwedê wo!

Bavê Fexriya qurba!  
Ji inê heta inê,  
Iro sê ro bavê Fexro birîndare  
di nivînê, wey li minê!  
Ezê rabim daw û delingê xwe hilgêvîm  
herim Hadhaka xopan, mala Erakêlê hekîm  
Ezê bêjim: Erakêlo! qurba! sîng û berê  
min keçikê bike melhema devê vê birînê!

De lolo bavê Fexriya qurba!  
Min dî çiya bankir çiya,  
Siya zinara xwe berdabû  
ser geliya  
Ez û bavê Fexriya daketin  
Berîya Amûda xopan her çar  
gundêñ Ezîdiya,  
Avê bîra genî bûne ji kuliya  
Li serê min û bavê Fexro rabû  
toz û ecaca van kerîya,  
Iro sê ro torinê mala Ezo  
nexweşe ketye nava ciya,  
Ezê li ber serê bavê Fexro  
baweşînê bikim bi epriya û temezîya,  
Bavê Fexro ji min dixwaze tasek ava

cemidî, ji kaniya çiya, li minê!...

De bavê Fexriya qurba!

Îşev ewre nabe sayî

Li bavê Fexro derketine taqîbatê

Tabûra Sîrtê û sê alahî

Tu rabe destê mi bigre, emê hevdî birevînin

Xwe bavêjine binya xeta Firinsawî

Bikevine ber tan û niçen erebên reşê daw berdayî

Navê bavê Fexriya, Sebri ye. Sebri, kûrê Hacı Mihemedê, ji mala Felîte Quto, Reşkotî ye. Ji koçerên Elika ne. Di sala 1927 de hatibûn binya xeta sînor û ketibûn Cizîrê; li gundê Kerengo, binya Amûdê rûniştibûn û di şerê Batmanâ de tevlî eşîra Belekan gernasiyeke mezin kirin, ko sê alahî ji leşkerê dijmin windakirin û di wê çaxê de, Eminê Ehmed bi leşkerê dijmin re çûbû ser Reşkota û bihêla lingê hespê xwe reviye.

Lê navê keçikê nehatiye zanîn û di nav istirana xwe de ne gotiye. Lê navê hespê Sebri, Gêjo anîye, ko di bin de ranewestaye. Keçika kurmanc daye zanîn, ko li ser ava kaniye hevdî naskirine û dile wan bi nérîna pêşî re ketiye hev. Bavê Fexro, dixwazî bi mehna avê keçikê bibenî.

Ü di benda duwem de didî zanîn, ko axa birîndar bûye û Erakêlê Ermenî, ew derman dikir û çiqas xwes gotiye, ko dibejî:

"Sîng û berê min keçikê,

Bike melhema devê vê birînê!"

û pir xwes kiriye, ko dibejî: "Min dî çiya bankir çiya / Siya zinara xwe berda ser gelîya", keçika Reşkotî çê bala xwe daye xo û rindî û ciwanî û xweşîkahîya çiya û dar û bera, ko wilo hatiye bîra wê, siya zinara danê êvara xwe berdidi ser gelîya û pesnê nexweşîya Berîya Mêrdinê didî û dibejî: "Avê bîra genî bune ji kuliya". Ev gelek raste, lê niha ne wiyo. Bi rastî di wê çaxê de wilo bû; av genî dibû û dexl dihate xwarin û ecac (toz) bi ser serê mirovan diket. Ji ber, ko ev deşta Cizîrê hêj ava nebûbû û kerîyên pezên Kurdan, ecac bi ser de

bilind dikirin û kuli weke axê dihat û her tişt dixwar, li ser hev siwar dibûn û bîrên avê tije kuli dibûn û carna jî, genî dibûn.

Lê çawa, ev çiyayêñ ker û gej dengê xwe li hev dikin. Lê tê xuyakirin, ko serê top û tiving û hûr-avêjan gelî dagirtibûn û dengê çiya li hev vedigeriyan heta, ko nema karibûn xwe di nav ciyan de bigrin. Ji lewra, naçare xwe avêtine berîya Amûda xopan, her çar gundêñ Ezidîya û ketine bin tan û niçen Erebêñ dawberdayî (ji kurmanca re dibêjî).

Lê Kurden Kurdistanâ bindestê Turkan, ji Kurden Cizîre re dibêjin, "ereboşk", "dawberdayî", "serbiqetik..." Ji ber, ko kincêñ Erebî li xwe dikin, wilo ji wan re dibêjin. Û herwekû dibêjî: "Sê alahi leşkerêñ dijmin derketibûn taqîbata Bavê Fexriya", erişiñ Erebân diki û dibêjî: "Emê bikevin ber tan û niçen Erebêñ reşê qûle, pîsê dawberdayî..."

Di virde, dijminahîya miletê Kurd ji miletêñ hawîr xwe re, ko ji wan mezintir û çetir û bêtir bi pêşve çûne, didî xuyakirin. Lê xwezî keçika kurmanc wilo negota.

\*\*\*

## HESENÊ MÛSA

Hey wax, hey wax, hey wax mala minê!  
Soz û bext û qerar neman li darê dinê  
Xwedê xerab bikî mala xwedyê dilgirtinê  
Yabo, yadê, Hesenê mala Mûsa min dixwazî  
min nadînê,

Wele bi Xwedê min didinê - min bidinê,  
min nadînê, ezê kincê xwe bişenime ser  
boyaxê reskirinê,

Ezê mara mîra piştî çavê reş û belek  
li xwe heram kim li darê dinê.

De hey wax, mala minê!

Sola torinê mala Mûsa qetya ji çûyênenê, ji hatinê  
Cilê mala bavê min qetiyan ji danînê, ji raxistinê  
Guhê dêka min qul kirin bi galgalê, bi gotinê

Heyf û xebîneta çavê reş û belek sirta golê  
ax û av ketinê.

De hey wax, hey wax....mala minê  
Mala minê, mala minê, mala minê!

Heseno qurba li me derketî cejna Remezanê  
Qîzê gundê me daketin ber govendê, ber dîlanê,  
Xortê gundê me daketin ber kêlikê, ber nişanê  
Ezê çiqa çavê xwe rebenê digerînim, nagerînim  
ezê torina mala Mûsa qe nabênim li meydanê.

De hey wax.....mala minê!  
Hey wax, mala minê!

Yadê rebenê! Hesenê mala Mûsa tenbûrvane  
Gustîla tilya torinê malê qaş-almase, karevane  
Xwedê xerab biki mala Simê Qaso, Hesenê Cafo!  
Li serê min û torinê mala Mûsa rakirne fermane.

De hey wax.....mala minê  
Hey wax, mala mine!

Min dî dawetka li Biloka xopan digerîya,  
Ez û Hesenê mala Mûsa ketin çiyayê mazî,  
nav devîya,  
Ketin kîf û henek û lîz laqirdîya  
Min dî tifingka ji sirta golê diteqîya  
Hesenê mala Mûsa bi ser mi-de wergerîya  
Simo digo: Xwekê Hedo! birîna Hesenê Mûsa  
ka li kuya?

Minê digo: Simo! Keko! korocaxo!  
Birîna Hesenê Mûsa li ebabelek li nava pîya  
De hey wax, hey wax! mala minê

Hesen kurê Mûsa ji gundê Bilokê -Çiyayê Mazî-,  
ko dikevî rojavayê bajarê Mêrdînê.

Çawa, ko navê keçikê Hedo-Hediye, keça Qaso-  
Qasime û navê birayê wê Simo-İsmaîle û pismamê wê  
Hesenê Cafo-Cafere. Mala Qaso, ji malmezin û dewle-  
mendê gund bûn. Lê Hesenê Mûsa, mirovekî biyanî  
bû, ko li gundê wan rûniştibû.

Herwekû istiran didî zanîn, destê Hesen teng bû û mala Qaso qelenekî giran dixwestin. Lê Hesen nikaribû bidî û her çendan sola xwe dijetand û cûn û hatin pir dikir jî, lê ne dê û ne bavê, guh li gotinê wî nedikirin û tevan di bin çavan re lê dinérin, naxwe ci di destê wî de ji revandin pêve maye!

Lê revandin jî, ne hêsanî ye. Kuştin û talan li pey hene. Lê reben çibkî? Tev dane ber çavên xwe û rojekê bi çeplê Hedo girt û hevdî revandin û berê xwe dane gundê Xarokê, cem mala metika xwe. Lê çawa ketin sirta golê, li hev rûniştin û ketin nav kêtî û henek û laqirdiya û hevdî hembêz kirin û taca Şehînşahî dane serê xwe û li ser textê bextewarî rûniştin. Ev kîlik, ji xwestirin û şerîntirinê gav û çax û demen herdû diligir û evîndaran bû, ko di vê kîlikê de serbest direjî nav bax û bustanê jîn û evîne û kulmiskan li hev didin û gez û maçan ji hev distênin û xwe bi ser hev de diguveşin, hev digevizênin. Kengî berî hingî dikaribûn, ko ne di bin çavan re bûna, heta li hev jî binerîn? Kengî karibûn weke wê bîstikê, serbest li hev rûnin û bi dilxweşî hev hembêz bikin?

Hedo, deng li Hesen kir û got: "Oh! de rabe besse rabe! Em herin! Ez pir ditirsim, zanim niha li me digerin.." Wilo got û ronik ji çavên reş hatin xwar û Hesen çavên wê malîştin û maç kirin û got: "Zanim ji ci ditirsî! Lê kî heye, ko pey me kevî? Hisabê sed mîri nakim..

- Na! Na, em herin çetire! Riya me dûre! Zanim, Simo wilo bela xwe ji me venakî! Wê pey me kevî.. Ya wê xwe bidî kuştin û ya me.

Lê Hesen, şerîna xwe xiste ber hembêza xwe û bi ser xwe de givaşt û maçeke bi tîn ji dêmén gulî da û got: "Îro dawet û dîlanel! Kê hay ji me heye? Kîye pey me kevî?" Her tişt di ser guhên xwe re avêtin û ketin nav şahî û xweşî, laqirdiya û hevdî dane ber gez û maçan û hev gevizandin.

Lê, Simo û Hesenê Cafo dane pey şopa wan û di vî nependî de dîtin û xwe li wan qelizênin, ko keysa xwe li Hesen bênin, ko gulekê berdinê. Hê herdû evîndar di hembêza hevde, dengê gulakê hat û He-

sen bi ser milê Hedo ve gêr bû û ji nişka ve Simê Qaso û Hesenê Cafo hatin ser laşê Hesen û ji xuşka xwe re got: "Ka birîna wî li kuye?" û Hedo jê re got: "Simo! Keko! Korocaxo! Birîna torinê mala Mûsa li ebabelek, li nava piya. Te kuştî Hesenê Mûsa, beranê pezko viya"û çawa bejna bilind bi ser milê gulüşenga xwe de hate xwar, pêlê xwînê pêşîrên bûka bextreş xemilandin û bi carek ew dile, ko di bihara jînê de bi şadî û xurtî ciwanîya xwe derbasdikir, hate rawestan; ew laşê ko di çola jîndarîyê de serbest digeriya, li deşta hebûni di nav pence mirinê de di-xwazi serguherî hev bibî û ji pingava jînê bipeqizi çolistana hebûnê û di nav damarê qadê de cihekî dî ji xwe re bistêni. Lê ji destê xwe derket û bê havil û bêtîn hate herivandin û serê xwe danî.

Dawîya dilgirtinê, revandinê tim kuştin û girî û berberî û talan bûn. Ev bû di Kurdistanê de xelata hiskirin û dilketinê. Di benda yekem de, evîndara me, dengbêja navdar Hedoxatûn, ko ev rist û qanûn di wekate me de ne rast û diristin. Risteke bê soz û qerar û bexte; berdîberdan û pêkarîn û zordestîye.

Çiqas xweş gotiye, ko dibêjî: "Sola torinê mala Mûsa qetiya ji çuyin û ji hatine.."

Çün û hatina pir, nişana şewata dile evîndare, ko nema dikarî xwe bigri û naçare hema hawir diçi û tê. Lê ki guh lê dikî? Çi xema xelkê ye? Çawa, ko nişana belengaziye ji, ji ber ko, perê wî pir nînin, ko bavê wê ci bixwazi ew didî! naçare diçi û tê, ko belki karibî diya wê, bavê wê razî bikî, ko barê wî giran nekin. Lê, kengî ev cameri ji mirovên nezan û hov û polperest tê, ko karibî keça xwe bê pere bidî yekî, ko dile keçikê ew girtiye.

Lê eger, ko Hesen térmal û pere bûna, carek-du car bes bûn; yan bixwe nedîcû mala bavê Hedo û dibû, ko çend mirovên xwe yan rîsîpiyên gund bisanda mala bavê wê û Qaso çiqas bixwesta, wê bidana û ev kuştin, dijminahî, bextreşî jê venediketin û cilê mala bavê xanima Çiyayê Mazî ne diqetian û guhê diya wê qul nedibûn. Lê Kurd dibêjin:" "Yan barek dirav, yan barek derew."

Barê diravê Hesen nebû. Ji lewra dixwest bi barê derewa kêleka xwe di avê derbas bikî û di guhê diya Hedo de digotin. Lê tim, barê derewa cihê barê pera nagirin ez benî!

"Guhê dêka min qul kirin bi galgalê, bi gotinê." Çiqas xweş gotiyê! Vê keçika nexwendî, nezan çawa karibû li ser peravê istiran û ristevanî van gewheran belav bikî, bidarvekî. "Ezê çekê xwe bişenime ser boyaxê reşkirinê", ev, nişana jina bextreşe, ko kincen xwe bi carek reş bikî û di denê dakî. "Reşkirin, reşgirêdan", di Kurdistanê de ji kevnare de hene.

Di virde "çek", di şûna "kinc" hatiye. Ji ber, ko çek ew alavên ko mér pê şer dikin; herwekû cil jî, ew tejberên ko li oda radixin û li nav malan datênin. Çawa, ko "boyax" di virde, bi daxwaza "denê", "sebxê" hatiye.

"Heyf û xebîneta çavê reşbelek ax û av ketinê!"

Herê wele, xuşka Hedo! Sed heyf û mixabin, ko av û ax bikevin çavên reş û kesk û şîn û ev laşê nazik bikevî bin axê. Lê em ci karin bikin? Ci ji destê min û te tê, Ko karibin nehêlin ax û av bikevin çavên ciwanik û cameran? Ci ji destê me tê, ko nehêlin çavên hozan û gernas û dilrevîna bikevin bin axê? Lê xuşka Hedo! Ev, riya me teva ye. Şivan û gavan, paşa û hozan, nerind û ciwan û pîr, tev de diçin bin vê axa sar û em ji wan bêdîdar û bêpar dimênin. Xwezi her kesî weke te zanibûna, ko sed heyf û mixabine, ko em weke hova xwe bixwe, hev dikuijin! Lê ci bikin, ci karin bikin? Tiştek ji destê me dernakevî. Rist û qanûnên miletên paşdemayı, ev reng qanûn û rist û destûrên çewt û vajî xistine welatê me û serê mirovên weke Simê Qaso û Hesenê Cafo, ko ji bo hezkirina we Hesenê delalê ber dilê te kuştin û seri li te gerandin.

Lê gereke tu bi cameri, wî bax û bostanê, ko Hesen çend sal pêwanî lê kiriye, ji destê dijmin û altaxa biparêzi û nehêli sira bayê sibihî lê bidi. Niha, tu perpirsyari. Tu pêwan û dergevanî. Çiqas ew xwîna sor û sosinî bê bîra te, gereke vî bexcê

gulan, ko Hesen bi xwîna xwe avdaye, bi ronikêن çavê xwe avbidi û nehêlî ziwa bibî; gereke ser bi res di kuncê reşetarı de jîna xwe ya mayî rabiwêri. Ez jî bi te re me û dixwazim bi camêri li ber xwe bîdi!

Heseno qurba li me derketî eyda Remezanê,  
Keçkê gundê me derketin ber govendê, ber dîlanê,  
Xortê gundê me derketin ber kêlikê, ber nîşanê.  
Çiqas çavê xwe rebenê digerînim, Hesenê mala  
Mûsa ez nabînim li meydanê...

Erê xuşka Hedo! Ev cejna Remezanê, ne cejna Kurde, lê bi zor ketiye gerdana me. Cejna mileteki hevsinorê me ye, ko berî (1380) hezar û sêsed û hestê salî bi gernasi êrisi welatê me kirin û tac û text û ol û pirozgehen me bi carek pelixandin û rewş û pergal û ol û cejn û sersalên xwe xistin şuna ên me.

Her çawa dibi? lê rojeke şahî, ko di wê rojê de, me welatê xwe, tac û textê xwe bi destê xelkê ve berdanê û me cilika gidiya kişandîye serê xwe û nema dikarin, nema dixwazin; li berxwe bidin, nema karîbin destê xwe bilind bikin.

Çima çavêن xwe digerêni? Ma nizanî ku delale berdilê te bi carek destê xwe ji her tiştî kişandîye û pişta xwe daye cîhana jîngarî û ji me xeyidiye û çuye.

Çima li xort û keçikan çavêن xwe digerêni? Aya dixwazi ciwaniya xwe vegerêni yan jî ciwaniya Hesen têne bîra xwe? Aya dixwazi xortekî dî di nav baxê evîna xwe de xwedî bikî?

Na! Na, xuşka Hedo! Na, na! Te soz daye, ko mara mera piştî çavê kurê Mûsa li xwe heram bikî. Ji pey soza xwe venegerî, ji te re sed qatî çêtire!

Du pêtiyên agirî di dile te de digerin: Yek dixwazi te bi carek bişewitêni, pîr û kal bikî; wî laşê ciwan ji hevde baveji, biherivêni û yek jî dixwazi, ji nuve te vejêni, xwîneke germ di nav damarêñ laşê te de biggerêni; dixwazi te ji van kul û derd û sawîr û gomanan biparezi. Lê bi ya min bikî, bi camêri ji te re çêtire.

"Hesenê mala Mûsa tenbûrvane."

Raste xuşka Hedo! Jixwe tu bi raz û awazên vê tenbûrê gihaye vê payedariyê; çawa, ko seydayê Ci-zîri dibêjî:

"Wer guhde çeng û nayê,  
Şerîn ko têñ semayê,  
Camê binose vêre,  
Çi sade û çi zêrges."

Gava ko dengê sazê tê guhê me, naçare em têne he-jandin û ger û govend û semayê dikin; cîhan tev de dûri me dibî û bi carek em di nav saz û pêjinê de dimenin. Ev çiye, ko vî laşê giran, vî mirovê paye-dar wilo bêhiş digerêni? Ev ci hêz û tîne, ko me di-gihênen vê tevger û bêhişiyê? Peyxam û îlham, eve hevala Hedo!

Belam Hesenê te bi sed mîri bî yan jî bi mîrekî bî, weke heve. Herkes di vê riya reş û tarî ve diçi û hew vedigerî, serguherî hev dibî û ez û tu jî wilo diçin û hew vedigerin.

"Hedo qurba! Min ci got û çi ciriya?"

Raste hevala Hedo! Ci tiştê, ko mirov dixwazî, bi hesanî nakekî destê mirov û kes nikarî bighe dawîya daxwazên xwe û dimrin û daxwaz pêre diçin gorista-nê, yan di nav ezmanê bêdawî de têne pişavtin û winda dibin.

Te bawer dikir, ko winê bibin xwedî mal û zarok û di nav xelkê de bi rûmet bijîn. Lê, lihevraştihatîne yan rist û destûra welatê me yê paşdamayı tiştekî dî anî devê riya we, ko heta dawî dilbikul û xemgîn bi-menî. Eve evîn û karbdestîya me di tarîxê de; ji jîn û hebûnê eve kara me. Eve jîndarı, vêdikevin û ve-dimrin; ges dibin û reş dibin; dipeqizin, diqelizin, çedibin û dimrin.

Lê Hedo, rewşa rûniştina xwe û Hesen û henek û laqirdî û kuştina Hesen û perişaniya xwe têni ber çavê me, dibêjî: "Ez û Hesen ketin kef û henek û laqirdîya/ Min dî tivingek ji sirta golê diteqîya/ û /Hesenê mala Mûsa bi ser min de wergeriya.." Û He-senê Mûsa hate kuştin û dawîya vê serpêhatîyê bi

jan û kul li vir qedîya û ez û Hedo mane li ber de-  
riya.

\*\*\*

## XERABO

Lolo xerabo!

Ji dinyayê, alemê xerabtiro  
li ber dile min evdala xwedê  
ji bav û birakê min çetiro  
ji şekirê elbika,  
ji muhibeta dê û weledîyê  
şerîntiro xerabo!  
Min evdala xwedê,  
heft sala di dawa taqîkê xwedê  
bi pars û pûsê xwedî kiro,  
sala hesta toleke reşe lêvdeqandî  
ji xwer dibiro, xerabo!

Lolo xerabo!

Malxerabo! dikim nakim tu xerabî,  
tenîya bi duhnî ji riwê min venabî,  
dikim nakim ji ber çoka min ranabî.  
Derdê dila derdkî noye ra lê nabî  
şûşa dile min şikestîye cebar nabî,  
ji min evdala xwedê re tu ezabî  
de lolo xerabo, tu xerabî!  
Malxerabo! min bihîstî te yek xwestî  
Ezê herim daweta xerabê male  
bi taqîkê sîpi, bi dile şikestî  
eger ji min çetir bî, sed pîroz bî li wî canî  
lê heke ji min pîstir bî, tu nifirê xerab  
li te nakim, bere goştê laşê te bîhelî,  
bimêni komek hestî;  
serapîra tu kor bibî, heft sala bikevî  
ber vî destî, lolo xerabo!

Lolo xerabo!

Malxerabo! ne te xwestim, ne revandim!

Te ez kirim darê tenûrê reş qelandim!

Te kirim şareke hemawî, li dora kumê xwe gerandim!

Te kirim taseke çingo, li odê maqûl û axelera  
diçingandim! lolo xerabo!

Lolo xerabo!

Malxerabo! bere li mi-bî li vî dili

Na wele, bere li mala bavê te bî, li wî aqili.

Çawa te dev ji min kihêla serê tewla berda  
û li bergileke pişturmi, qosfilitî  
li pey etara dihesili.

Kul û derdê xerabê mala min giranin,

Saxê xwe berdane ser qulpa kemberê  
ser vî dili xerab!

Min sond xwariye terka delalê mala  
bavê xwe rebenê nakim

heta bikişenin serê min rebenê  
topek cawê sérêz kiri.

Li ber serê min deynin cotek kelên  
dikevirî, xerabo!

De lolo xerabo!

Malxerabo!

Ez û xerabê malê qaskê li hafa  
mala li hev rûniştin.

Ji kul û kederê dinyayê  
meyê gili kirin, gazin bi şûnve hiştin  
berf û baranê li me dayê, hêstirê çavê  
min rebenê kevir û kuçikê binê newalan tev  
dimiştin xerabo!

Masiyê binê behra ji derdê min û xerabê  
mala min biriştin;

teyr û tilûrê serê çiya bi ser nikilên  
Xwe de dipuniştin, xerabo!

Miriyên cebana heft salî,  
qerquerê xwe li serê xwe gerandin  
û li ser tîrbê xwe rûniştin xerabo!

Xerabo, ne navê lêwike, lê keçika súrgicî hingî jê xeyidye, navê wî nabêjî û dibêjî, "Xerabo", "Ne-başo", "Neqenco", "Piso" !..

Gelek cihê axîne, ko navê herdû evîndar, gund û eşîrên wan nehatine zanîn. Lê, herwekû ji şîwe û zaravê istiranê tê xuyakirin diriste, ko ji hindama raxore Mêrdînê bin. Herwekû ev Lawik, gelek xweş hatiye danîn û gelek gotin û peyvîn payebilind têde hatine danîn.

Lê, her ji ku dibi bere bibî, tenê dengbêj û evîndara me ya kurmanc û piştperde, di meydana dilgirtin û istiranê de gava pêşî ji xwe re sitandiye û rê nedaye kesî, ko hespê xwe li vê meydanê bibezenî.

Heta iro ji, ristevan û dengbêjên rojhilat hêj tiştekî wilo hêja çenekirine û keçika kurmanc bi agirê dilê xwe hinav guhdar û dengbêj û dilgîran peritandîye û heçî kesê derdê dilê malwêran diye, giriyê wî li ser rewş û pergala keçika kurdî tê, di nav kul û kederan de dimêni. Rajorê Mêrdîn, gelek xweşe; bi av, dar, şinahîye; cihê evîndarî, dilgirtin û hevxwestinê ye.

Ca, ji lewra gazin ji keçika kurmanc nabî, ko nifira li lawikê xwe bikî; ko heft salan ew di nav sîng û berê xwe de xwedîkiriye û paşê yeke jê ne çêtir ji xwe re xwestîye û anîye, yan yeke lêvdeqandî ew ji nav destê wê derxistiye û ji xwe re bîriye!

Wey bêbext, xortê súrgicî! Çawa dev ji hevala xwe berdî û herî yeke dî bixwazî? Ma bextê dînyayê wiloye? Keçika, ko te heft sala di nav sîng û berê xwe de xwedî bikî berdî û yeke dî, ko ji wê ne çêtir, ji xwe re bêni.

"Lolo xerabo!

Ji alemê xerabtiro!"

Reben, ji şérînê ber dilê xwe re bê dilê xwe dibêjî, "Ji dinya alemê xerabtiro". Lê keçika kurmanc ne rast dibêjî, ji ber, ko di rista dawî de dibêjî: "Li ber dilê min evdala xwedê, ji bav û birakê min çêtiro! / ji muhibeta dê û welediyê, ji şekirê elbika şérîntiro!"

Çiqas xweş kiriye, ko ev pesn û gotin û peyv weke dur û gewher li pey hev bidarvekirinê. Çawa ji herkesî xerabtir bî û li ber dilewê ji bav û bira ji hezkirina dê û kur, ko kurê wê li welatê dûr û begane bî, ji şekirê elbika şerîntir bî? Lê ev hevrikî, xweşîya rista wê ye û ji vir tê zanîn, ko ne ji dil nifira li xerabê xwe diki. Lê ji ber, ko gelek jê xeyidye, kûpê xeyda xwe bi ser serê wî da rijandiye û gotiye:

"Ez tu nifirêñ xerab li te nakim,  
Bere goşte canê te biheli, bimênin komek hestî,  
Serapira tu kor bibî,  
heft sala bikevî ber vî destî."

Dibênin? Heta niha ji, naxwazî bi carek bimrî lê divê, ko bikevî ber destê wê, ko tola xwe jê bistêni. Dixwazî, komek hestî bî, kor û kulek bî tenê disa jê re bî, li ber destê wê bî. Goya, ku dixwazî tola xwjê bistêni! Lê na. Tenê dixwazî, ko delalê mala wê jêre bî û di nav mala wê de bî, lê bindestê wê bî.

"Heft sala di dawa taqîkê xwe de bi parse ñ xwedî kiro."

Guhdarê delal, xwendevanêñ bîrewer! De bala xwe bidinê, ka çawa xortek dikevî nav dawa taqiyê keçikê û di nav dawa taqî de tê xwedî kirin? Lê keçika kurmanc, ji şîranî wilo gotiye; xwe kiriye weke jineke gereci, ko li parse digeri û zaroka xwe dixî nav dawa taqiyê xwe û lawike xwe, şerînê ber dile xwe kiriye weke zaroka nav dawa taqiyê, ko carek tişteki nizanî û carek ji, herwekü didî zanîn, ko keçikê gelek perişanî û rebenî di dile xwe pê çerandîye û li ser kîsê wê tütin vexweriye, ko di iro de ji vê reng hezkirinê re dibejin dostani. Lê keçika súrgicî, bi dilekî sade tijî evîn xwe pere berdaye, lê ewle bûye. Na! Na keçika kurmanc! Zinhar, zinhar! Win li xorta ewle nebin! Baş bixwênin, ko karibin xwe nasbikin û baş zanibin ka mér, ci ji jinê hèvi diki û çima ji we hezdikin! Baş bixwêne, ko dost û dijminen xwe ji hev bidî alî û çê wan nasbiki. Li bejn û rewş û pergala xortekî temaşa meke xuske,

tenê li zanîn û bawerîya wî binêre! Mêrê baş, ne bi pîvan û bilindîya ser milê wî ye, ne bi giraniya goşt û hestiyen wî ye; tenê mûrê baş ewe, ko zana, bîrewer û çekrox û rûnerm û karker bî! Bere bostek ji bejna wî këmtir bî, bere këşana wî ji pêncî berjér bî! Bere esmer û çavres bî, lê bere ne hov û nezan û serhişk û dilhişk bî! Lê heta baş nexwêni nikarî baş û nebaş ji hev nas biki.

"Lolo xerabo, mi bihîstî te yek xwestîye,  
Ezê herim daweta xerabê mala bi taqîkê sipî,  
bi dilê şikesti."

Taqîyê sipî li xwe dîkî da xelk nebejin, weyla rebenê! bi kincê kevin hatiye dawetê! Ji ber ko xeyidye. Çima dev jê berdaye, naxwazî kincê paqij li xweki.

Lê çiqasî taqîyekî sipî jî li xweki, tenê dil şikes-tîye. Di virde jî, didî zanîn, ko heta niha jî hê dile wê pêve ye, ko taqîkê sipî diçî daweta delalê xwe.

"Te ne xwestim, ne revandim,  
Kirim darê tenûrê, reşqelandim,  
Kirim taseke çingo, li odê axelera di çingandim."

"Darê tenûrê" hem reş dibî û hem dişawitî û sêfil dibî. Çawa, ko Feqehê Teyran jî gotiye: "Darê tenûrê ezim, kela difûrê ezim". Darê tenûrê, şiveka direje, ko jin pê agirê tenûra xwe tevdidin.

Lê piştî, ko jî xwe re jinik anîye, keçika surgiçi har û dîn bûye û gotiye: "Bere li min bî, li vi dili", lê careke dî li xwe vege riyyate û gotiye: "Na wele, bere li tebî, li mala bavê te bî, li pîra diya te bî, li te bî, li wî aqılı! / Çawa te dev ji min kihêla serê tewla berda, li bergileke pişturmî, qosfilitî, li pey etara dihesilî?"

Vê care, ji dil êrişî jina wî kiriye. "Bergîl", "pişturmî", "qûşfilitî", "li pey etara"..., ci pesnê dijwar jêre bidarvekirine, ko Ebûnewas bixwe nikarî van pesnên pîs bidarvekî; yan Cimo û Xêlikê Xirbekavirî, nikarin wilo êrişî mirovekî pîs bikin!

Lê ciwanikê, careke dî li xwe vedigerî û dibêjî: "Min sünd xwariye ko terka delalê xwe nakim, / heta

bikişenin serê min rebena xwedê topek cawê şêrêzki-ri û li ber serê min deynin cotek kêlén divekirî". Bere tenê bêjî, ko ez evîndarim, ko tevlî vî qasî ji, hê naxwazî terka delalê xwe bikî! Ne Mem û Zîn, ne Xecê û Siyamed û ne Ferhad û Şîrîn, ne gihane vê evîndariye!..

Lê binêre careke dî! jê xeyidye û agirdoma dile xwe, bi ser serê wî de rijandiye û gotiye: "Kul û derdê te giranîn, mîna Gola Wanê şaxê xwe ser vî dili, ser qulpa kemberê ser vî dili." Ji Gola Wanê mezintir di Kurdistanê de nedîne, ji ber ko navdare. Eger na, golên mezintir hene. "Qulpa kemberê", tê zanîn, ko vê çaxê jî kember di Kurdistanê de hebûn. Lê "qulpa kemberê", li ser nava wê ye, ne li se dile wê ye. Yanî kulen te şaxen xwe berdane ser nav û dile min!

"EZ û xerabê malê qaskê li hafa mala  
li hev rûniştin,  
Ji kul û kederân dînyayê me-yê gilî kirin,  
gazin bi şûnve hiştin."

Gilî ji felekê, ji serê sebeba ji gundi û cîrana, ji bextê reş kirine. Lê gazin ji hevkirin bi şûnve hiştine ji ber ko ne çax û dema gazinkirina bû bîzor gilî bikira û çawa dost û yar digihêv hev, devê wan nema digerî, ko gazina ji hev bikin; kelegirî dikevî qirika wan yan qirika keçikê û nema karibî dengê xwe bikî, herweku ew bixwe didî xuyakirin û dibêjî:

"Hêstirê çavê min rebenê, kevir û kuçikê  
binê newala tev dimiştin,  
Masiyê binê behra ji derdê min û xerabê mala  
min biriştin,  
Tilûrên serê çiya bi ser nikilê xwe de dipuniştin,  
Miriyên cebana heftesalî qerqerê xwe li serê xwe  
gerandin û li ser tirbêñ xwe rûniştin, Xerabo!"

Kesi rêzê wilo negotiye! Hingî gilî kiriye û girîyaye kevir û kuçikên newala di ber hêstirê wê çûne û ji derdê wê masî di binê pingava de şewitîne û tilûrê serê çiya bi ser nikilên xwe de pûniştine û miriyên heftesale, qerqerê xwe li serê xwe gerandine

û li ser gorêن xwe rûniştine! Eh! ci mijî ye, ko ev  
ristên hewqas dilşewat û bi tîn ji xwe derxistine.

Hemî jî, belaxe û wekhevîne. Hêstirêن xwe kirine  
weke lehiyeke xurt û mezin, ko karibî kevir û kuçan  
di ber xwe bibî masî di nav pingava xem û derdê wê  
de şewitîne û tilûr, ji ber xem û kulên wê pûniştine  
û ji derd û hawar û zarenê we miriyen heftesale, ko  
bûne ax û riziyane, ji gornistanê rabûne û qerqueren  
xwe yên riziyayî dane serê xwe û rûniştine. Lê ji bo  
ci ev hemî wilo bûne? Ji ber, ko evînoka van herdû  
dilbikul û Cigerbixwînan, neçuye seri.

Hêjaye, ko çirokeke li ser Xerabo jî çebikim.

\*\*\*

## DELALÊ BERFYE

Lo lo, lolo delal,  
de lolo, lo delal

Agirek kete binê berîka min di jêre  
şewiti şeqale Evdilezîza şewiti,  
Kepezê Kîka, hawîkê Hemediya xopan  
pûş û pelaxê newala istilîle vêre,  
Cîhê tersî û talanê mala bavê min keçikê.  
Ezê neketime heyra tersî û talanê mala  
bavê xwe rebenê,  
Lê siba bihare, wê Wardozî bigerin  
li wara  
Ezê ketime heyra şerpeziya siwêre  
lo delal, hey lolo!

De lolo, lo delal!  
Tu delalî malê,  
şekirî nava desmalê,  
mewijê Hibabê,  
sêvê Xelatê,  
êmîşê dora Rîşmilê û Qibale  
kul û kedera ber dile min evdalê lo delal  
lo delal!  
Lolo lo delal!

Li me derketî sitêra va egîta,  
Şewqa xwe daye pozê keleha Mêrdîn,  
serê minara Nisebinê;  
pozê Bagoka şewtitî  
di binyê re, her çar konên me Aşîta  
hey lolo!  
Minê sonda mezin xwariye!  
Terka delalê mala bavê xwe nakim,  
Heta li ser serê min evdala xwedê  
nebi hewehewê di siwaran,  
xuşinê riman, şinginê şûran,  
Terqîna darê bêxwedîyê va darçîte!  
Lo delal!  
Lolo delal!

Xwedêwo, Rebiyo! minê tiştekî giran  
ji te navê!  
Minê tu tersû talan ji te navê!  
Minê tu qesrû eywan ji te navê!  
Tiştê minê ji te divê:  
Konekî sésitûnî, darçitî,  
ji darê darbenavê!  
mêkutî ji darê darbotavê.  
Minê vegirta li ber çemê Hemedîyê  
serê vê duavê,  
Bere serê minê li ber siyê, nigê minê li ber tavê  
belkî nola care di berê  
delalî male, siwarê Hedbên  
xwe bide ser qûna rimê,  
li min evdala xwedê bikrana silavê  
hey lolo!

De lolo lo delal!  
Delalê male siwar bûye bi sariy sibê re  
li mehinê,  
Min evdala xwedê destekî xwe avête  
zengiwê û destê dinê avête vê dezginê,

Delalî male kar û bara xwe kiriye  
wê herî nêçîra karê xezala, binê berîka  
vê Mêrdinê,  
Roja qal û qewamê digiran  
mêra dikuje kela vedgerîne;  
mala Emşa û Îmêşa çelabatê bedewa  
û Şemera dişkêniñe  
talanî kurê Kurmênc  
bi tena darê rimê vedgerîne  
hey lolo  
de lolo lo delal!

Minê sûnda mezin xwariye  
Heçî saloxekê ji delalî male ji me re bîne  
ezê bidimê heft aşê mala bavê xwe rebenê  
li ber çemê Nisêbînê.  
Eger pê razî nebû, ezê ramîsana rûkê rastê  
bidim di mizgînê  
Hey lolo.....

Xuyadikî, ko keçika aşîti dil bi kul û kedere, ji  
ber, ko delalê ber dilê wê bi sariya sibê re siwar  
bûye û berê xwe daye binê berîye û kî zanî ci pê  
hatîye? Hatîye kuştin, hatîye girtin, ci bi serê wi  
hatîye, nizanî!..

Pir pesnekî xwes anîye, ko dibêjî "bi sariya sibê  
re delal siwar bûye û min evdala xwedê bi tena  
kirâsê melesî, piştvekirî,/ destekî xwê avêtiye dez-  
gînê û destek avêtiye zengiwê.."

De ka vê rewse werêne ber çavê xwe, bê çiqasî  
bi saw û şîranî tê dîtin! Keçekte bejin bilind û bi te-  
na kirâsê melesî, piştvekirî, bi sariya sibê re destê  
xwe bavêjî zengiwa kê, wê çawa xwe bibêni, wê ci-  
qas payedar bibî!? Bégomane, ko niha ramisanek jî,  
je standiye, çendan bi siwarî bî jî! Lê ramisanê ze-  
riyên wilo, di sariya sibê de jîna mirov duqat dikin.

Lê bi rastî keçik şîrpaqije, ko dibêjî "ezê heft  
aşê mala bavê xwe li ber çemê Nisêbîne bidim bi miz-  
gînê", lê pir xwes gotiye, ko dibêjî "eger pê razî  
nebû, ezê ramîsana rûkê rastê bidim dimizgînê" û

hin dibêjin "heta ber doxînê". Ev çiqas payebilinde ko heta ber doxînê ji, di mizgîna saloxa delalet xwe didî!.. U pêde çûye û pesnê delalet xwe daye û gotiye, "şahidê delalet min gelek hene, ko di rojên tengasi de - rojên ko dijmin (Ereb) talanê kurê kurmenc dibil, di van rojande delalet min bi tenê, bi tena darê rimê, talana vedigerine û Ereba, Bedewa, Şemera dişkêni û talan ji wan distêni, vedigerêni."

Ca ev mîrê wilo hêjaye, ko keçika Aşîti heta ber doxînê ji di mizgîna saxiya wî bidî.

Lê sitêra egita min nebihîstîye, Kîjan sitêre. Tenê ew dibêji "şewqa xwe daye pozê keleha Mêrdinê, serê minara Nisêbinê pozê Bagoka şewitî, di binyê re her çar malen me Aşîta". Lê di virde gotiye, "her çar malê me Aşîta"; gelo bira çar mal danibûn? Lê na, balkî di çavê wê de ji ber ko delal ne li nav konaye, konen Aşîta kêm u büyük dane xuyakirin, yan ji ew büyük u kin dikan!.

Lê çiqas mezine, ko dibêji "ez terka delalet xwe nakim, / heta li ser serê min nebî hewe-hewê di siwaran, / xuşîna riman, şingîna şûran, / terqîna darevan darçita.." Keçika Aşîti, siwar û peya tevlî hev dikî û teva li ser serê xwe dicivêni u dibêji, "heta wilo nebî, ez terka delalet xwe nakim!" Ci rewşeka mezin? Gava mirov bidî ber çavên xwe, ko êl bi carek li ser serê jinekê bi şûr û rim û darçita lê didin u dixwazin wê bikujin; tenê ji bo ko nikarî terka delalet xwe biki?

Ciqas bi dilpakî hetiye meydanê, ko dibêji:

"Lolo Xwedêwo!

Min tiştekî giran ji te navê!

Min terş û talan ji te navê!

Xan û qûanax û eywan ji te navê!"

Lê tiştekî tenê jê divê, "konekî sêsitûni" ko li ber çemê Hemedî, çemê Nisêbinê li ber avê vegirî u serê wê tenê li ber siyê bî, ne xeme, ji bo, ko belkî carekê nola carên berê delalet malê-siware Hedbê, xwe bidî ser quna rimê û li keçika Aşîti selavekê biki. Keçika Aşîti ev selav bi malê dînyayê tevi nedaye.

Lê çawa agir dikevî welatê Mêrdinê û çiyayê Ev-

dilezîzê, Kepezê Kîka, Hawîkê Hemediye û Newala Siti'lî bi carek dişewitî û cihê çéra terş û talanê mala bavê wê namêni. Lê nakevî heyra terş û talan, tenê xema lawkê xwe dikî, ko di bihare de wê siwar herin beriye û çûna warekî bigerin; di wê çaxê de wê la-wike wê şerpeze bibî.

Herwekû ji vir tê zanîn, keçika Aşîti ji maleke mezin û xwedî terş û talan bû, ko beriya Mêrdîne ji Newala Siti'lî û ta bi ciyayê Evdilezîzê, cihê terş û talanê mala bavê wê bû. Û heft aşê mala bavê wê ji, li ber ava çemê Hirmas-çemê Nisêbinê jî hebûn. Lê keça kê ye gelo? Pir diriste, ko ji mala axê Nisêbinê bî, yan jî keça Xelef Axa bî?

Lê kula pir giran eve, ko em nizanîn ka delalê wê lê vegeriyaye, yan hatiye Kuştin! Kesî jêre salox anîye û ramisanek jê sitandiye, yan na? Eger yekî salox jê anîbî û ev ramisan jê sitandibî, sed xwezî bi dilê wî bextewari!

Lê pir ditirsim, ko keça Aşîti hew delalê xwe dîtibî. Wê çaxê malwérani ye û ew jî weke min bi vi derdi çûbî! ..

\*\*\*

## FEQÎ Ü EYŞANÊ

Eyşanê digo: Feqîyo qurba!  
Bejna zirave tak rihane pel dije,  
Li devê deryê mala bavê min keçikê  
şax tavêje,  
Ezê esl û feslê te nasnakim,  
Çika esl û feslê xwe-j min ra bêje.  
Lawiko lo!..  
Feqîyo lo!..  
Bext ne waye kuro.

Feqî digo: Eyşanê!  
Bejna min zirave takê vê rihanê,  
Bere şîn nekira li devê deryê  
mala bavê te keçikê li ser dikanê,  
Wele heke tê li esl û feslê min dipirsî?

Ezê mihacirê deşta Wanê berîya Qaqizmanê.  
Eyşanê lê!..  
Nezanê lê!..  
Te-z helandim keçê.

Eyşanê digo: Feqîyo qurba!  
Bejna min zirave takê vê rihanê,  
Bere şîn nekira li devê deryê  
mala bavê min keçikê li ber dikânê,  
Ezê keça Hecî Elî me, navê min Têlîeyşanê.  
De Feqîyo lo!..  
De lawiko lo!..  
Bext nemaye kuro.

Feqî digo: Eyşanê dînê!  
Ezê ji teyra teyrê bilindci me,  
Li devê deryê mala bavê te danîme  
Isal heft sale bi sê jina zewicîme.  
Eyşanê lê!..  
Cîranê lê!..  
Te-z helandim keçê.

Eyşanê digo: Feqîyo qurba!  
Dilê min sêla hesinî,  
Jî êvara xwedê de agirê qurma daye binî,  
Çika ji min re bêje: tu ezebî ya bi jini?  
Lawiko lo!..  
Feqîyo lo!..  
Bext ne waye kuro.

Eyşanê digo: Feqîyo qurba!  
Bejna min zirave ji darê bîyê  
Bere şîn nekira li devê deryê  
mala bavê min keçikê li ber kaniyê,  
Kuro, min qebûle derdê vê hêwîyê.  
De Feqîyo lo!..  
De lawiko lo!..  
Bext ne waye kuro.

Feqî digo: Eyşanê dînê!  
Wele nabî, bile nabî,  
Şûşa dile min şikestîye cebar nabî,  
Min nanê mala bavê te xwariye,  
Reva keçê Eşîra ji min re nabî.

Eyşanê lê!..

Nezanê lê!..

Te-z helandim keçê.

Eyşanê digo: Feqîyo qurba!  
Devê deryê mala bavê min bi rê ye,  
Feqîyê min rebenê bi şev û bi ro  
pêde diçî, têye,  
Kuro, de rabe destê-m bigre emê  
hev û dinê birevînin,  
Ma dê û bavê min ci jêye.

Lawiko lo!..

De Feqîyo lo!..

Bext ne waye lo.

Feqî digo: Eyşanê dînê!  
Bejna min zirave takê vê benavê,  
Bere şîn nekira li devê deryê  
mala bavê te keçikê li ber avê,  
Keçê bela xwe ji min veke!  
Wele tu diya min bî tu xuha min bî,  
min tu navê.

Eyşanê lê!..

De nezanê lê!..

Te-z helandim keçê.

Eyşanê digo: Feqîyo qurba!  
Devê deryê mala bavê min bi ce ye,  
Ezê bala xwe didimê serê vi cehî bûye şe ye,  
De rabe tûrik û kitêbê xwe hilgire here  
ji gundê me ye.  
Mihaciro lo!..  
Feqîyo lo!..  
Bext ne waye kuro.

Di virde tê xuyakirin, ko Eyşanê gelek nexweşike yan jî Feqî gelek zanaye, ko dixwazî xwendina xwe biqedêni, naxwazî jinê benî, birevêni. Herwekû xuyadi-kî, ko çend nîr li Eyşana Hacı Elî derbas bûne û kes wê naxwazî; yan jî Feqî gelek ciwan û delale. Ji lewra çûna ser sê héwiya qebûl diki û tenê dixwazî di bin mara Feqe de bî.

Ev reng giran avêtina berhev, di hemî zimana de nîne û ko hebi jî, gelek kêmîn.

Risteke min jî, di Diwana Çaran de bi navê "Fâtê û Mela" (avêtina berhev) ne, ko winê têde bibênen.

Lê Feqe bixwe, ne bi jine, tenê derewa li Eyşana Hacı Elî diki, ko dixwazî xwe jê biparêzî, ji nav pencê şerê evînê derxî, yan nekevi nav bend û davikê "şokirinê" (jinanînê).

Lê herwekû tê zanîn, Feqî naxwazî bax û bustanê zanîn û xwendewarî bi mijandina lêvên sor ziwa bikî û béberbihêlî.

Herwekû ci feqehêñ ko jin revandine, poşman bûne û li xwe xistine; çawa, ko dibêjin, "zanîn-xwendewarî, di nav lingê jinê de hatiye serjêkirin." Feqehêñ ko jin anîye yan revandine, serê xwe dixî nav davik û bende û nema dikarı li berxwe bidî, yan gerden şikestî di bin diwarekî herivî de dimenî. Barê jin û zarokan dikevî istiwê wî û nikarı di bin vî barî de bi camêri milen xwe raki. Naçare, dive herî cem axakî, cem şexekî û rêncberîya wan bikî, yan jî bibî melakî pîsik û li gundekî li ber destê keyakî rûnin! U bi kerî karekî jî nayê. Naçare derewa li xelkê diki, niviştoka ji jinebiya, bihêwiya re çekî û xelk li dor jina wî bigerin, ko nanê xwe û zarokên xwe bi qeşmerî karibî derxî.

Tenê çawa ji vê devjenkê tê xuyakirin, Feqî Eyşanê ne xwestîye wilo li xwe bikî, aferîn Feqe! Eger te rast wilo bir biribî, herwekû min gotiye:

"Ev dîn û dewlet xwendine, xwendine.

Ev tac û şewket xwendine, xwendine.

Ev serbilindî xwendine.

Ev dewelemendî xwendine."

Bê xwendin mirov weke kêzik û kurmika ye. Her kes, her teba, her candar li nanê xwe û zarokên xwe digerî. Lê, tenê mirovê mezin li serbilindî û pâyedarı, zanîn û bîrewerî digerî; guh nadî qirêja destâ tim li cîhê bilind digerî û cîhen bilind, bê xwendin, bi dijwari dikevin destê mirova.

Ji lewra di awira min de, her tişt bi xwendinê ye. Di rist û istiranê Kurdi de "avêtinaberhev" çend cara hatiye, weke vê istiranê û istirana "Bişeriyo", "Hacî Mûsa û Gûlê" û rista min "Fatê û Mela" û risteke Feqehê Teyran û risteke Cizirî û yeke Melê û Feqehê Teyran û yek jî li nav Badîna hatiye çekirin û hin istiran jî di Kurmancî de wilo hene, ko avêtine berhev û ev reng avêtinaberhev di hemî ziman de kêmîn.

\*\*\*

## WÎ WÎ LÎ MÎN

De wî li min, wî wî li min!..  
De wî li min, wî wî li min bext bireşe.  
  
Kurê xalê mino,  
Ezê Kopê bi demankim,  
Du sed zêrê Osmanlı têde karkim,  
Ezê herim bajarê Erzeroma xopan,  
Şal û şapikê kurê xalê xwe bi qeytankim,  
Bavê xêrê biki bi çavê serê xwe nebînî,  
Çawa nedame kurê xalê min rebenê  
îsal heft salê min dilketê,  
Ez dame Çaçanê mala Simo,  
bûye çîleçîlê Çaçanê dibêñ:  
Bûkê siwarkin, bûkê siwarkin!  
De wî li min, bê wî li min, bê wî li min!  
Bê wî li min, bê wî li min, lê bext bi reşê.  
  
Lolo kurê xalê mino,  
Min dil girtî ji nedîve, ji nedîve,  
Min dî kurê xalê min derbas dibû taxa

mala Efendî ve, Efendî ve..

Xwezka ezê bibûma kosteka wê saetê,

Qaskê biketama ser berstika eba kendoyî ve,  
kendoyî ve.

De wiwî li min, wiwî li min!

De wiwî li min, lê bext bi reşê.

Lolo kurê xalê mino,

Kopa xopan li wî benî, li wî benî,

Bavê min rebenê xérê biki bi çavê  
serê xwe nebînî!

Çawa nedame kurê xalê min rebenê,

îsal heft sal min dilketê,

Ezê dame Çaçanê mala Simo

kalê pîsê papax genî, papax genî.

De wiwî li min, wiwî li min!

De wî li min, de wî li min, lê bext bi reşê.

Lolo kurê xalê mino,

Min ci got û te deynekir, te deynekir,

Kurê xalê min rebenê kolos xwarkir

mitale kir, mitale kir,

Lawko dîno gazin û loma ji min meke!

Eza rih û canê te bûm xwedê li banê  
banî nekir, banî nekir.

De wî li min, de wî li min!

De wî li min, lê bext bi reşê.

Keçika Kopî, ne navê xwe û ne navê kurê xalê  
xwe ji me re dedaye zanîn. Tenê navê gundê xwe û  
navê kalê mérê xwe gotiye.

Lê nizanim, ko navê mérê wê Çaçane yan jî mérê  
wê yekî çaçane? Lê ji ber, ko dibêjî, "Çaçanê mala  
Simo", xuyaye, ko navê mérê wê Çaçane û bixwe jî  
çaçane.

Bi rastî, bavê wê zor û setem lê kiriye, ko ne-  
daye kurê xalê wê û daye vî kale papaxgenî tevî ku  
heftsala berî hingî jî, dil ketibû kure xalê xwe! Lê  
bavê nezan û polperest, naxwazî bidî wî xortê, ko  
keçikê bi dile xwe xwestîye, lê tenê divê hinek pere

zêde bistêni yan yekî cendirme biki mirovê xwe û keça xwe bidî wî, ko karibî ji zordestiya wî kar biki. Ji lewra keçika Serhedî peşî pesnê kurê xalê xwe diki û dixwazî hezkirina xwe jere bidî xuyakirin û dibejî:

"Ezê kopa şewitî bi demankim,  
Dused zêrê Osmanî têde karkim,  
Ezê herim bajarê Erzeroma xopan,  
Şal û şapikê kurê xalê xwe bi qeytankim."

Lê çawa bû, ko bi dused zêrî qeytana li şal û şapikê wî bidî? Eger sade zér biki, dused zér besin.

Xuyaye, ko bejn û bala kurê xalê wê gelek delal û çelenge û şal û şapikê giranbuha li xwe diki. Ji lewra dixwazî dused zêrî li qeytana tenê bidî da karibî li bejn û bala lawikê xwe biki, ko xelk bêjin "wele xorkeki pir delale!" Wey sed carî pirozbin! Û keçika Serhedî, heta naxwazî bihayê kil û kildanê xwe jî, ji wan zêran hilêni!.., hingî ji kurê xalê xwe hezdiki.

Reben keçika Kopî! Heta diçi Erzeromê, Çaçanê mala Simo wê ji bavê nezan bi pera dikirî û şal û şapik ji pêçeka goman û sawîren wê dikevin û tevlî kurê xalê wê ji destê wê diçin.

Wey reben keçen Kurmancan! Gelek, ne bi dile xwe diçin mala mér û dilsikesti dibin bük û jîngariya xwe bi azarı û xemxwari derbas dikin; û di dojeha bêdili de, jîna xwe radibiwerin û herdem di goman û sawîran de dijin û tenê di xewnên şevan de dilgirtî-yêñ xwe tênin bîra xwe û gelek ji wan, ji qanûna jîn û méri derdikevin û dîghîne yarê xwe û gelek jî, di vê rê de têne kuştin yan jî, têne berdan.

Kengî wê gelê Kurd karibî xwe ji yê rista çewt dûr bikin. Ancex tarîx karibî bersîva vê pirsê bidî.

Keçika Kopî rast gotiye, ko dibejî, "wî wî li min! wî wî li min bextreşê!" Raste, bextê wê reş û tarîye, ko negihaye kurê xalê xwe ko berî heft sala dile wê ketibûyê; raste, bextê wê bi reşe, ko bavê qirêjperest ew daye yekî kal û pîs, ko keçik wî naxwazî. Lê, ne tenê bextê Keçika Kopî reşe. Bi hezaran weke wê li Kurdistanê peyda dibin û heta ev

rewş li nav Ereb û Eceman ji heye. Lê pir xweş gotiye, ko dibêjî, "min dil girti ji nedî ve."

Raste, dilgirtina ji nedî ve, gelek dijware. Lê di virde bi daxwaza "ji nişka ve ye, ne ko min kurê xalê xwe nedîbû û dilketibûme!" Lê "ji nişka ve" û çawa ew dî, dile wê ketiyê, yanî bi cara peşî re dile wê ketiyê? Herwekû ew bixwe dibêjî, "min dî kurê xalê min derbas dibû di taxa mala Efendi ve." Xuya-ye, taxek ji Kopê ye yan Efendî bixwe miroveki nav-dare di Kopê de. Û çawa kurê xalê xwe bi şal û şapik û eba kendoyî bi serde li xwe kiriye û zencîra saetê berdaye ser berstika ebayê, hatiye bîra wê û xwazî kiriye, ko bibûna zencîra wê saetê û qasekê biketa ser berstika eba wî ya gendoyî û xwe berda ber siñga delalê male, belki carekê destê xwe baveta zencîre û pê bilizta! Di dile keçika Kopî de, xwedîyê van şal û şapika û vî kumê kolos, ko eba gendoyî li xwe kiriye û zencîra saetê berdaye ser berstika wê weke padişahekî té xuyakirin û çawa ji nişka ve dîtiye, dile wê ketiye kurê xalê wê, vî xortê delal.

Lê piştî ew dane Çaçanê Simo, carekê li hafa mala lê rast hatiye û silav lê kiriye, lê kûrê xalâ wê ko-loşê xwe xwar kiriye û guh dedaye keçmeta xwe. Ji lewra keçmet dibêjî, "gazin û loma ji min meke! Ez ya te bûm lê xwedê li banê banî nekir,/ ez bêdili min dane vî kale papaxgenî."

Raste, ne tev súcê wê ye; lê súcê mezin súcê ne-zanê bavê wê ye, ko keça xwe daye vî mirovê ji hevdeketî.

Tenê, keçika Kopî nizane, ko "Xwedê nekir", da-veke, ko gerdena gelek reben û nezana téde şikesti-ye! Ji bo, ko nexin gerdena xwe, dixin gerdena Xwedê û dibêjin "çibkim? Xwedê nekir! Na, na keçi-ka Kopî! Ne súcê Xwedê ye, súcê te ye û súcê mezin súcê bavê te ye! Herwekû keçika Kopî, xwe li ezmana daniye. Lê xwe şas kiriye. Xwedê li her derî li her şûnê ye. Xwedê di nav cihanê de ye. Eger dixwazî dilê kurê xalê xwe xweş bikî, jêre bêje "he-re çîroka 'Sîter û Şepal' bixwêne, té zanibî ka súcê kê ye, té zanibî ka çawa tu dame mér!"

Xuşka Kopî! Sûcê mezin, sûcê rist û destûr û

qanûna kevneperestiye, ko ev hezar û çarsed salin di welatê me de cî girtiye û em nema zanin ka çawa ji ser pişta xwe bavêjin? Sûcê mezin, sûcê bêxwendînî û paşvemayînê, ko nahêlin em di meydana serbestî de çend gavan bi pêşde bavêjin! Ne tenê çiroka "şokirin" û jin û mere, belki her tişt di welatê me de herivî û wêran maye.

Pijen kavilên bajarên kevnareyên Kurd û Kurdistan pozê xwe bi payedarı li me bilind dikin û kevnekele-hênen Kurdistanê, bi xurtî û mezinahî şerê tarîxê dikin û bi me dikenin û tinazê xwe bi me dikin û dibêjin, "sed mexabin ko win jî kurêñ wan gernas û fêrisa ne!" Lê ci bêjim, xwehê?

"Lê Kurd ne çê gihane,

Zingar giha mêtî."

Lê tenê dixwazim tiştekî ji te re bêjim: Keça Kurd! bixwêne! Bê xwendin, ne ez û ne tu, em nikarin bighê daxwaza xwe. Bê xwendin, kes nikari bighê daxwaza xwe. Ma ne xwendin bî, kî dikari van balafir û tang û topan bêni meydane? Kî dikari welatê xwe ji destê dijmin û çileka biparezî? Kî dikari bighê serbestî û gerdenazadî? Ma te nexwendîye, ma te ne bihistiye, ko min ci gotiye?

"Ev dîn û dewlet xwendine, xwendine,

Ev tac û şewket xwendine, xwendine,

Ev serbilindî xwendine,

Ev dewlemendî xwendine."

Kurmanca berî niha gotine, "ma ga dîkî ga dixwî." Na, na! Ga dîkî lê ker û golik ji wî bêtir dixun; bergîl ji dixun, ne tenê ga dixwî. De bere ker û golik bixun û ga ji birçîna bimrî!!..

\*\*\*

## HEYRAN

Heyran bûye nav ji wan istiranên, ko li ser keçi-ka hatine gotin. Çawa, ko berî bist sala, ko min di bersîva "Evdilxalîq Esîri" de gotiye û di kovara Hawar de belavkiriye. "Lawik" û "Heyran" li nav Soran li hindama Erbil, ji van istirana re dibêjin: "Heyran",

û dibêjin "Meqamê Heyran" ji nav kurmanca çûye nav Soran-hindama Erbil.

Herwekü pir diriste, ko ev nav ji zimanê Eerebî hatibî. Ji ber ko, gelek caran "heyran" û "Qurban" li pey hev têñ. Lê li şûna "Qurban", "gorî" bi kurdî heye; lê li şûna "Heyran", heta iro jî, hêj tiştek ne-hatiye dîtin.

Eger keçik naxwazî navê şérîna berdilê xwe eşke-re bikî, wilo jî lawik naxwazî navê şérîna berdilê xwe eşkere bikî, û li şûna navê wê dibêjî: "Heyran", yan kubarı, yan gewrê û hin navên tevayı jere datenî; da kes navê dosta wî nasnekî, da dosta xwe ji mirin û çirokên ber tenûra biparêzî.

"Heyran", di zimanê kurdî de pirin û nayêñ jimartin, lê dixwazim di virde çend Heyrana bidim xuyakirin:

"Ofof li min, ofof li min, oy oy li min,  
ay ay li min"

Ev çend gotin gelek caran di serê istiranen de tê-ne gotin û dengbêj serê xwe di berve dihejênin ji bo naskirina kêşan û meqam. Lê bi xwe alavekî dileşî ye, ko kengî mirovek teşî, dibêjî: "Ay", "Of", "Oy", "Ax", "Ox", "Ah", "Aman", "Hawar" !...

Di destûra zimanê kurdî de, ko di sala 1962 de li Bexda hatiye çapkirin, gelek xweş û dûr û direj min "Alav" dane xuyakirin.

Ofof li min, ayay li min!  
Ez evdelim Xwedêwo!  
Lêlê kubarê bejna te zirave li gotinê,  
Wele min bihîstiye hatiye çarşîya lehdê,  
Diyarbekra xopan firotine,  
Xelkê tê da, qesr û qisûr malê dinê,  
Ez evdale Xwedê xizan bûm, tişteki min tune bû,  
Min têda canê xweyi şérîn li ber mirinê lê!  
Oyoy li min, ofof li min!  
Ayay li min tengezarim lê!

Hey malwêran! nebî te hin li ser dosta xwe kuştîbin, ketibî zindanê? Çiqas malê dinyayê giranbiha û bi rûmete jî, lê ne weke canê li ber mirinê ye!

Dengbêjê me gotiye: "Li ber mirinê". Ji ber ko canê li ber mirinê gelek giranbiha û şerîne û xwedî, dost û mirov tev li ser digrîn û dekторan ténin ser û hêvi dikan, ko careke dî li wan vegeri. Û di wê çaxê de lawik, canê xwe dikî bihayê bejna zirav; ji ber ko tiştekî dî li cem tuneye gelo? Yan jî ji; ber ko can di wê gavê de gelek giranbihaye, ko dixwazî cane xwe bîdî?

Lê ey hevalê Xwedê jêsitandî! Eger te canê xwe yê şerîn da di bihayê bejna dosta xwe, ko te bixwe jî nedîtiye! Belki li ser gotinên xelkê tu bûye kiryarê bejna wê, le tê paşê çawa bîkî? Û ci karê ji wê bejne bîkî?

Eger dixwazî li wê cîhana di "gomana" xwe de pêre geş û dilxwes bîjî! Xuyaye dosta te tu heyran û bêhiş hiştîye û nema zanibî ci bîkî! Û paşê çawa dizanî, ko bi can tenê razî dibi? Seydayê Cizîrî dibêjî:

Dil û can jî, li ser danîn  
Ü zâlim hêj dibêjît: deyn!

Bizane, ko camêran berî te can û dil dane dosta xwe:

Ez ji xew rabûm  
Gulfiroşek dî,  
Pir gelek şabûm  
Gul bi dil didî.

Hebû me yek dil  
Tev jan û kul bû,  
Nebûme bawer gul bi dil bîdî

Bazar kir me go:  
Ser biser nadim,  
Ê gulperest bî  
Can û dil didî.

Min go: Kî didî  
Can û dil bi gul?  
Go: Ev bazare!  
Dil bi kul didî! (*Cigerxwin*)

Hevalê "Zinarî"! Eger te canê şerîn bi tenê daye bihayê bejna yara xwe! Lê ciwanmîr hene, ko can û

dil jî, li ser danîne û di bihayê Gulek ji destê yara xwe dane. Lê bi rastî, ev gul, ji bejna zirav bihatire. Gula destê gulfiroş Kurdistan e, ko weke me sadedil peyda dîbin, ko li ser gernas û fîrisa giranbiha rûniştiye! Reben pir weke me sadedil peyda dîbin ko wilo behîş, can ji dest xwe tavêjin û bihayê wî nasnakin! Çawa ko, Seydayê Xanî dibêjî:

"Sermaye yê umrê jîndegani". Jîngariya xwe bi carek didi bihayê bejnazirav! Lê nizanim, Bejnazirav bi çavekî evîndarî weke wî, lê temaşa dikî yan na? Qozîkê çavê xwe lê dişkêni yan na? Yek caran ramûsanekê didiyê yan na?

Lê raste, gelo xizan bû û tiştekî wî tune bû ko heta canê xwe dayê, yan jî, derewa li xwe dikî? Lê, ko rast xizan bî, ma ji can pêve ci ji destê wî ve tê? Ci di destê wî de heye! Lê evîndar can didin, ko bighêñ cana xwe.

Lawik pêde diçî û dibêjî:

Ay ay li min, kubarê dînê!  
Derê Meşkîna xopan bî'ewitî, ne tu dere,  
Pozê Kela Mêrdînê bişewitî, tim rasere.  
Xwezya ez bibûma zêrekî Mehmüdî,  
Ji xanboxaza qirikê xwe berda nava  
cotê sîng û bera!  
Sîng û berê xelka têlî kaleboze sipîne,  
Mîna bexçekê Sultan Evdilhemîd,  
Bi şev û rojê qereqol û newbet tim li bere lê!  
De ay ay li min, of of li min!  
De ax ax li min, tengezarim Xwedêwo!

Gazina ji derê Meşkîna dikî, ji ber ko pozê kelehê raserî wî ye û xelkê serê kelehê nahêlin li wir dost û yar hevdî bibenin û ji xwe re henek û laqirdiyan bikin; nahêlin hev hembêz bikin û maçan ji hev bidizin û di çola evîndarî de gerdenazad biggerin, hilma gulistana jînê bikşenin pozê xwe û bi ciwaniya cîhanê dilxwêş bibin. Xelkên serê kelehê pêwan û altax û qelawizin.

Raste sîng û berê Keçika Meşkînî weke textê Evdilhemîd-padişahê İslâmê ne, ko bi şev û roj pêwan li

ber hişyarın û nahelin çük bi çukanîya xwe li nav deynin; wilo ji, xelkê serê kelehé, nahelin lawik big-hê nav baxê sîng û berê dosta xwe. Lê ew pêwan û nobedar bikêri Evdilhemid nehatin û roja, ko milet râbû, ew avêtin û Mihemed Reşad xistin şuna wî û di zindanê de serê xwe danî.

Reben nikarî bighê sîng û berê dosta xwe-xelka têlî. Ji ber ko newbedar û pêwan li ber in û dixwazî ko bibî zerekî Mehmûdî û ji nav hel û morîyan ji xanboxaza qirikê xwe berdi nava cotê sîng û bera! Lê nizanî, ko "kes bi xwezya naghê baqê keziya"! Eger bi xweziya bibûna, niha wê camêran bighana ezmanê hefta, yan sitêra Merîxê! Lê dixwazin bizanîn û bîhna fireh bighêne daxwazâ xwe. "Heq tê sitendin, lê kes heq nadî!" û kurmanc dibêjin: "Yan bike û mercicif; û yan meke û mercicif!"

Lê xuyaye, ko dilê keçika Meşkinî pê şewitiye û jê re gotiye:

Lawiko dîno min nizanibû  
Bextê te ji, eve lo!  
Ezê li bextê bavê te ketime!  
Qaskê were mala bavê min bi şeve lo!  
Emê sêbiskê dişê û simbêlê palikkirî  
qoşme bikin tevlî heve lo!..  
Ji nîvê şevê pêde ezê cotê memikê  
xwe rebenê bavem deve lo!..  
Wele sîng û berê min evdala xwedê  
mînane bexçekê Zinara Mêrdînê,  
Serê salê sê cara zekata malê xwedê lê dikeve lo!..  
Wele heke dê û bavê min xeyidîn  
û gotin: Çi bû çi qewimî?  
Ezê bêjim: Yabo! Yadê! Adetê xort û qîzên vî  
heyamî yek jê eve lo!..  
De were lo! Were lo! Te-z helandim kuro!

Di virde keçik serbestîyekê nîşanî me didî, lê nizanîm bira li Mêrdînê wilo serbestî hebû yan na? Bira yek ji adetên wê çaxê ew bû, ko kur û keç dikari-bûn di ber sînga hev de rakevin û cotê memikên xwe bavêjî devê lawikê malê û şebiskên dişê û simbêlên palikkirî tevlihev bikin? Ca eger wilo bî, aferîn Mêr-

dîn! Tiştê ko ez dizanim di nav koçerên bedew ên Ereb de ev tişt hebû. Lê li nav bajaran min nebihiştiye! Dibî cirapif di wê çaxê de li welatê Mêrdînê hebî? Çiraye vedimrênin û jin û mér dikevin nav hev û dibî cerg û bez û gur û pez. Lê bi rastî li nav bajér min nebihiştiye, ko ev adet peyda dibil. Lê dibêjin: "Di nav Begdaşıya de, di nav Elewîya de ev tişt di ola wan de peyda dubûn." Lê nizanim bi ci rengî bin? Herwekû li nav Kurdan di çaxê destarhêrdinê de, xortekî çira vedimirand û jin û mer di reşe de di nav hevde diman û belki dost û yar ji, digihane hev û maç û ramîsan ji hev distandin! Min bixwe ev tişt li Amûdê û li Gelale dîtine. Herwekû hin tiştên din ji, di nav Ezidi û koçeran de hebûn, ko ev der ne cihê wane.

Lê keçik dixwazî zekata male Xwedê bidî lawikê xwe. Lê, ma şêx û mela dihêlin tu zekata wan bidî xelkê? Gereke bi hindikî tu nîvî bidî mela û şexa û hecî ji ber ma, bidî belengazê lawikê xwe. Le pir xwes gotiye, ko dibeji: "Mîna bexçekê zinara Mêrdînê / Serê salê sê cara zekata male Xwedê lê dikeve".

Di virde didî xuyakirin, ko "bexçeyen zinara Mêrdînê" gelek ber didin, ko zekat li wan sê cara di salê da jê derdikevi. Carek "avî", carek "rez" û carek "dar û ber" weke güz, behîv... Herwekû didî zanîn, ko diriste seçaran ez destûra lawikê xwe li bexçê sîng û berê xwe bidim, ko zekata wi biçînî!

Lê para me rebena kî wê bidî? Ma bere zekat tevde ji lawikê te re bî, keçika Meşkînî!

#### AWUREK:

Di tore û rist û istiranêñ Kurdi de, bê şerm û fedî û eşkera di nav civatê de van gotinêñ xweş dibêjin: "Memik, gerden, sîng û ber, dem û rû, çav û ebrû" wan dibêjin û pêde diçin û dibêjin:

"Min destê xwe avete cotê memika", "min devê xwe xiste boxaza gerdenê", "min devê xwe xiste qirikê", "ezê memikê xwe bavêjim devê..." Bi kurtî, lêv û dev, gerden, enî, çav û dem, tevan talan dibil û kes dengê xwe naki; didin ber ramûsan û maç û gez

û givaştinê û hevdî digevizênin, sîng û berê wê tev-didin, gez dikan, talan dikan, dimijin, lê kes nabêjî kuro şerme! bes li cem jinan wilo bibeje! û di odën axa û bega û di nav jin û mîran de dengbêj wilo dibêjin. Lê ev ji ku hatiye, lêkolînek dive!

Weke ko tê ber çavê mirov, xuyaye ev ji rewş û pergala qûnaxa destpêkê bû, ko **Markis** jê re dibejî: "Qomunistiya Destpêkê", yanî her tişt tevayî bû. Lê bê rist û destûr bûn. Hê mirov ne gihiştibû avayî û bi pêşve neçû bû û abor, gelek hêsanî û li paş bû. Kurd di qûnaxa koçeri de xwedî pez û sewl bû. Û Kurdistan: Çiya, av, dar, giya, cûn û hatin tevayî bûn. Elekê ji warekî bar dikir û elekê li şuna wê datanî û ava çema û giyayê çol û çiya téra tevan dikirin û ji teva re bûn.

## AY MEDED

Ay meded! Ezê nazdarim,  
Nizanim nazdarîya xwa li kê kim?  
Ne li pîra dê kim, ne li kale bavê kim?  
Şindolê mîra zend û bendê mine,  
Kalê bozê sipî, şikandine  
Ezê nikarim kofîya bilind bi ser  
Enîka keverde ji lawikê xwe re çêkim!  
De hay meded!...  
Ez tengezara lawikê xwe lolo...

Ev istirana "Meded", gelek direj û xweşe. Lê min nejibere, lê ko carekê dengbêjekî bibenim, ezê tevi binivîsim.

Tê xuyakirin, ko keçik (jinik) kale boze bilinde, lê bav kal û dê pîr û bê biraye û naçare dane şin-doleki mîra û dilê wê ketiye xortekî çeleng. Lê mîre şindol hero lê dixî û desten wê dişkêni û bi ser mala bavê xwe de dici. Lê wê gazine xwe ji kî bikî? Ne bav dikari deñge xwe bikî û ne dê dikari zimanê xwe dirêjki û nema karî ji lawikê xwe re bejn û bala xwe çeki. Çawa ko tê xuyakirin, ko şindolê mîre wê keyayê gunde, yan yek ji mezinê êlê ye? ko kes nikarî li ber dengê xwe bikî. Lê ne bi dilê jinikê ye û

guh nadî mal û mezinahiya mérê xwe û çavêن xwe berdane delalê ber dilê xwe. Lê herdu reben weke Ferhad û Şerîn, di bin dare zorê de mane, dikin havar, lê kes di wan û hewara wan nayê. Ma kî dikarı jina mérkê zorçane jê berdî û bidî yekî belengaz?

Herwekü tê ber çavê mirov, xuyaye mérê wê ji dizanî, ko jina wî yekî ciwan li gora dilê xwe ditiye, ko bi şev û roj di goman û bîr û hişê wê de ye û haya wê ji şindolê mér nemaye; û çiqas lêdidî, serê wê dişkêni jî, lê ci hêjaye!!

Lê diwabû, berî hingî bîra vê yekê bibira û bextê keçikê reş nekira! Ma jin jêre peyda nedibûn? Nizanibûn, ko jin û mérîti, bi zor nabin? Herwekü dibî mérê wê ji yarê wê ciwantir bî jî! Lê kambaxê dil yekî ji xwe re bigri, hemû këmasiyên wî li ber çavan winda dîbin û mérê wê li ber çavê wê reş dibî, nema dixwazî riwê wî bibêni.

"Bere dili bi dil bî û tûrê parse li mil bi..."

Kurdan, ji kevnare de ev gotine. Ji lewra, di vî sedê bîstem de gereke jin û mér bê hevdîn û dilgirtin, hevdî marmekin, yan bizon nedin şokirin! Bi hindikî ji salekê bêtir, keç û xort bi hevra biggerin û hev bibênin û baş qencî û këmasiyên hev nasbikin û paşê hevdî marbikin; wê çaxê gazina wan, tenê ji wane.

Tenê gereke, di wê navê de herdû jî, birûmet û xwegirtî bin; nekevin nav çirava şâsi û çewtiyan û xwe pîs nekin. Û di awira min de, gereke herdû jî, li gewde û bejn temaşa nekin. Mirovên baş û nebaş bi Xo, bîr, bawerî û dan û sitandina anîya. Gereke jin û mér, bicarek guh nedin gewde, laş, bejn û ballê, lê gereke ne bicarek jî, wêran bî. Çawa, ko gereke guh nedin mal û mezinahiya hev. Ji ber ko mal, qireja destaye, tê û diçi. Lê şokirin, di ser her tiştî re ye. Gelek diriste ko mér yan jin, bi bejn û gewde xwe pir ciwan û berbiçav bin. Lê eger di dan û sitandin û bîr û bawerîya xwe ne hêja bin, wê çaxê wê çibkin ji bejn û gewde? Çawa, ko heye gewde ne pir ciwan û bilnd bî, lê di nava xwe de, gelek payebilind û şareza û bîrewer bî! Lê herwekü me

derbas kiriye, gereke gewde jî, ne bicarek wêran bi!

Kurd di anîna jinê de bûne dubendî. Hin dibêjin: "Jinêner werin ji malen mezin, têbidin hezar û hin."

Lê hin dibêjin: Jinêner werin ji sergo, sehûdê bixwazin ji Xwedê." Û ez jî, hevalbendê awira dawî me. Tenê gereke mér li rewş û pergala mala bavê jinê bipirsî, binêrî. Ji ber, ko hin malbat hene ko di nav wan de nexweşî û bûdileyî û gelek kemasîyên civakî peyda dibil û di vê meydanê de gereke ji dekor bipirsin!

Di berdana jinê de gelek kemasî hene. Bi hindikî bêrûmetî û perişanîya zarokan têde hene; di wê çaxê de jin û zarok tevde, diljar û perişan û xemgîn dîménin.

Lê eger hevdî baş nasbikin û dilê wan hev bigri û dekor awira xwe di herdûwan de baş bidi û malbat pak û paqîj bin; ji van nexweşîyên civakî û di bir û baweriya xwe de nézîkî hev bin, wê çaxê, berdan, pir kêm dibî û belki bicarek naménin jî!

Lê ev jî, gelek dijware û bi hindikî çend sedsal jere divê, ko miletê me bighê rêza Ewrûpa. Lê eger em ji dil bixwazin berepêş herin, divê em zor bidin xwendina jinê û destûra wê bidin, ko bikevi nav xebat û keferatê û rist û destûr û qanûnan baş nasbîkî.

\*\*\*

## BESNA XELİL

Yadê, navê min keçikê Besna Besnayê!

Weyla li min porsorê por belayê,

Tenîya Müşê, heşa Helebê di xwe dayê,

Bavê-m xêrê biki bi çavê serê xwe nebînî,

Çawa nedame xortekî ji mala Hesen axa apê Behri

Simbêlsorê ser xaniya, destmala dest lawika

Roja dawet û ayd û şahîya,

Ez dame İbrahimê Temo hirçê Bûbilanî,

Kerqolanê riya Nisebinê, heq ji sîng û berê min dernayê, yadê rebenê!

Besê rebenê!

Yadê rebenê!

Ezê rabim kumekî çêkim bi lîrakî,

Ezê dorekî lêxim bi heqê gakî,

Ezê nivîstekê lêxim bi devakî..

Min digo:

Qey eze bidim serê xortekî,

Ji xortê mala Hesen axa apê Behrî,

Min nizanibû,

Ezê bidim serê İbrahîmê Temo,

hirçê Bûbilanî, kerqolanê riya Nisêbinê

Şahid û şihûdê vî ciwanmîri gelek hene,

Ji çemê Amûdê heta bi lêfê Darê,

Reviya ji ber filakî.

Besê rebenê!

Yadê rebenê!

Navê min keçikê Besê, Besna Xelîle,

Porê min sore nava min qendîle,

Bavê-m xêrê bikî bi çavê serê xwe nebînî,

Çawa nedame xortekî ji xortê mala

Hesen axa apê Behrî,

Ez dame İbrahîmê Temo hirçê Bûbilanî,

kerqolanê riya Nisêbîne,

Hostekê Tifikan û Kulîna.

Besê rebenê!

Besna Xelîl, ji gundê Golê ji nav eşîra Omerîya ye ko dikevî Rojhilate Mêrdîn. Û bêdile wê dabûn İbrahîmê Temo, mezinekî Bûbilanî ko hinek bi nav salan de çûbû. Ji ber ko ne bi dile wê bû, ev istirana ha li ser mère xwe gotiye.

Kerqolan, giyakî bi istirîye, çawa ko navê tebakî ye. Lê di virde, herdû jî diristin. Bûbilanî, eşîreke Kurde, mîr û gernas ko dikevî Rojavayê Nisêbin, ko berî hingî tevlî koçeve Temika, Mîrsînya, eşîra Pînareli bûn.

Pinar, bi Turkî, kanî ye. Malmezina vê eşîrê, mala Xelef axa bûn, ko niha jî hin jî wan li Rojhilate Nisêbinê mane. Herwekû İbrahîmê Temo, miroveki navdar bû, lê ne bi dile Besna bû. Mala Hesen axa,

mala Mele Mistefa ne, ko mezinê Mehmûdkîya ne û ji mala Mihemedê Cizîri ne.

Lê di vê istiranê de, gelek êrîşen xurt hatine ser İbrahîmê Temo, ko dengbejan gotine: "Kerqolanê riya Nisêbinê, hirçê Bûbilanî ji çemê Amûde heta bi Lefê Darê reviya ji ber filakî."

Reva ji ber Fileha kîmanîyeke pîs û giran bû di nav Kurdan de, ji ber ko Fileha nikaribûn li ber Kurdên misilman dest hilênin, yan şer bikin! Tenê du perçe fileh hebûn, ko şeré Kurdên misilman dikirin, Teyarî û Torî, ko herdû jî Kurdin û bûne Fileh çûne ser ola Îsa.

Lê keçika Omerî, dest bi porê xwe kiriye û gotiye: "Li min porsorê, porbelaye!" Belayê, bi daxwaza belavkirin hatiye, yan jî dibêjî: "Li min büye bela"; lê wê çaxê "bela", Erebiye.

Lê xuyadikî, ko Besna Xelîl gelek ciwan û şérîn û porsor bû û porê wê bi ser çavêن wê de belav dibû, yan jî lê bûbû bela û ji heq dernediket, ko bihûnî û şerpeze bi ser dêmêن gûlî de dihate xwar û xwe pê nazdar dikir.

Lê keçika Omerî, li xwe vedigerî û dibêjî: "Tenîya Mûşê, Heşa Helebê di xwe daye!"

Ev nişanên bextreşî ne, ko tenîyê di xwe didin, yan jî Heşa Helebê di xwe didin. Ji ber ko, ew kesê ko bextreşî bi ser de neyên, xwe reş naki! Besna porsor, nazdar nedane yekî li gora dile wê.

Ma ji vê bextreşîye mezintir heye, ko dane yekî, ko naxwazî rûçikê wî bibêni? Yekî weka hirçekî, weka kerqolanekî!.. Li ser bextê Besna û dengbeja dimenî.

Besna, ji "Biseyne" hatiye, ko evîndar ristevanê navdar ê Erebe. Lê Besê, Kurdi ye, ko bi daxwaza "Hemê" hatiye, yanî bila bes keçik ji me re çêbibin! Ji ber, ko di wê çaxê de rûmeta jinan, keçan bicarek tunebû!

\*\*\*

## SİNEMXAN

Ay Sînem!

Te rû heyva nûrîne,  
Şewqê daye ümetê.  
Te gerden şûşa hêşîne,  
Nuqtê nuqte xal ketê.  
Heçî herî Sînem bibîne,  
Bêşik diçî cenevê.

Ay Sînem!

Ezê Hîzanê dihebînim,  
Sale sê cara tê bihare,  
Te rû heyva nûrîne,  
Şems û qemer tê re diyare,  
Ezê herim Sînem bibînim,  
Dîna min û Sînem ev care.

Ay Sînem!

Hingî li dinê digerîyam,  
Kesi nedigo, Sînem nexweşe!  
Ezê hatim Hîzana xopan hicrokê feqîya,  
Dinivîsîn kêl û ferşe.  
Ezê tenbîhê bikim li mar û mişkên mîriya,  
Bere nexun navtenga çarê,  
Sed heyfe li ewraqên reşe.

Ay Sînem!

Sînem koça xwe-b-rêkir,  
Em bixwe mane li şûn wara,  
Rûnişt û kofî çêkir,  
Berdan şirkêd guhara,  
Mi-d-kir Sînem ramîsim,  
Felek bû min neyara.

Birca Sînemxan têde,  
Wê-d navroka behrê da,  
Hat leşkerê dewletê,  
Sê rojan kişiyan pêda,

Min kir Sînem ramîsim,  
Felekê çerxek lêda.

Ev perçê paşî di ber dîlan û bêlote re dibêjin, lê perçê pêşî bi istiran tê gotin.

Ev Sînem, keça Mîre Hîzanê ye û Mîr Mihemed pismamê wê ye, ko di saxîtiya bavêñ herdiwan de li hev markiribûn. Çirok bi vî rengî destpêdikî:

Dibêjin, bavê Mîrmihê û birayê xwe li odê rûniştî bûn û ji wan re hate gotin, ko "jinêñ we herdiwan ketine ber pîrikan", û herdiwan ji hev re gotin: "He-me jina kî ji me keç bêni, bere ji kurê ê dî re bî!" Û lihevrasthatinê wilo çekir, ko diya Mîrmihê kur anî û jina mîre mezin keç anî. Di wê şevê de wan li hev mar kirin.

Lê gelek neçû, bavê Mihemed Beg serê xwe danî û kurik li ber destê apê xwe mezin bû. Û çawa bû xort, xelkê jê re got: "Çima destgirtîya xwe naguhê-zî?"

Lê Mîr Mihemed ji wan re got: "Destgirtîya min kî ye?" Jê re çirok gotin. Lê ape dilovan ji wan re got: "Naxwazim niha jinê li biraziye xwe bikim bela. Bere herî baş bixwêni û icaza xwe wergirî û bê, eze herdiwan bişenîm kelehekê û bere bibî mîre wê hindamê." Çawa ji Mîr Mihemed re gotin, bixeyd ji bajêr derket û berê xwe da nav Badîna û çû xwendinê. Lê heta xwendina xwe qedand û hate mal, Sînem serê xwe danî bû!

Naçare Mîrmihê, bi çolan ket û avête ser dotmama xwe, û dibêjin "Sînem ji evîndarî serê xwe danîye!" Çawa min bihîstiye, ko bavê wê ew nedaye pismamê wê, xeyidye û nexweş ketiye û dawî bi wê nexweşîye serê xwe danîye..

Lê ev istiran, di navbera istiran û ristan de tê jimartin. Lê weke, ko têñ gotin, hersêyên pêşîn istiranın û hersêyên paşîn ristin û feqeh hersêyên paşîn di ber Bêlotê re dibêjin.

Bi rastî di virde gelek torevanî hatiye meydanê û Mîrmihê, ristevanekî navdare û di nav ristevanê kurd de navê wî hatiye danîn û hin ristên wî ji, hatine nivîsandin.

Di virde pir xweş gotiye, ko dibêjî:

"Te rû heyva nûrîne,  
Şewqê daye umetê.  
Te gerden şûşa hêşîne,  
Nuqte nuqte xal ketê,  
Heçi Sînem bibîne,  
Bêşik diçî cenetê."

Heyva nûrîn, heyva çardeşevî ye. Ji ber, ko heyva sêşevî de evîndar, ewriwên yar û dostên xwe weke wê dibênin, hingî ziravin!

"Te gerden şûşa hêşîne,  
Nuqte nuqte xal ketê."

Wekhevîya gerdenê û şûşa şîn, ko nuqte nuqte xal dikevinê? hê kesî nebihîstîye û cara pêşîne, ko dibihîzim.

Ev didî zanîn, ko ristevanî û şehrezayî di Kurdistanê de wê çaxê gavêñ mezin bi pêşde avêtibûn.

Lê, "Heçi Sînem bibîni  
Bêşik diçî cenetê."

gelek giran hatiye, ko Mîrmîhê dixwazî yara xwe weke Xwedê biki û daxwaza wî ji Sînem mecazi ye. Seydeyê Cizîrî dibejî: "Kê dî heqîqet bê mecaz".

Li ser awira olperestan, Mîrmîhê di virde mecaz derbas kiriye û ketiye qûnaxa Fenafilah, xwe di nav Xwedê de wînda kiriye. Daxwaza wî eşkera, Sînem-xanê, lê di bin de Xwedê ye. Xwedê di riwê yara xwe de dibêni, yanî navê Sînem têni, lê daxwaz Xwedê ye.

Ezê Hîzanê dihebînim,  
Salê sê cara tê bihare,  
Te rû heyva nûrîne,  
Şems û qemer têde diyare.  
Ezê herim Sînem bibînim,  
Dîtina min û Sînem ev care.

Yanî ji hersê mehêñ zivistanê pêve herdem bihare. Lê keçika Mêrdînî, xweştir gotiye:

"Sîng û berê min keçikê,  
Mîna baxçekê Zinara Mêrdînê,  
Serê salê sê cara zekata malê Xwedê lê dikeve!"

Lê çawa Zinara Mêrdînê bi nav û denge, hewqas

Hîzan jî, ciwan û xweş û bax û bustanên wê navdarin.

Hin dibêjin, Hîzan û hin dibêjin, Xîzan û hin dibêjin, Hîzan. Tenê di Kurdi de H û H bi hev tene guhartin û gelek diristi, ko Hîzan bî û paşê bûye Hîzan. Lê wê çaxê daxwaz gelek dijwar tê, ji ber, ko Hîz, mirovén tolaz destmehne hatiye. Lê ger ji Xêzan hatibi, bêtir xweşe, lê Farisi ye, bi daxwaza, Payize.

"Tenê te rû heyva nûrîne,  
Şems û qemer têde diyare."

Pir diriste, ko ne wilo hatibi gotin! Ji ber, ko berê carek, "te rû heyva nûrîne" careke dî di pêş de gotiye û "şems û qemer", di heyvê de nayêne xuyakirin. Çawa, ko "qemer" bi xwe heyve, çawa dibi, ko rû "heyv" bî û heyv têde xuyabikî?

Lê xwezi bigota: "Te rû rengê ayîne/ şems û qemer têde diyare"! Wê çaxê gotin nedihate ser. Lê pir diriste, ko ji devê hev şas û çewt guhaztibin. Ji ber, ko yekî weke Mîrmîhê zana û ristevan, nakevi serê min ko wilo bibêji.

"Hingî li dinê digerîyam,  
Kesî nedigo: Sînem nexweşe!"

Nedixwestin dilê wî nexweş bikin; nedixwestin dev ji xwendin û xwendegeha xwe berdi! Lê xwezi jêre bigotana, ko bi saxî Sînem bidîta çetir bû. Ji ber ko bi dîtina Mihê, jîna Sînem direjtir dibû û zû bi zû dev ji dostê xwe bernedida. Û pir diriste, ko bi awireke Mîrmîhê, dilê wê bi xurtî bigeriya!..

Lê Kurd, ji dilxwazê nexweş û miriyan re nabêjin: "nexweşe! yan miriye!" Ji bo, ko dile wan neêşenin, wan xemgîn nekin!..

"Ez hatim hicrokê feqîyan,  
Dinivîsin kîl û ferse."

Di virde tê xuyakirin, ko ji malmezina ye. Ji ber, ko di wê çaxê de û di nav Kurdan de, ko ne mirovîkî malmezin bûna, kîlikîn ber serê wî şeh nedikirin û nedinivîsin!

Lê nizanibû, ko bihara dile wî di payîza Hîzan de hatiye veşartin; nizanibû, ev kîl û ferşen şerîntirînê mirovê ber dile wî ne; nizanibû, gula jîna gulşenga wî pelên xwe weşandine û çîçeka ber dile wî bicarek ziwa û hişk buye... Lê çawa naskir, got:

"Ezê tembihê bikim,  
Li mar û mişkîn mirîya,  
Bere nexwin navtenga çarê,  
Sed heyfe li ewraqên reşe."

Lê gelo mar û mişk bi gotina wî dikan? Ev tişteki dî-yalektîke, ko mar û mişk me bixwin û em jî, mar û mişkan bixwin. Û her weha ev jîn, berepeş gavan tavejî û di ser hevre em têne guhaztin.. Na, na! Hozanê mezin, na! Ev cihana, ko em têde çend salan dijin, bicarek candar û cenawir, ter û hişk hev dixwin û nûjen dibin û dîsa tavejin nav pêlên jînê û dîsa têن guhartin û her weha bê dawî ye..

Gazina jî mar û mişkan meke, ko navtenga çarê bixwin! Wê laşê min û te jî bê xwarin. Bê çilo bi te şerîne, hewqas bi wan jî xweşe; bê çilo tu dixwazî wê bixî nav dile xwe, ew jî, dixwazin wê bixin nav dile xwe! Bere bixwin, noşican be! Lê rebena! nizanim kî wan dixwî? Bê çawa ew, me dixwin, wilo jî, em wan dixwin! Bê çawa bi xwarina me dilxweş dibin, wilo jî, bi xwarina wan em dilxweş dibin, û her weha ta dawî.. Lê dawî li kuye, nizanim? Ev jîn, ev cihan bêdawî ne. Çawa, ko bêdestpêkin jî. Lê, çiye, çawa çebûye? tev nexuyayî mane. Û niha em dixwazin herin nav van sitêran bigerin, belkî bighêne tişteki, ko dilê mirov pê xweş bibî, bikevî ci. Lê emê wê çaxê nebênin...

Lê piştî, ko hişê wî hatiye serê wî, dest bi felsefê kirîye û gotiye:

"Sînem koça xwe birêkir,  
Em bixwe mane li şûn wara."

Heval! Em li şûn warê hîna mane û hin jî, li şûn warê me dimênin! Destûr û rist û qanûna jîndarî û cihanê her û her evin. Ezbenî! Dixwazî ramisanekê ji yara xwe bistêni, le Felek dijmîne, nahêli, ji lewra

dibêjî:

"Min dikir Sînem ramîsim,  
Felek bo me neyare."

Ma Felek, yarê kê ji me ye? Dijminê Feleke, kengî biser xwe tê? Lê carekî dî li xwe vedigerî û dibêjî:

"Birca Sînemxan têda,  
Wê di navroka behrê da."

Ca nizanim, ne di nav Gola Wanê de bircek jêre ava kîribûn, yan ji, di navroka Çemê Hêsetê de hatibû avakirin? Lê navrok, gereke di nav çeman de bin. Ji ber, ko ro bi daxwaza çeme. Lê bi gili û gazin dibêjî:

"Min dikir Sînem ramîsim,  
Felekê çerxek lê da."

Lê di virde, mîrê hozan qelsîti kiriye. Gereke weke Siyamend rahiştâ çipa deve û biçûna şerê Feleke! Lê dizanibû, ko dijminê Feleke biser xwe nayê û dawî pişta wî dikevî kelemekî dijwar û serê xwe ji mirinê re xwar dikî. Lê çawa hebi wê, ji me re pey xwe de serpêhatîyeke mezin di nav rûpelên tarixê de bihiştâ...

Lê koçerê miran, ji min re ev serpêhatîya "Sînem" bi awakî dî dane zanîn, ko dixwazim di virde bidim xuyakirin.

Dibêjin: "Sînem keça melakî bû û mîrê wê cû seferê û jina xwe siparte du mirovên xwe, ko lê miqate bin, çavdêriya wê bikin. Tenê herdû mirovên bêbext, xwestin ko li dor jinikê bigerin, lê Sînem xwe bi desten warî ve berneda û çawa mîrê wê hate mal, jêre gotin: 'Jina te tolaze û em şermîkar û rûres kirin'. Hawir xelk li dor digerîyan û naçare mîrik Sînema jina xwe kuşt û diya wê, li ser ev çend dîlokên dawî gotine:

Sînem dure di behrê da,  
Emê rabin destek xewas bigrin berdin têda,  
Çibkim destê min gihabû miradê,  
Feleka malikwêran çerxek lê da!

Sînem, tu rabe ev çi deme!  
Bejin ji Kela Tikrîtê, sîng qumaşê Eceme,  
Bere bixêr bêyî mehka remezanê,  
Ez fitreka serê te me!

Sînem gulçîçeka li çiyayî,  
Şewqa xwe daye gér û giyayî,  
Heçî kesê Sînem nedîti,  
Bere binêri rengê birayî!

Sînem! Ezê dinêrim li Bexdayê ezîme,  
Min du şahid hene îsal heft sale,  
Lawik seferî bû, Elixê reş kil nedîne!

Belkî ev jî, ji ristên Mîrmihê bin? Lê destê deng-bêja, ew ji hevde xistine. Çawa, ko di hin ristan de nexwêş hatine danîn; dawî û kêşan tevlîhev kirine. Çawa, ko çirok bixwe hatiye guhartin, belkî jî, bi Sînema keça Mîrê Bota hatibi guhartin. Lê di hin ristan debihna ristên Mîrmihê jê tê. Lékolanek divê, ko bighen dawîya serpêhatiyê!

\*\*\*

## EYŞANA MİRZA BEGË

Eyşan! Eyşan!  
Xinus xweşe Bingol di berde,  
Bere Şûşan bişewitî Turkman bi serde.  
Te dile min evdalê xwedê kiriye mîna  
behra Wanê, cî û meskenê kul û derda.  
De hay, de hay! Eyşan hayê...  
Wer Eyşanê!

Eyşan! Eyşan!  
Naçim Mûşê bi dikane,  
Sîng û berê Eyşana Mîrza begê  
mîna zîvê Sewadê, bi zér kildane.  
Çawa sala par vî çaxî Eyşana Mîrza begê  
dosta rih û canê min bû, li mala bavê xwe bû,  
Sala vê salê, ketiye bin darê Ezîzxane.  
De hay, de hay! de hayê!  
Wer Eyşanê!

Eyşan! Eyşan!

Bihare lezke rabe ser xwe!

Tê navê Xwedê û Pêxembera dihebîne,  
Kilê subhani û neynikê deyne ber xwe,  
Min sünd xwariye heta bejna bilind,  
çavên belek li darê dinyayê saxin,  
Ezê navê rewacê nabim ser xwe.

De hay, de hay! de hayê!

Lê wer Eyşanê!

Ezê dikim nakim têr nabim,  
Ji galgalê, ji gotinê, ji awirdanê,  
Sîng û berê Eyşana Mîrza begê,  
mîna cotek sêvê Xelatê li ser dikanê,  
Lê li sûka Wanê.

De hay, de hay! de hayê!

Lê wer Eyşanê!...

Di virde navê Eyşanê û bavê wê û mîrê wê û  
gund û bajaren wê, hatine zanîn. Lê mixabin, ko na-  
vê dostê wê-Lawîkê Serhedî-, nehatiye xuyakirin. Lê  
bi rastî dengbêj, di virde gelek pesnên ciwan bidar-  
vekiriye. Weke, "Sîng û berê Eyşanê" kirine Sêvê  
Xelatê li ser dikanê sûka Wanê û carek kirine weke  
zîvê Sewadî bi zér kildane...

Zîvê Sewadê, navdare, ko bi kil kildidin. Lê vî  
mirovî xwestîye, ko bi zér kildayı bin. Ji ber ko zér  
ji kil bêtir birûmete.

Dilê xwe kiriye weke Gola Wanê. Lê Behra Wanê,  
cihê seyran û havingeha xelkê ye. Tenê dilê Lawîkê  
Serhedî, cihê derd û kul û perişaniye.

"Naçim Mûşê, bi dikane,  
Sîng û berê Eysana Mîrzebegê,  
Mîna zîvê Sewadê bi zér kildane."

Xuyaye, ko ev reng zîvê bizêrkildayı li bajare Mûşê  
çêdikirin. Lê zîvê bi sewadê Kildayı min ditiye. Di-  
bêjin, çekirina Mûşê ye! Kember, bazin, xîlxal û  
gustîlén keçikên xanedan û malmezinan bizêrkildayı  
çêdikirin. Çawa, ko mîran jî, qeftê xenceran, qame,

şûran, qûndaxêن tiving û demançan, riwê saeta, serê cilak û qamçî û zencirê saetan bizerkildayı çedikirin. Herwekü sênîyêن xwarinê, kevçî, tas û qutiyêن cigare, tirekên cigarê û gelek tişten dî ji, bi zêrav, zêrhel çedikirin, kildidan. Herwekü ev reng dezge li bajarê Wanê peyda dibûn, ko bi destê xwe çedikirin û pirê wan di destê Filehan de bûn. Ji ber ko Filehêن me dezge digerandin û çek hilnedigirtin û şer nedikirin. Tenê cotar û karker bûn; ji mîrek û beg û malmezinan re dixebeitin.

Herwekü ev, di çaxa koletî û bindestîya Filehan de dibûn. Lê çima Kurdan çenekirin? Ji ber, ko Kurd leşkerê mîr û beg û paşa û axayan bûn, nikaribûn yan ji li xwe danetanîn, ko vî karî bikin. Ji ber, ko ev kar û hemî karêñ dî ko bi destan çedibûn. Ji leşkerê Kurd re kemasî bûn, ko tenê tîravêji, şûrbazî, avjenî, siwarî, tivingavêjî karê şervanêñ Kurd bûn. Lê kirin û firotin û dezgeh û cotkarî ji kurdan re şerm û fehêtkarî bûn. Lê tenê dikaribûn, pez xwedî bikin û hespan bikirin û bifiroşin û şûr û xencer û tîr û kevan û tiving û rext dikaribûn bikirin û bifiroşin. Ji lewra çawa Kurd bûne gundi û dest bi cotkarî kirin, bûn wek filehan û nikaribûn li ber koçeran dest hilênin û naçare xwe dane ber siya paşa, mîr û began û günden xwe sipartin wan û tenê bi cotkarî di gundan de rûniştin. Lê dîsa, hineki di ser Filehan re bûn û zor û setem li wan dikirin û male wan dixwarin.

Tenê ev der, ne cihê vê dabaşê ye. Ji lewra emê dev jê berdin. Reben xortê Serhedî weke Keyxesro Ezîzxan, Eyşan ji xwe re biriye û lawik li ser har û dîn bûye.

Cizîri dibêjî:

"Xesro gi zanîлезета işq,  
Ji Ferhadê bipirs, sira Şérînê."

Ezîzxan ci zanî qîmeta Eyşanê? Ji lawik bipirsin, sira Eyşanê! Lawikê Serhedî, bi vê sirê zanî. Ezîzxan ci zanî, ko hinek hene ko piştî çavê Eyşanê, mehra jina li xwe heram kirine û roj û şev li ser axîn û kesera dikşenin. Û dilê wî bûye weke pingava Wanê, cihê

kul û derd û keseraye.

Belki Ezîzhan ji Eyşanê dilsar bî û dijûn ê çérân  
jê re dibejî û poz pê naki û diçî li dor jinêñ gundiya  
digerî? Ma kî dizanî, ko di çavêñ hinekêñ dî de pa-  
dişah û pîroze, Ezîzhan her şev di nav sîng û berê  
wê de radizi? Lê reben xortê Serhedî, tenê dixwazî ji  
xwe re meger ji salê carek bî jî, çavêñ reş bibêñî û  
dibejî:

" De were, were, were wer! wer Eyşanê!

Dikim nakim têr nabim ji galgalê,  
ji gotinê, ji awirdanê."

Ma kî ji awirdan û gotinêñ yara xwe têr dibî? Kes ji  
vê cîhanê têr nabî û roj bi roj xweşîr dibî, şerîntir  
dibî. Lê bîrewerîya mirovên talanker, xwedîmal, xwe-  
digund, xwînmij negihaye hember xweşîya cîhanê; ne-  
gihaye hember pêşveçûna jîngari û dezgeh. Em di  
balafiran de çend hezar kilometir bi ber ezman ve bi-  
lind dibin û hezar kilometir bi saetekê tavejin û bi  
gernasî diser hewran ve diçin. Lê çawa têne mal, ni-  
karin kîlokî şekir ji zarokêñ xwe re bikirin. Me ev  
ne tişten kesnedî ne? Ev mirovê, ko weke dêwê sipî  
di ser hewran ve diçî, nikarî bihayê kîlokî şekir  
peydakî?

Ev, hemû ji destê mirovên xwînmij û talanker û  
tênenxwar, ko dizanin mal bidin hev û dixwazin male  
cîhanê bicarek bixin qasa xwe û bere her û her  
belengaz ji birçîna bimrin! Lê di meydana wekhevî  
de, nikarin gavekê berepêş bavêjin!

Lê naçare gereke em li berxwe bidin û bi xurtî  
bighen doz û daxwazên xwe; bighen wekhevî û miro-  
vanî û xweşîya cîhan û mirovan. Naçare gereke em  
zora van faşist û dijminêñ mirovanîye bibin û ji vê  
cîhana xweş, şer û talan, zordestî, çavşorî û pîsîtû-  
riyê winda bikin û wekhevî, biratî, dilxweşîye bixin  
şûna wan û serbestî û evîndarî li ser riwê vê sitêrkê  
belav bikin, ko mirovên weke Ezîzhan, nikaribin dos-  
tên dilgiran bi zor û pera bistênin..

\*\*\*

## GEWRE

Lêlê Gewrê, kubarê!  
Navê kanîka gundê me Bîrîna,  
Xwedê hebî jê avê bikişîne,  
Bi gumguma, bi misîna,  
Kûzî girane, avrazî bilinde,  
Mile zerî-kubara min têşîne.

De hay Gewrê!  
De hay Gewrê!  
Tu bermalya min bî lê!

Lêlê Gewrê kubarê!  
Sêrtê sed carî bi min Sêrtê,  
Xelka mine têlî, serê sibehê  
bi tena kirassê melesî ji avê tê,  
Ezê bala xwe didimê çiqa kirassê melesî  
lî bejnê tê.

Ca ramîsanekê ji dêmê gulî,  
Çavê reşbelek li min keremke,  
Wê çaxê mirina malixerab di bîra kê tê.  
De hay Gewrê!  
De hay Gewrê!

Tu bermalya min bî lê!

Lêlê Gewrê, kubarê!  
Ezê navê te nasnakim gazî dikim:  
Filan û bêvan!...  
Sîng û berê xelka mine têlî,  
Minane bexçekê gulan û sêvan,  
Dê ji xêra mala xwedê re,  
Şevekê ji şevê çile-kanûnê zivistanê,  
Ezê di ber sîng û berê xelka têlî de  
bibûma mîvan.  
De hay Gewrê!  
De hay Gewrê!  
Tu bermalya min bî lê!

Lêlê Gewrê, kubarê!

Ev payîze çaxê maşan û debrê,  
De tu rabe, emê du qam limêja sibehê bikin,  
Berê xwe bidin paşayê kerem û sebrê,  
Belkî nehêlî hesreta çavê reşebelek,  
Bi min evdale xwedê ra here qebrê.

De hay Gewrê!

De hay Gewrê!

Tu bermalya min bî lê.

"Kuzî girane, hevrazî bilinde

Milê zerî kubara min têşîne."

Didî xuyakirin, ko gundê wan li serê çiyê û kanî  
li binê newalê ye; tenê, ne çiyakî bilinde, belkî hev-  
razekî bilinde. Hevraz, serjoreke.. Naxwazî avê bi  
kûz bikşenî, ko milê gewra wî neeşin û navê kanîya  
gundê wan Bîrîna ye û av lê naherike. Herdû ji,  
gundi ne, Ne Serti ne lê, Sert, bajare wane.

Lê çîma gotiye: "Sertê sed car bi Sertê!" Ji ber,  
ko bajare wane, gelek jê hezkirîye. Lê pir xweş ki-  
riye, ko dibêjî: "Ramisankê li min keremke, / Mirina  
malixerab di bîra kê tê." Ev raste. Dema, ko dost û  
yar digihêne hev, mirin nayê bîra wan. Jixwe sermi-  
yanê mirovan ciwanîye, xweşî û serbestî ye..

Jîna ciwanî hemû bihar bû,

Weşim ci xurt bû, hişim şiyar bû.

Herkes dixwestim, tenê tu yar bû.

Ji bo te jîna xoş û ciwanî,

Hemî me borand bi dilgiranî. (*Cigerxwin*)

Bi serbestî bijîn û jîna xwe ya ciwanî badîhewa  
bermedin û belaş mavêjin. Ev tirs û sawîr ji ber ne-  
xwendina me ne.

Bijîn serbestî, gerdenazadî,

Bijîn dilxoşî, bijîn bi şadî.

Lê nizanim, çîma dibêjî?

"Lêlê gewrê kubarê!

Ezê navê te nasnakim,

Gazî dikim "filan" û "bêvan"!

Gelo raste, ko navê gundiya xwe nasnakî? Na. Derewa li xwe diki! Lê pir diriste, ko bi gelek navan bankiriye! Ev jî, ji şiraniye û delalî ye, ko navê dosta xwe hilnadîn.

Lê eger nasnakî, çilo pesnê sîng û berê gewra xwe didî û dibêjî: "Sîng û berê xelka mine, têlî kaleboze gewrin, sipî ne,/ Mînane bexçekê gulan û sêvan."

Xwelî li bexçê gul û sêvan bî, ko weke bexçê sîng û berê gewra wî bin! Milyar gul ne hêjane lêvên sor û sed milyar sêv ne hêjane ferek ji memikê yara mirov û nabin bihayê ramisanekê.

Lê xuyaye, ko gelek dijware ko karibî şeveke tenê jî, bikevi nav bexçeyê gul û sêven yara xwe. Ji lewra gotiye:

"Xwezi şevekê ji şevêن çile kanûnê zivistanê,  
Di ber sîng û berê xelka têlî de bibûma mîvan!"

Lê pir xwes gotiye ko binav kiriye, "şevêن çile kanûnê zivistanê". Şevêن çile, ko ji kanûnê zivistanê mirov bikevi nav sîng û beran, dewleta bavê mirove. Hingî ew şev sarin û mirov bekare! Tenê dixwazî dosta xwe bişev bibenî û di nav sîng û beran de xwe germ bikî û herkes dixwazî, di wan şevan de di ber sîng û berê jina xwe de rakevi. Di wan şevan de kes li kuç û kolanan nagerî û dizê sîng û beran, dikarin serbestî, bêtirs û pirs bikevin nav sîng û beran.

Ber, bi daxwaza pêşîr hatiye gotin, yan jî, fêki ye. Ne ko bi daxwaza kevire. Lê xuyaye, ko bi xweziya tiştek neketîye destê wî, ji lewra berê xwe daye Xwedê û dibêjî:

"Ev payize çaxê maşan û debrê,  
Tu rabe emê du qam nimêja sibê bikin,  
Û berê xwe bidin paşayê kerem û sebrê,  
Belki nehêlî hesreta çavê reşbelek,  
Bi min evdalê Xwedê re here qebrê."

Li welatê jorî, di payîza de herkes dixwazî barxana xwe deynî û lawik jî, dixwazî di vê payizê de du

qam nimêj bikî, belkî Xwedê nehêlî hesreta ramisanê çavê reşbelek pêre herî qebrê! Lî xuyaye nebihistîye, ko dibêjin: "Bide aqçe, here nav bexçe". Xwedê ji, bê aqçe nahêlî tu herî nav bexçe! Xwe rûsar meke û hêviya ji Xwedê meke! Dirav û derew, gernasî çek û alavê evindara ne! Bi xweziya, nagrî baqê keziya! Devê tirsoneka nagihe bin guher..

Lê bi rastî, xwes gotiye..

\*\*\*

### Perçê Heftem: LAVIJE BOTAN

#### LAVIJÊ BOTAN

Çiyayên bilind xalî nabin,  
Ji mijê, ji moranê,  
Kevîyên biçük pala xwe didanê,  
Qentarê kul û xeman birêket,  
Lê ê şahîyan li nêvê rê gihanê..

Şevêن ciriyân direjin,  
Xewa min nayê,  
Bist û pêwir bilind bûne,  
Qurix li min hate qayê,  
Xwedê birînêñ kurilavêjê  
min kûrin derman li wan nayê.

Ezê li dîwanê fikirîm,  
Dîwan ne temame,  
Qehweçî qehwê digerêni,  
Bi fincan û came,  
Ezê çavêñ xwe digerênim,  
Herweku bûye Misr û Şame.

Dilo kovandaro!  
Emê pîr bûne û tu pîr nabî.

Dilo minê divêne tivingeke berwec,  
Cotek dermanê du aşivan bihevre dayê,  
Wextê serê min diçî ser sitehrike,.  
Jî min weye nêriyê pezkêviye,  
Lê çawa dibeziime, Evdalê gulî berdayî.

Lo dilo kovandaro!  
Emê pîr bûne û tu pîr nabî.

Herwekü dizanim, "Lavêjê Botan" ne ev tenê ye.  
Lê ev, min ji devê hevaleki kevnemêre koçera sitan-  
diye.

Lavêj - lavij, lawik in. Lawik bûye lawiç, bûye  
lavij. Awayê istirana Lavij, weke Ewrûpayê gelek  
nerm û direj dibî; weke nehwirandina jina ye û olpe-  
restiye..

Herwekü, keşakî Torî, lavijek bi kurmancî  
çekirîye û gelek xweş çekirîye. Û gelek caran min  
bihistiye. Lê vê paşîye hina guhaztine Suryanî û ye  
kurmancî hew dikevi destê me.

\*\*\*

## ESMER Ü GEWRA

Gewran digotin esmeran:  
Em ji we çêtirin,  
Em bejin bilndin  
û guhar ji almas û durin,  
Em şevê tarî zivistanê dibin,  
Ebayên xortan de diveşirin.

Esmeran bakirin gewran û gotin:  
Em we nakin gelî xwehan em we nakin!  
Emê di taxa jorî û jêrî ve,  
Biçin û beniyên xwe li bakin,  
Emê mirîyên heftê sale ji mar û cebana,  
Ji gornistana bi awira rakin.

Gewra gote esmera, belane  
Emê gewrin em şerînên ber dîlane,

Em bi herkesî razî nabin,  
Lê babetê mîr û şêx û melane.

Esmera gotin: Ji esmera em esmeren tarîne,  
Bejna me bilinde û gerdena me mirarîne,  
Em ne babetê şêx û melane,  
Lê em babetê xundekarîn rûsipîne.

Ev istiran, ji kevnare de heye û pîrê caran sofî dibêjin. Herwekû ji "Lavij" têne jimartin? Lê bi rastî, ne lavij in, serbixwe ne. Lê xuyaye, gelek kevnare ne. Çawa, ko ev Avêtinaberînev e. Felsefa jîngariya jînên ciwane, ko hin ji Kurdan, ji gewran hezdikin û hin ji, ji esmeran hezdikin û her alîkî dibêjin: "Daxwaza me ciwan û rind in". Herwekû tê xuyakirin, ev reng istiran, di nav şêx û melan de dihatin gotin. Ji ber ko şêx û mela naxwazin istiranê ko di biwara şer û gernasa de bî, li nik wan bêne gotin û dixwazin rîndîya jinan zanibin û guhdarî bikin! ku felsefa ciwanî têde heye. Ji ber ko, ji rîndî û ciwanî hezdikin.

\*\*\*



---

BES'2



The logo consists of the word 'BES' in a bold, sans-serif font above the number '2'. The '2' is also bold and larger than the letters. On either side of the text is a diamond shape composed of diagonal lines forming a zigzag pattern. These diamond shapes are positioned on a horizontal line that extends across the width of the text.



## AVÊTINASER YAN ŞER Ú SERPÊHATÎ

Daxwaza me ji nivîsandina van "Ser û Serpêhatî û İstiranî" eve, ko em karibin sergejî û bextreyên miletê Kurd deynin berdestê wan mirovan, ko dixwazin di pêşîya miletê xwe de çend gavan di meydana rezanî de bi pêşde bavêjin; da wekû karibin raborîyên miletê xwe bi rast u dirist nasbikin û careke dî ew jî, nekevin nav çirava çewti û şâşîyan; da em karibin bidin zanîn, ko miletê Kurd ji kevnare de di Kurdistanê de bi gernasî 'i berxwe daye û serê xwe ji kesî re dananiye, yan herwekû dibêjin: "Heta serê xwe nedaye şikandin, besa xwe nedaye".

Herwekû em dixwazin folkloren xwe yên kevnare di vê nivîstê de bidarvekin û ji nav toza wîndabûn û guhnedanê, van gewheran paqij bikin û di nav rûpelên tarîxê de bidin xuyakirin, ko di nav zimanên cihanê de zimanê me jî, ji xwe re cîhekî bilind û hêja bistêni. Meger çendan, ko em ne mirovên ko karibin vi barê giran hilgirin yan dibin de rabin?

Lê hozan bicarek naxwazin, ko di nav kerwanê kîferata welatperwerî û mirovanî de destvekirî bimênin. Ez bixwe jî, ko yek ji bîrewer û hozanê miletê Kurd im, navêm, ko di nav kerwanê welatperwerî û mirovanî de destvala bîrêkevim! Herwekû hêvidarim, ko ev karê me jî, ji xebata welatperwerî û mirovanî bêñ jimartin.

\*\*\*

## EHMEDÊ HECÎ EVDILA

Mala Hecî Evdila, mezin û axayê eşîra Rema ne. Ev eşîr, di bin siya hindama Kercosê de ye û li ser herdû rexên ava Çemê Dicle rûniştî ne. Ev eşîr ne gelek mezine, lê bi mérani deng daye û mala Hecî Evdila gelek caran li ber pozê dewletê rabûne û karê dijwar di riwê leşkerê dijmin de kirine û pirê wan, bi destê cendirman û leşkerê Turkan hatine kuştin. Lê ev Ehmedê Hecî, tenê bi destê dijminên xwe hatiye kuştin û istiranek li ser hatiye gotin, ko Meryemxan di Qawana de dibêjî:

Yadê sibeye, sibe sar tê,  
Dengê mawzerên mala Nêşir çarnikar tê,  
Çardarê bavê Emin berbi mal tê..

Ji vê pêve jî heye, lê ez nizanim bêjim. Ji zariwên Hecî Evdila ên navdar, ko navê wan nasdikim, Ehmed, Mihemed, İbrahim, Evdirehman têne ber çavan. Ehmed, bi destê mala Hesiwê İbrahim - mezine mala Nêşir - û leşkerê Turka hatiye kuştin. Herwekû tê xuyakirin, di dawîya Sedê Nozdehan (19) da hatiye kuştin û du kur bi navê Seid û Emin jê mane. Seid ji Eyso û Emin jî, ji Perixan bûn. Tenê Perixan, pişti kuştina Ehmed, tiyê xwe markir û çend kurên dî jê çebûn, Misto, Emer, Evdila, Eli. Lê İbrahim jî, bi destê cendirman hate kuştin û Perixan jînbî ma û navê wê bi mérani belav bû û navê zarokên wê li ser navê wê dihatin naskirin, Eminê Perixanê, Mistiwe perixanê..

Perixanê ji wan jinêñ Kurde, ko pêlakê mezinayı kiriye û ketiye zindana Diyarbekrê jî. Lê zariwên Perixanê her pênc jî, bi destê Turkan hatin kuştin.

Eminê Perixanê, di şerê sala 1925 de hevalbendê Turka bû û bi çend alahi leşker ve çûne ser mala Quto û Belekan. Lê leşkerê Kurd, leşkerê Turk bicarek winda kir û Emin û çend peyayên xwe bi hezar dijwarî reviyan. Dewleta Turk, bakire Mala Quto û hin leşker da wan û şandin ser Emin. Lê Emin reviya û hate nav kurdên Cizirê û xwe avête nav dewleta Firansa û bû yek ji destikên Civata

Xoybûn. Lê di sala 1927 de Emin axa, careke dî çû nav dewleta Turkî û hemî veşartiyêن Xoybûn ji serkarê dewletê re gotin û İbrahim Telî (Lênerê Tevayı) li Diyarbekir gelek rûmeta wî digirt û Emin gelek ziyan gihadîn mîletê Kurd, heta birayê xwe Evdila bi destê dijminên xwe (Turkên xwînrêj) da kuştin û çend mirovên hêja pêre xistin bin axê. Ü dawî de, Emin ji, hate kuştin. Lê çawa hate kuştin, gereke em bibejin:

Çawişek û çend cendirme hatin mala wî û gotin: "Cendirme qumandarı te dixwaze Qubînê û tenê bi me re bê". Emin, destvala dide pêşîya wan û çawa gihane ber çem, xwest ko qundera xwe vekî, hema tevlî qunderê wî dibezînin nav avê û çawa derbazkirin, birin nav kavîlê kevnebajare Erzen û di nav kavîla de kuştin û destek tiving berdan û gotin: "Şukrî kurê Emin, hatiye pêşîya me û bavê xwe kuştîye"!

Bi vî rengî, bav kuştin û kur fermanî kirin. Ü naçarê Şukrî, bi çola ket û dawî hate nav Kurdên Cizirê, binya xete.

Ji Emin, Şukrî, Huseyin, Seîd, Hesen û Osman -pênc kur- man. Diya Şukrî, ji mala Hesenê Hecî Wezrînî bû. Lê diya vanê dî Wesîle, keça Evdirehman -kurê Hecî Evdila bû, ko dixwest şûna Perixanê bigiri! Lê mala Hecî rê nedanê û xwe bixwe berberîya hev kirin. Li viyalî avê zariwê Mihemedê Hecî, Sebri, Xelîl û Cemîl, doza axatîya Reman dikirin. Lê ye-ki ji wan weke Emin deng nedaye û nehiştin Wesîle, weke Perîxan axatiyê biki.

Zariwê Mihemedê Hecî, Sebri, Xelîl, Cemîl nasdi-kim. Sebri pişti şerê mezîn ê pêşî, bi destê leskerê Turkî hate kuştin. Lê Eli, li Diyarbekir Turka ew bidarvekirin û Evdila li ser destê Emin, bi gulên Turka digel yazdeh (11) mirovan hatin kuştin.

Herwekû birayê Emin, Seîd, bi destê Misto hate kuştin û çawa Seîd hate kuştin, Emin jîna wî Wesîle markir û ji Şukrî pêve zarokên Emin, hemî ji Wesîle çebûne.

Lê bi rastî, kuştina Misto û Emer hêjaye, ko mirov bidi zanîn. Misto û Emer, serê dewletê gelek eşandibûn û tim xerabî, sergejî di riwê dewletê de

çêdikirin. Carekê Emer kincê derwêşan li xwe kiriye û çuye zindana Diyarbekir û bi diyarî diya xwe Perîxan ketiye û di hindirwê qutîya cigare de sed zér dane diya xwe û Perîxan, ji nuvê ew naskiriye û jêre gotiye: "Derwêş Xwedehebi! Tê iro ji bajêr derkevî û herî nav Rema û ji xelkê me re bibejî, Perîxan silava li we diki!" Û naçare Emer derket. Çawa ko digotin: "Emer û Misto, li serê ciyê bûn û bi şev dihatin nav gund û ji gundi û leşkerê Turkan re li def û zirnê dixistin û kesî ew nasnedikirin. Ji ber ko, du mirovên keçel bûn, ko nediketin çavê mirov. Lê Turkan, çawa fermana Ermenan rakirin, kuştin û guhaztina wan sipardin van herdû mirovên xwînrêj û keleş. Û rojekê di nav kerwanê Ermenan de, herdû jî kuştin û laşê wan jî windakirin.

Zariwên Evdirehmanê Hecî: Ez, zariwê Evdirehman baş nasnakim, lê digotin, dawîya jîna xwe dîn bûye. Tenê du keçen wî navdar hebûn, Wesièle û Meyase, ko Wesièle dabûn Seîdê Ehmed û piştî kuştina wî, Eminê Ehmed, ew markir. Lê Meyase, jîna Eliyê kurê İbrahîm bû û piştî bidarvekirina wî, Şukrî kurê Emin ew revand û li riya Hecê Meyase sere xwe danî û Wesièle birîn bû û navê zariwên Evdirehman nehatine xuya-kirin.

### Kuştina Seîdê Ehmed:

Seîd û Emin, herdû kurên Ehmedê Hecî bûn. Çawa İbrahîm hate kuştin, Seîd bû axayê Reman. Lê ji ber, ko diya wî, Eyso, eziidî bû, ne ji mala Hecî Ev-dila bû, Perîxan, kurê xwe Misto-kurê İbrahîmê Hecî lê deger kir, ko bikujî û axatî ji zariwê re bimêni! Û rojekê Seîd û Misto bi hevre dicûn cîkî, ji paşve Misto, tiving xiste pişta Seîd û berda. Lê çawa Seîd ket, ji Misto re got: "Misto! Li xwe miqate be! Dij-min ketine riya me!" Lê Misto jêre got: "Kurê ..... min tu kuştîye! min!

Li ser zimanê Eyso û Wesièle, dengbeja istiranek li ser gotine:

Eyso digo, Wesîla! lê lawo!  
Bejna Seîdê min zirave,  
Kulîlka vê Sibatê,  
Bere şîn nekira li şikefta xopan,  
Li serê late!  
Misto! Lawo! Tu ocaxî korbî!  
Te li me windakirî gulçiçeka nav civatê.

Wesîla digo, Eyso rebenê!  
Dilê min heye, sed carî bi min weye!  
Tu rabe, emê teyara binya mala,  
Ji ciwanîkê bavê Ehmedê min re bikin ceye!  
Ezê neketime xema kuştina bavê Ehmed,  
Kuştin, kuştina mîra ye, dayê!  
Lê ezê ketime xêma wê xemê,  
Xelkê, siba bêjin: dîlê Wesîla û Misto  
dihev heye! Dayê!...

U ji ber vê yekê, pişti kuştina Seîd, Emin mar kir.  
Lê Emin ji, ji Perîxanê bû û ji wê rojê de dijminahî  
kete navbera zariwên Ehmed û zariwên İbrahîm û çawa,  
ko tev li ser mezinahîya eşîrê bû. Her yek di-  
xwest, ew male mîletê Kurd, male eşîra xwe bixwî.

Lê ew Ehmedê kurê Seîd, xuyaye ko serê xwe da-  
niye û mezin nebûye. Mala Hecî Evdila, ji Seîd pêve,  
tev bi destê Turkan hatiye kuştin û kurekî Cemîl bi  
navê Evdila, bi destê Turkan hate kuştin. Lê Cemîl,  
li binya xetê serê xwe danî û mir...

Lê serpêhatîya İbrahîmê Hecî, gelek hêjaye ko mi-  
rov zanibî û hêjaye ko rojekê bikevî nav filimê sîne-  
ma.

Divabû, ko em serpêhatîya İbrahîmê Hecî di nav  
perçê diwem de binivisin. Lê ji ber ko, em, niha di  
cabaşa mala Hecî Evdila de ne, dixwazim bi ser wan  
ve bidim xuyakirin.

İbrahîm, kurê Hecî Evdila ye, ko malmezinê eşîra  
Rema ne û di wê çaxê de navbera mala Hesen Şemdin-  
mezinê Dekşûrya- û mala Hecî-mezinê Reman- gelek  
ne xweş bû û mala Hesen Şemdin, tim xwe bi dewletê  
ve girêdidan û dijminê xwe bi alîkarîya dewletê dişî-  
kandin. Herwekû di wê çaxê de, mezinê Dekşûrya  
Yûsivê Axê bû, ko gelek deng dabû û Yûsif,

dixwest kesî navdar ji hindama Dekşûra de, di hindama Kercosê de nehêli, ko karibî Rema, Hesarya, Hebizbiniya, Mihelmiya bixî bin siya xwe.

Ü ji bo vê yeke, jinek bi serdarê cendirman re gotin, ko İbrahim bikuji; ü hin dibêjin: "Bertîl kiriye?" Lê Nadir Çawîş-serdarê cendirman-, ko bixwe ji kurdên hêla Licê bû, şev û ro li kuştina İbrahim digeriya û heftê-heştê siwar pêre û tim li pey şopa Axê Reman digeriya.

Lê rojekê İbrahim, bi birek peya ve di ava Çemê Dicle derbas dibûn; lê hêj derneketibûn derive, cendirme hatîn ser avê û Nadir Çawîş, bi dengekî bilind û bi zirt û fort gazikire İbrahim û got: "Axa! Axa!. Mereve! Mâ tê bi kude herî! Ev çend salin, ko şev û ro ez li te digerim!" İbrahim Axa, siwarê hespekî boz bi kumê kolos û şal şap, qerepotin di lingê wî de, qamakî direj di berde û di Çemê Dicle derbas dibû. Lê hevalen wî tev bi tiving û peya bûn û derbas bûne wiyalî çem û dixwestin herin şikefta gundê xwe.

Lê Nadir Çawîş, ko ji xelkê Licê bû, papaxakî reş li serê wî, siwarê hespekî reş, qerepotîneke reş di lingê wî de û kincê reş ê cendırma lê bûn, ko xeteke sor li herdû rexên pantilonê wî bû, yan jî qeytaneke sor bû; simbelên reşebadayî û heftê-heştê cendirme pêre gihane devê avê û bi dengê bilind wilo ji Axê re got.

Lê İbrahim, gelekî ji vî dengê wî xeyidî û bi hêrs gazi kir û got: "Kuro! Qûnbicilik! Tu zirta li min diki. Heme çarika jina wî li serê wî bî, ji min û te ê ko birevi!" Axê wilo got û serê hespê xwe bi hêrs vegerande nav ava çem û got: "De tu merekî çeye, xwe bigre vaye ez hatim te!"

Lê ji ber ko Nadir Çawîş ji kurdên Licê bû, paxav Axê nekir û wî jî bi gernasî serê hespê xwe berda nav avê û got: "Ji jina xwe pistir bî, ê ko tivingê biteqeni" û herdû gernasan di nav pêlên ava Çemê Dicleya xwinxwar û dijwar de.

Herdû gernas bi qama direjî hev kirin û firêne ke- te pozê hespan û weke du şeran, di nav ava çem de raperikîne hev, bi qama êrişî hev kirin û herdû alî

jî, li wan temaşe dikin.

Peşkê avê bi ser serê wan dikevin û di ser serê herdiwan de qame dibirisênin; pertav didin û agir ji devê wan dipijiqi û pêlê Çemê Dicleya xwînxwar, carna bi ser pişta hespan ve bilind dibil, serê pozê wan tenê xuyadikin. Û carna bi sînga hespên xwe avê dicirénin û ji pozê wan av dipijiqi ser çavê herdû gernasan. Hesp, geman di devê xwe de dicûn û herdû gernas, bi hovî êrişî ser hev dikin û nav di xwe didin û bi hovî tene hev û her yek dixwazi, zû ji dijmine xwe rûpak bibî. Lê herdû pehlewan û feris jî, bi mérani şerê hev dikin.

Lê çawa ko dibêjin: "İbrahim, qamak li serê Çawîş da, ko tevlî papaxê serê wî kire du perçê û bi avê de berda û serê hespê wî kişand, ko ji avê derkevi, cendirman ji hev re gotin: 'Nadir bê kuştin û em wiло li wan binérin! Emê ci bersîva xwe bidin?..' Û reşek tiving berdane Axê û ew jî, bi nav avê de gér kirin û laşê herdiwan di nav pêlen avê de berjêr çün."

Lê çawa ko dibêjin, hevalên Axê peyayên Reman jî, reşek tiving li cendirman giredan û gelek ji wan kuştin. Han û hewara Reman, hawir li wan derketin û mère bextsipi ew bû ko bi lingê hespê xwe, xwe gihande nav zarokên xwe û destê wan ji qerwanê qetîya û her yek bi cîkî de revîyan. Reman, laşê Axê ji nav avê derxistin û laşen cendırma bi avê de berdan.

Istiranek li ser vê serpêhatîye hatiye gotin, lê ez nizanim ko di virde binivîsim.

Lê ev serpêhatî heye, ko di rojekê de bibî filimek û di sînema de bê belavkirin. Tenê gerek ayîna çiya û ava Dicle û rewşa siwar û peya bi qaméra bistênin. Yanî filmekî sînemayı ji vê serpêhatîye çedibî, ko bi milyona pere jê derdikevin.

\*\*\*

## EHMEDÊ ÎSKAN

Îskan kurê Çeto ji mala Hisîyê Qasime, malmezinê Pencinara ne, ko bavikekî mezin ji koçerên Xerza ne.

Mala Çeto, di nav Xerza de bi mala Hisiyê Qasim navdarin. Ji wan Bişar, Cemîl, Îskan deng dane. Eger hinekî dî jî, ez wan nasnakim. Lé dizanim, ko zariwên Hesenka jî hene, ko mirovê wane, lê nizanim bi kîjan bavî digihêne hev. Çawa ko mala Mihemedê Bişar jî, dibêjin, Ji mala Hisiyê Qasim in, lê ez baş nizanim. Ji lewra divê, ko li wan kûr û dûr bipirsim.

Ev Ehmed -kurê Îskan- piştî ko apê wî Cemîl, li Diyarbekir bidarvekirin kete serê çiya û sergejî ji dewletê re çekir û naçare leşkerê Turkan hate ser welâtê Xerza û çend şerên giran bi Ehmed re kîrin. Ü çawa dibêjin, Ehmed û hevalên xwe jî, gelek ji leşkerê dijmin kuştine.

İstiranekê bi hêrz li ser Ehmed hatiye gotin, bi navê "Axawo, aławo! Kula Kemal Paşa di dil de ma-wo". Lé ez vê istiranê nizanim, ko di virde binivîsim. Ji ber ko niha ez li bajare Dîmîşq (Şamê) rû-niştîme, nikarim dengbêjekî bînim cem xwe, ko ji wî vê istiranê biguhêzim nivişa xwe. Lé dibi, ko rojek bê ez karibim bi tevayî vê istiranê binivîsim!

Ehmed, kurê Îskanê kurê Çeto, Çeto kurê Hisiyê Qasime. Ji mala Çeto, Sado, kurê Çeto, kurê Bişar nasdikim û digotin, Mala Hesenka du birayên wî kuştine, ko navê wan nasnakim! Çawa, ko ez, Evdê û Çeto herdû kurên Cemîl jî nasdikim û kurê Sado, Derwêş û kurên Ehmedê Îskan, Îskan û Xelîl jî nasdikim. Lé min ji wan ev dabaş ne pirsiye. Herwekû zariwên Hesenka, Sebri û Mehmûd jî nasdikim, lê nizanim çawa digihêne mala Çeto? Nurêya jina Ehmed, bav file bû û keça Ehmed, Wesîle, jina Şukriyê kurê Emînê Ehmed bû û kurek ji vê jinê, ji Şukri re çêbû, ko min navê wî kire Sertîp.

Bişar, gelek navdar bû. Di şerê mezinê pêşî de li Îran hate kuştin, ko şer bi leşkerê Qeyserê Rûsyâ re dikirin û carekê bi destê cendirmekî Serti birîndar bûye, ko bavê wî istiranekê xweş li ser kurê xwe gotiye, ko min ji devê yekî Qermûti bihîstiye û di virde dixwazim hinekî jê binivîsim:

## SERPÊHATÎYA BİŞARE ÇETO

Çeto digo, lolo Bişaro lo lawo!

Bi serê bavê xwe û te kim, tu nezanî,  
Roja çemê Mirdêsikê, li kavilê mala wendo,  
Li ber cendirmê Sertê dest hilnanî.

Bişar digo, bavo de bese! te bi tan  
û niçan rihe kurê xwe deranî,

Ma di bîra te nayê,

Li dereca Têlanê minê ji nav lepê

cendirma bi darê zorê tu deranî,

Daketim mërga Tengeliê,

minê başbazirganekî giran

ji bavê xwe re anî,

Bi çemê Şerwan ketibûm,

Minê sê kurê Mehmûdê Semê kuştibûn

û min qesabxana mëra li mala

Mihemedê Bişar dani,

Wele ezi destvala bûm,

Tali' û fersenda xerab ji kurê te re anî.

Çeto digo, Bişaro lo lawo!

Bejna te zirave kulîlka va kuncîya,

De bere şin nekira li kavilê mala Wendo,

Li çemê Mirdêsikê li bilind çiya,

Kurê mino, minê ji te re negotibû?

Xwe navêje mala Osmanê Emer,

Bere te neki şivanê pey kerîya,

Xwezi mizgîna kuştina bavê Şebo

ji min re bihatana

û xelkê negotâ, Bişare Çeto

bûye esîrê destê kûçikên van Romîya.

Çeto digo, Bişaro lo lawo!

Ezê bi çemê Mirdêsikê diketim wa bi şuje,

Dengê mewzerê cendirmê Ridwanê helawxwerê

di sertê li ser serê bavê Şebo

girtî dûman û mije,  
Kesi ecebê giran bi çavê serê xwe nedî bûn,  
Çawa helawxwerekî Serti mera ji mala  
Hisiyê Qasim bikuje!..

Di virde, Çeto, gazina ji kurê xwe Bişar diki û dibejî: "Çawa te li ber cendirma dest hilnani?"

Lê Bişar, dixwazi bixî serê bavê xwe, ko ne ji tûrsa desthilanîne ye, belki Fersende jere xerab aniye ko di wê çaxê de destvala bû û bi xencerê erîsi sei yekî Serti kiriye, ko bikuji û tiving û hespê wi je bistêni, şerê dijmine xwe biki; û gava le bû pêşirtengî, karibi birevi. Herweku tê xuyakirin, Bişar, bavê xwe razî kiriye, ko bav li xwe vedigeri û berê xwe didi Osmanê Emer û gazina tevan dixi rexê wi û dibejî: "Min ji te re negotibû xwe naveje mala Osmanê Emer! Bere te neki şivanê pey keriya! û xwezi diki, ko kurê wi bihata kuştin û bi dili neketa destê Romiya. Ji ber ko, di wê çaxê de gelek kemasî bû, ko Kurdeki navdar, bi dili xwe bidi destê Romî û Ecem û Erebân. Ji ber ko, di tarîxê de me ne bihistiye, ko Kurda xwe daye destê kesi. Ji Kurdan bajare Eka pêve, ko naçare ketin dest Firinsa û bist hezar ji wan kuştin û çend mezinên navdar, weke Mir Seyfidînê Hekari, di nav wan de nebun. Lê Firinsa, ew bi pera berdan.. Lê Kurdi, xwe bicarek dida kuştin û xwe bi dili ne didane destê dijmine xwe!"

Herweku Çeto li xwe vedigeri û dibejî: "Kesi ece ben giran li dewre zemana nedibûn, ko helawxwareki Serti mera ji mala Hisiyê Qasim bikuji!

Lê Bişar, pesnê xwe ji bavê xwe re didi û dibejî: "Ma nayê bîra te! ko li Dereca Telanê min bi dare zore tu ji nav lepe cendirmê Turka deranî! Nayê bîra te! ko min ji Merga Tengelîfe kerwanekî giran ji bavê xwe re ani! Ma nayê bîra te, ko min se kurê Mehmû dê Şemê kuştin û qesabxana mera ji mala Mihemedê Bişar danî!.. Lê ez çibkim! Destvala bûm û bi xencere min ajote ser mérîkê Serti, ko hesp û tivinga wi je bistenim, le mérîk, tiving berda min û birin kirim û dil ketim destê dijminan."

Di wê çaxê de, Turkان berê xwe dabû, ko navê êl û eşiran ji Kurdistanê rakin û yekî navdar di Kurdistanê de nehêlin. Ü di çaxê cumhûriyete de, ev bûye, ko di wê çaxê de dest bi vî karî kiribûn û hevalên Evdilhemîd bicarek kuştin û dixwestin milet tevî weke hev bikin.

Lê faşist û şoven bûn, ko dixwestin hûrgelên bin destê xwe tevan di nav xwe de bipişêvin, winda bikin. Herwekû eşîrê Kurd, kevnisperest bûn û hevalê Evdilhemîd Paşa yê Osmanî bûn, êlperest û olperes t bûn.

Ji ber, ko berî huriyetê, SérTİya, newêrabû mezinê kurda, axayên eşiran bikujin. Ne tenê SérTİ, bel-kî hemî bajariya newêrabûn li her kurdên eşir lep hilênin, destê xwe biliind bikin.

Lê di çaxê huriyetê de, TurkêN Jon yan ji Jonturkan, gelek mezinên weke Korhuseyn Paşa girtin û gelek ji, kuştin. Ji ber ko hevalbendê Evdilhemîd û paşdamayı bûn û weke çelekewan bi pey axan diketin û digirtin û dikuştin. Ji wan mirovên, ko navdarin û bi destê Jonturkan di wê çaxê de hatin kuştin İbrahim Paşayê Mili, Seyfiddîn Paşayê Zirîki û İsmail Begê mire Mihelmiyan...

Dibêjin: "Bîşarê Çeto li sere çiya bû û di riwê dewletê de rabûbû û li sere çiya digerîya û rojekê dî, ko yekî fileh ji bajarê Farqînê tê û Bîşar ji peyâkî xwe re got: 'Here vî filehi werêne cem min! hela ka pejna tu têborînê nekiriye?' Lê çawa mîrikê fileh hate cem Bîşar, jê pîrsî: 'Ka bêje, bê ci li bajêr heye?' Lê mîrikê fileh, destpêkir û got: Bi sere bavê xwe û te kim! ji çiroka huriyetê pêve tu dabaşen dî nîn bûn. Heme xelk dibêjin "huriyet", "edalet", "u-xuwet", "misawat"..."

Lê Bîşar jêre got: Me berê ev bihîstiye! Ka tiştekî dî te nebihîstiye? Lê filehê reben, ko bîhna gerdenazadî kiribû carekî dî destpêkir û got: Na wele! Bi serê bavê xwe û te kim! Ji huriyetê pêve tiştekî dî tunebû! û bi ser ve çû û got: Bi serê bavê xwe û te kim! ez û tu, şivan û gavan bûne weke hev û nema kes karîbî zordestiyê li kesî bikî!"

Lê dibêjin, Bîşar, ji vî mîrikê fileh gelek nexwêş

bû û gote peyakî xwe: "Hela tu ka sûstema min bide destê min!" û çawa peyayê wî tivinga wî da destê wî, tiving xiste zikê mérîkê fileh û got: "Hey min kîrê hespê xwe xiste ..... diya ê ko ez û tu kirine weke hev!" û lingê tivingê kişand û got: "De bere bê li ser te bixeyidi! Çawa ez û tu û şivan û gavan weke hev dibil?" û dijûnên pîs ji fileh û serkarê dewletê re gotin.

Paşê, Bişar azaa kirin û bi leşkerê xerzan ve şandin meydana şer û eniya Îranê, ko şerê leşkerê Rûsiya Qeyserî bikin; û di şer de, li Kurdistanâ Îranê hate kuştin. Lê ez nizanim kîjan salê hatiye kuştin?

**CEMÎLE ÇETO:** Belam Cemîl, piştî kuştina Bişar bû mezinê Xerza -Pencînara, ko jêre digotin, "Gawire sorê şewqekirî". Ji vir tê xuyakirin, ko mirovekî sor û çavşîn û müzer bû û gelek zorker û setemker bû. Di hemî şerên eşîran de bi birayê xwe re bû, lê çawa ko tê xuyakirin, weke axakî kurda bû û ne gelek bîrewer û zana bû. Çawa, ko Resûl Axa digot:

"Di şerê sala 1925 de, ko ne ez bûma wê Cemîl, alîkariya Şêx Seîd Efendî bikira! Lê min nehişt û jêre got: Cemîl! Axatî bi dewletê ye. Wê niha leşkerê Şêx bişkê û birevî! Emê dost û hevalê dewletê bimînen! Evê dî, wê tev bêne girtin û kuştin.. "

Cemîl, parastina bajare Sert û Zoqeyd û welatê Xerzan bicarek li ser xwe girtin û nehişt, ko kes nêzîkê serkar û karbidesten dewletê bibî. Lê çawa leşkerê Şêx Efendî şikest, Cemîl û Resûl herdû ji, di nav gunehkaran de girtin û Cemîl bidarvekin, lê Resûl, reha kirin Enadolê û paşê hate Binya Xetê û ji min re digot:

"Ko gunehê Cemîl di gerdena min de ye, min nehişt, ko alîkariya Şêx Efendî bikî." Resûl, eşkera ji min re digot: "Eger rojekê Kurd, dewletekê li darxin û ez hêj saxbim, gereke bê pirsiyar min bidarvekin" û pêde diçû û digot: "Roja ko Cemîl bidarvekirin", gelek ji xwe xeyidi û çer ji xwe re' dikir û digot: "Werin tifkin van simbêlen min! Bere jina min herî E-mînê Ehmed li Binya Xetê mar bikî!" Lê min jêre got:

Resûl! Weke mera here ber mirinê! û van gotinan bes bibêje! ne ezayê mirovên weke te ne.."

Reben! Ji wî weye, ko Emîn ji wî zanatir û mér-xastire! Ji lewra ji xeyd ev gotin, digotin. Lê Emîn, sed qat ji Cemîl bêtir, nezanî, şâşî, çewti û guneh-karî kirine, ko çiya nikarin gunehêن wî hilgirin. Emîn, bi Turkan re çû ser Reşkota û paşê bi Reşkota ve hatin ser û naçare dakete Binya Xetê. Lê dawî, vege riya cem dostê xwe-İbrahim Teliyê çavdêrê tevayî, ko li Diyarbekir rûniştî bû û veşartiyêن Civata XOYBÛN, bi carek ji dijmin re gotin û dema ko çû talanê kurdên Cizîrê revand û karekî giran ji dijminê xwe re kir, ko birayê xwe-Evdilah, bi çend mirovên kurd ve dane kuştin; û dawî we bihist, ko bi ci rengî hate kuştin û kurê wî Şukri fermanlı bû...

Lê dixwazim, serkarêñ bend û partîyêñ Kurd, di iro de xwe ji van çewti û şâşîyan biparêzin û hinek bêtir hişyar bibin.

Bi rastî, mirov, bi miletê Kurd dişewitî, ko mirovên wilo nezan hûne rézan û rôberên wî!

Zarokêñ mala Çeto, bicarek-mêr û jin-rehakirin rojavayê Enadolê. Lê paşê reviyan û hatin binya Xetê û du jinêñ wan, Mala Haco -Yusif û Cemîl markirin û dawî careke dî çûne welatê xwe û di bin destê dijmin de rûniştin.

Heft bavikêñ Pencinara hene: Kejika, Mûsika, Welîka, Terxana, Mala Şemdîn, Mala Çeto, Mala Faro, ko ji wan re dibêjin, "Mala Hisîyê Qasim". Lê bi rastî Mala Çeto, mezinê tevane û desten xwe direj dikirin nav eşîren hawir xwe ji. Herwekü Kejika ji, bi xéra navê Mihemedê Derwêş hatiye naskirin. Lê ev cend bavikêñ dî, Mûsika, Murada, Terxana, Welîya, Mala Şemdîn nehatine naskirin û navê wan li nav eşiran belav nebûne. Lê tenê Kejika, navekî tarîxiye, ko Şerefxan -Mîrê Bedlisê-, di nivişa xwe de behs kiri-ye.

Herwekü, Elika, ses (6) bavikin. 32 gundêñ wan hene û nêzîkî 900 malen wan hene. Nêzîkî 5000 mérên wan derdi Kevin -Qatîxoka, Cindika, Axika, Mala Sîno, Mala Remo, Mala Dîbo.

Çawa, ko di Bişerîyê de çar bavik hene: Sînika,  
6 gundên wan hene; Mala Nêşir, 6 gundê wan hene;  
Receba, 6 gundê wan hene; Reşkota 100 gundê wan  
hene, ko 2000 mal têde rûniştine û 10000 mirov ji  
wan dêrdikevin.

Ev jimara han, ji devê Bedriddîn, yek ji mezine  
Mala Dibo hatiye guhaztin.

\*\*\*

## ISKANÊ QASIM

Hay delal, hay delal!

Hay delal Iskano!

Lo tu berxo, tu berano,

Li helanê Zêwê keleka koçera,

Li pêşîya Hesiwê Birahîm, Cemîlê Çeto

û Seîdê Ehmed bûye qere sindyano.

De hay delal, hay delal Iskano lawo!

Bêzê digo, Neîma! rebenê!

Dilê min rebena xwedê ji êvarde

çima wiло di kewgirî?

Min bala xwe dayê hewara Rema

û mala Faro û mala Nêşir hat û dibihirî,

Ezê çûme pêşîya Hesiwê Birahîm, axeke nûkemili

Minê digo, Heso! lawo! bi serê bavê xweki  
te laşê Iskanê me nedîye?

Digo, Bêzê rebenê! here pirsa xwe bike  
ji Cemîlê Çeto, gawirê sorê şewqekirî.

Ezê diçûm û minê digo, Cemîlo lawo!

bi xweki bi xwedêkî, te laşê Iskanê min nedîye?

Digo, Bêzê rebenê! here pirsa xwe bike  
ji Seîdê Ehmed, sê barî xulamê şiretkirî.

Ezê diçûm pêşîya Seîdê Ehmed, minê digo:

Seîdo! kawo! te laşê Iskanê min nedîye?

Digo, Bêzê rebenê! ezê bi helanê Zêwê diketim,  
Minê Iskanê te dîtîye,

Minê digo, lawo! Iskano! rabe,  
Tu xortekî nestêleyî, destê mi-l te nabe.

Lê Iskanê Qasim bavê Simaîl digo:  
Seîdo! lawo! dilem weye, sed carî bi min weye,  
Bi serê bavê xwe û te kim! kuştina min heye  
û tucar reva min tuneye.  
Minê derbekê taveti bejn û bala rextê  
eyneliyê û min xerabdikirî pêşanîka meqeskiri.

Di virde hate xuyakirin, ko Iskan, kurê Qasim e  
û navê kurê wî Ismaîl e; navê diya wî Bêzê (bêzare)  
û navê jina wî Neîma ye. Ü Iskan, li ser destê Rema  
hatiye kuştin û leşkerê Rema û Mala Nêşir û Mala  
Faro bi hevre cûne ser eşîra Iskan.

Çawa, ko Keleka Koçera, gundekî ko diriste di  
nav eşîra Iskan de bî; û Hêlanê Zêwê, diriste ko  
navê cîkiye, ko li cem Zêwê ye. Hêlan, di zimanê  
hindama me de berojeke ko zû berfa wî diheli. Her-  
wekü navê gundekî ye, ko li nav eşîra Hebibbinâna  
dikevî. Çawa ko, Zêw, gündeke, ko dikevî ber ava  
Çemê Dicle, belkî jî, navê du gunda bî? Herwekü  
Zêw, cejneke, ko xelkê dora ziyaretê, çend gund sê  
sev û sê rojan koçemal li ser dimenin û şahî û  
govendê dikan. Ev şahî di serê bihare de ye. Çawa  
ko Kelek, çend daran li ser çend meşkên pifdayî  
girêdidin û li ser avê datênin û lê siwar dibin û pê  
derbas dibin. Lê niha, li şuna meşkan kewçuka  
datênin û dara li ser dikan.

Herwekü Bêzê, Bêzare, carna bi yek daxwazê têñ  
û carna jî, Bêzî, bi daxwaza xeyd û nehezkirin jî tê.  
Çawa ko Cizîri dibebî:

"Bêzî dikan ji gewr û naz û xuncan,  
Qedrê gulan ci zanin,  
Kelbes divê kerê reş."

Di rista Seyda de, "bêzî dikan", yanî guhnedin  
gula, ji wan dixeyidin, dûrî wan diciñ..

Daxwaza Cizîri ewe, ko xelkê çaxa wî dûrî olpe-  
restî diciñ û berê xwe didin mal û haya wan ji ola  
îslamê nemaye.

Lê ko iro saxbûna we ci bigota qelo Divabû, bi  
saxî xwe bikuşta, yan jî wek min şasik bavêta!

\*\*\*

## İSMAİLÊ XELİL

Were were... wer Simailo!

De were, were, were, wer xwaro!

Yadê! Qesra Simailê Xelîl di kortê de,  
Xwedê xera biki mala lawê guri,  
Nêrdewan danî û kîsyâ pêde,  
Wela li min rebenê, Simailê Xelîl  
kuştin di xewka sibê de.

De were were, were, wer Simailo!

De were, were, were, xew girano!

Yadê! rebenê ji Talatê heya Sîtê,  
Weyla li min rebenê, berî û baran bi kulî tê  
De giryê gawir û misilmana bi halê min û  
Simailê Xelîl tê.

De were were, were, wer Simailo!

De were, were, were, xew girano!

Yadê! rebenê! ez û Simailê Xelîl,  
Li hafa mala li hev rast hatin,  
Wele qidûmê min rebenê şikestin,  
Çokê min evdalê çûn û hatin,  
Wele min û Simailê Xelîl bi qozîyên  
çava hev axaftin.

De were were, were, wer Simailo!

De were, were, were.

Di virde hate zanîn, ko İsmailê Xelîl ji gundê Ta-  
latê ye, ko li nav eşîra Omerîya dikevi. Çawa ko, Sît,  
gundekî Omerî - Umerîya ye û herdû gund hêjane,  
ko mirov tarîxa wan bidî naskirin. Ji ber ko, Sît, di  
nav kevnare tarîxa miletê Kurd de gelek kevnareye û

serê pêşî navê eşîreke Kurd yê mezine, ko Kurdistan di nav xwinê de hiştîye. Lê Talat yan jî Dalat, navê leşkerekî Kurd e, ko berî çend sal li Şam zor û setemeke bêjimar kiriye û xwediye Yewniyatişam pesnê wan didî û dibêjî: "Çermê pez -li xwe dikirin û kumên wan tûj û bilind bûn, ko çawa diçûne xanîyekî, kumê xwe ji serê xwe dikirin û ji nûve derbas dibûn, ji ber ko, tevlî kumên xwe nikaribûn di derî ve derbas bin. Û ji wan re digotin, Del û Dalat û ola wan Umerî bû, ko ji wan re digotin, Umerîya." Di sala 1150 yê koçî de ev leşker, li Şam fermandarı dikir. Û Talat - Dalat û Sît - Sîtol li nav Omerî - Umerîya ne.

Herwekü ev İsmailê Xelîl, ji gundê Dalat-Talatê ye û dijîminê wî, lawê Gurî, ew bişev kuştîye. Lê navê jinikê nehatîye naskirin û gelek diriste, ko dengbêja li ser zimanê jinikê ev istiran gotibin. Herwekü istiranen Kurdî, piren wan li ser zimanê jinan hatine gotin, lê, ne jina gotine. Belki dengbêjan li ser zimanê wan gotine.

\*\*\*

## BAVÊ BEHCET

Nefya digo, lêlê Dilsa! porkurê!  
Vê sibekê min ci dît û ci cirîya,  
Xwedê şes topa têxî mala Elîsamî begê,  
Başqesabê Kurdistanê bi alahîya Sérte,  
Tabûra Bedlisê, ordîya Diyarbekrê,  
Bi sê tîrêja, li cî û meskenê bavê  
Behcetê min gerîya, dayê!  
Mizgîna nexêrê ji min re hatî, dibê:  
Derbeka li bejn û bala bavê Behcetê  
min xistine,  
Serê vê biharê xerab kirin hêlinâ  
firar û makûman û sê barî di eşqîya, lê dayê.  
Dilsa digo, Lêlê Nefya! rebenê!  
Serekê çêdibû li pira Govedê, çiyayê Hevêda,

Ji dile min evdala xwedê re wa li yane,  
Mizgîna nexêrê ji min re hatî, dibên:  
Waliyê Bedlisê, waliyê Sertê, mufetişê imûmî  
li Diyarbekira şewitî li hev civîyane, dayê!  
Qerara kuştina bavê Behcetê min rebene  
bevre dane, dayê!

Nefya digo, Dilşa! porkurê!  
Serekê çedibû li çiyayê Hevêda,  
Li pira Govedê, ji dile min re li meydanê,  
Xwedê xerab biki mala Elîsamî begê,  
başquesabê Kurda,  
Alahiya Sertê, tabûra Bedlisê bi sê  
tireja bi ser kozika bavê Behcetê min de  
bi axirmekîna agir danê, dayê!  
Mizgîna nexêrê ji min re hatî dibê!  
Nefya! porkurê! bavê Behcetê min kuştine,  
Minê digo, lawo! ezê neketime heyra kuştina  
bavê Behcet! kuştin, kuştina mera ye,  
Lê ezê ketime xema wê xemê, bavê Behcetê min  
kuştine teresê Turka, şikandine mil û mixê  
Kurdistanê de dayê!

Ev istiran, min ji devê Yahoyê Kurê Haci Miheme-  
dê Bolendi bihîstiye. Lê ne ev tenê ye û bi rastî Ya-  
ho, gelek xweş dikir û dibi ko hin gotin kêm û zede  
jî, di virde hatibin gotin!

Lê çibkim? Mirov nikarî her tiştî rast û dirist ji  
devê istiranvanan biguhêzî. Lê di virde, daxwaz tenê  
serpêhatiye.

Pira Govedê, Çiyayê Hevêda herwekû tê ber çavê  
mirov diriste, ko li jorê hindama Farcînê bin. Bawerim  
ko Hevêda, navê eşireke Kurd e. Şêx Fexri, ko  
navdare bi "Bavê Behcet", di sala 1927-1928 de hati-  
ye kuştin. Heftê-heştê gernasê Kurd jî, pêre hatine  
kuştin û canê xwe yên şérîn kirine qurbana milete  
Kurd. Meger çendan nizanibûn Kurdperwerî ciye jî,  
lê ji şehîde welatê me têne jimartin.

Elîsamî Beg, serdarekî xwînxwarê Turk bû, ko

navê wî bi "Başqesabê Kurdistan" hatibû naskirin.

Di virde tê zanîn, ko qesabê Kurdistanê gelek hebûn. Lê ev Elisamî, mezine tevan bû. Ji ber ko, ji tevan bêtir xwînrêj û mérkuj û talanker û dilhişktir bû. Herwekû dibêjin, serê Fexrî û hevalên wî jêkirin û li gunda digerandin!..

Lê Nefya, gelek xwes gotiye, ko dibêjî: "Şikandin mil û mëxê Kurdistanê!" Çawa, ko hêlîna firar, mahkûm û eşqîya jî, pir bi xurtî hatiye gotin.

Raste. Xuşka Nefya û Dilşa, ne tenê bi kuştina delalê ber dîlê te, dijmina mil û mixê Kurdistanê şikandine! Belkî bi hezaran mil û mix hatine şikandin û kuştin. Lê mixabin, ko nikaribûn bi hevre wan miyan, di rav dîlê dijminê xwe de bikutin û wan milan bi hevre di riwê dijmin de bilind bikin. Lê gelo milete Kurd, heta iro jî, dikarî be hevre milen xwe bidin sînga dijmin û bi hevre miyan di sînga dijminê xwînxwar de bikutin? Ü dikarin destê hev bigrin û yek mil û yek dil, di hember dijminê xwe de rawestin? Nizanim? Tarix tenê dikarî bersîva vê pîrsê bidî!!

Ji me re, xwendin, hişyari, hevgirtin, bîrewerî divîn, ko karibin xwe bikin yek mîlet û mîlet û welite xwe jî nav destê dijminan derxin û biparêzin.

Ev dîn û dewlet, xwendine, xwendine,

Ev tac û şewket, xwendine, xwendine,

Ev serbilindî, xwendine,

Ev dewlemendî, xwendine.

Di dîwana min a pêsi de, ev rista ha bi tevayî hatiye nivisandin û çapkîrin.

Reben: bi daxwaza rehben, rahib, rehbike.

Evdal: ebidê Xwedê. Kole û qûle.

Farqîn: kevnebajarekî Kurdistanê ye, ko di Sedê Çarem û Pêncem de paytexta Kurdistanâ Diyarbekir bû û dewleta mala Merwanê Kurd têde 114 salan fermardarı kirine. Ü navdarê padîşahên vê malbatê, Ehmed-kurê Merwan e, ko dibêjin; "366 jînên wî hebûn û ji dewlemendirîne padîşahên islamê bû û ev dewlet li ser destê Baz - Ebûseca ê kurê Dostikê Hemîdi hatiye li darxistin. Baz, kurê Dostik, jî eşîra Hemîdi

ye û herdû kurêñ dostik, Huseyn û Baz-Bad, di şerê Ereban de hatine kuştin û xwarziyê wan, şuna xalanê xwe girtin û dawî ve dewlet li ser destê wezîrê bêbext, Fexridewle, kurê Çuheyrê Mûsili hate wêrankirin û kete destê Selçûqiyyen Turk. Lê paşê, kete destê Kurdêñ Eyyûbi û heta iro jî, hêj di destê Kurdan de ye. Tarixa ve dewletê, kurê Ezreqê Fariqî-Farqînî çekiriye û min guhaztiye kurdî-kurmancî.

\*\*\*

### TAHIRXANÊ CAZÊ

Tahirxan, kurê Elixanê Cazê ye, gelek diriste ko mezinê eşîra Şikaka bin û ji Mala Simko (İsmail Axa) bin. Ev şer gelek caran li li nik min hatiye gotin. Çawa, ko Kawis Axa jî, heta niha jî, carna di qawana de dibêjî. Lê mixabin, ko tevî nizanim.

#### istiran

Şerekê çêdibû li Qeraniya xopan, li ber çayê,  
Tahirxan sê denga gazî dikir, Teymûrxano!  
lo bira!

Tu cebilxanê ji kekê xwe re valake ser ebayê!  
Eskerê Şahê Ecem girane, kes dihana me de nayê,  
Mêri çê be, çê bixebite, bere iro dengê me  
derkevî li dinyayê!

Şerekê çêdibû li Qeraniya xopan wa bi dare,  
Tahirxan sê denga gazî dikir, Teymûrxano, lo bira  
Eskerê Şahê Ecem pir girane, bê jimare!  
Mêri çê be, çê bixebite!

Kekê te yê bi sê gulan birîndare!

Di virde tê zanîn, ko şer di navbera Kurd û Ecem  
de bûye û leşkerê Şahê Ecem girane û bi xurtî  
hatiye ser Şikaka û ev sê bira, şerekî dijwar bi  
dijminê ji xwe pirtir û mezin re kirine. Lê nizanim,  
birayê sêyem navê wî çiye? Tenê weke ko tê bîra min  
gerekî navê wî, Ehmedxan bî. Û ev şer li gundê  
Qereniyê çêbûye û dixwazim, li vî şerî bikolim û tevî  
baş binivîsim. Çawa, ko dixwazim serpêhatîyê tevdê  
bigrim. Ji ber ko, ev şer gelek navdare.

Lê, gelo sax dimenin? Ko niha ez di sala 1982 de,  
yanî 82 min ji tarixi birin, yan ji dizine. Lê hejî ez  
xwe ciwan dibenim!!

\*\*\*

## TACİDİNÉ HACİ OSMAN

Mala Hesen Şemdin, mezinê eşîra Dekşûriya ne û  
hemberê Hevérka ne, lê tim hevalbendê dewletê ne û  
hindama Midyad, Kercos bi van herdû navan bûne du  
perçe, Hevérkî, Dekşûrî. Heta Hevérka û Dekşûrya  
ji, bûne du perçe û hin ji herdû eşîra Hevérkî ne.  
Çawa, ko hin ji Dekşûrî ne. Kercos, paytexta Dek-  
şûrya ye û mala Hesen Şemdin, li Kercosê rûdinên û  
gelek caran Hebizbini, Hesari, Remî ji, ji Dekşûrya  
tene jimartin. Çawa, ko carna ji, ew ji, dibin du  
perçe û tim mezinê Dekşûrya, di serê bendê de ne.  
Herwekü tê xuyakirin, ev her çar eşîr, ji kevnare  
de yek eşîr bun û di bin nave Gulika de digihane  
hev û mezinê Gulika, Mala Sarxwanê Hemko bun.

Lê mala Hesen Şemdin ji, bûne çend bavik. Zari-  
wên Hesen Şemdin, İsmail, Hacı Osman, Yûsif, Emin  
nasdikim, yan ji navdarin. Çawa, ko Mala İskender,  
Mala Mistefa ji hene, lê nizanim çawa digihêne hev.

Lê iro, zariwên İsmail û zariwên Haci Osman, ber-  
beriyê bi hevre dikin û her yek ji wan, axayê ben-  
deke ye. Ji zariwên İsmail, İbrahim navdar bû. Çawa  
ko, ji zariwên Haci Osman, Bedridin, Haci Mehmûd,  
Hesen bi deng bûn û Tacidin, piştî kuştin û şerê  
Qerqatê dengeki mezin sitand û istiranek li ser hate  
gotin. Lê ez, istirana wî nizanim, tenê dikarim ser-  
pêhatiya wî binivîsim. Lê apê wan Yûsîfe Hesen Şem-  
din, axatiyeke mezin dikir u di sala 1926 de li Enadol  
(welatê Turka) di berşokê de serê xwe danî. Mirove-  
kî sor û qelew bû û kêm mirov weke wî jîr û şareza  
hebûn.

Di sala 1917 de, Şerê Mezin barê xwe danî û dew-  
leta Turkiya, ji hevdeketî û şerpeze mabû û dijmînê  
islamî, imparatoriya mezin, bermayê mirovê nexweş  
bi xurtî li hev parvekirin û miletê kurd dikaribû di  
wê çaxê de dewletekê lidarxî. Eger mirovê zana di nav

wan de hebûna! Lê mixabin, haya axa, beg û şexên Kurdistanê ji dewlet û gerdenazadiye nema bû. Tenê tevan dixwestin, şewat, kuştin, malwérani û zor û setemê bi ser welat û mîletê xwe de bibarênen; û bi gernasi érişî hev dikirin û dawî leşkerê dijmin dihate ser wan û kuştin, şewat, talan û wérani bi ser me de dibarandin û gelek ji wan digirtin û hin jî, dikuştin. Lê berxwe nediketin û çawa leşkerê dijmin ji nav me diçû, careke dî bi hovitî érişî hev dikirin.

Di wan salan de Yûsîfe Hesen Şemdin, dost û hevalbendê dewletê bû û carekê han û hewar ji dewletê xwest û leşkerê dijmin anî nav welatê me. Di hindama Midyat, Kercos de bi dehan sermiyan û mezine eşîren Kurd kuştin û gelek jî dane girtin, weke Îsayê Hemo (Dereverî), Sebriye Mihemedê Heci (Remî), Evdilkerîmê Eliye Remo (Hevérki), Ezîzê Mamed (Midyadî), Xelefbegê Mihelmi, Eliye Ehmed (Omerî), Eliye Axê û kurê wî Mihemed û birazîye wî Mihemedê Bekire Axê (Omeriya), hatin kuştin..

Lê hevalbendên leşkerê Turk Yûsîfe Hesen Şemdin (Dekşûri), Mihemed Salih-kurê Evdirehmanê Keyxwe (Hesari), Suleymanê Hesenê Temogewrê (Hebizbinî) dijminahiya dijminen xwe bi alîkariya dewletê dikirin û welatê me berdîberdan pêde anîn. Mezinê eşîra İzidînê-Haci Eli, bira û pismamên xwe ji nav Hebizbinîya; İsmailê Mihemed û birayê xwe Suleyman ji nav Hesarya; Xelile Mihemedê Heci û birayê xwe ji nav Rema, ji ber dijminen xwe revîyan û bi çola ketin û bicarek bê pêjin bûn.

Lê çawa leşkerê dijmin, xwe ji nav eşîran kişand careke dî, dijminen wan xwe eşkera kirin û hevalbendên wan xwe dane xuyakirin û roj bi roj, eşîr xistin destê xwe û rûmet ji dijminen xwe re nehiştin; û hero gundek talan dikirin, Kurdan dikuştin û xaniyan dişewitandin...

Naçarê careke dî, Yûsif Axa, hana xwe bire Midyadê û cereke dî leşker hat û dîsa talan, kuştin û şewat bi ser welatê me de barandin; û careke dî, dijminen wa, xwe di kunc û kozika de veşartin. Careke dî, leşkeren dijmin çawa xwe kişand, dijminen wan, dest bi karê xwe kirin û vê carê eşîran bicarek

ji ber wan girtin û zor dane wan.

Lê rojekê, Izidîn bihist, ko Suleymanê bi du peya ve hate gundê Hesarê û bûye mîvanê Mihemed Salih. Ji lewra ji xwe re fersendê dî û bi birek peya ve hatin Hesarê û ji Îsmail re got ko, "dixwazim, em, Suleymanê apê xwe di mala Mihemed Salih de, bikujin"! Lê Îsmail, bi dilê xwe nedixwest, ko şer bikevî nav gundê wî. Lê nikaribû bêjî, na! Ji ber ko, Izidîn, mezinê bendê bû û dijmînê Mala Hesenê Temogewrê di mala wî de bûn. Mirovên hev bûn, lê Îsmail, ji peyakî xwe re got: "Here ser quesre û tivingekê di ser mala apê min re berde, ko bixwe şiyar bibin û bêje! Min dixwest, ez, Suleyman û Mihemedê Salin bi dizi bikujim, lê tivinga min li wan neket!" û peyayê wî, wilo kir û wilo got. Ji nûve şer destpêkir. Lê ji ber ko hevalbendê Izidîn û Îsmail bêtir bûn, naçare hevalbendê Suleyman û Mihemed Salih, piştî şerekî dijwar ketin quesra Axê û bi dijwari şere hev kirin. Lê hana Rema û Hebizbiniya, ji benda Izidîn re hatin û hawîri quesre weke bazineki gihane hev û serkarê hindama Midyadê hate nav wan, ko herdû bendant linev bêni. Lê Suleyman, serkar di quesrâ de girt û got, "bere tu ji bi me re bişewiti!" Lê ji ber ko serkar, mirovekî zana û xwenda bû, ew xapandin û got, "eger ez derkevim, ji we re çetire! Ji ber, ko eze bixwazim leşkerekî giran bi xwe re bênim ser dijmînê we"!

Lê çawa derket, hew li hevalen xwe vegeriya û Şex Fethilayê Eynkafî şande nav wan. Şex, bext ji wan sitand, ko xelkê nav quesre derxin û wan neku-jin û ew ji, axatiyê bi destê we ve berdin. Lê çaxa Şex, Suleyman da pişt xwe û xwestin, ko derkevin ser quesre û xwe bidî destê dijmin, Şukri, kurê Îsayê Hemo, ko Suleyman bavê wî bi perişanî dabû kuştin, bi dizi û di pişt şexê xwe de tiving xistê serê wî û gérkire ser qadê û Şexê zirav xwe bicarek da paş û dijmin ketin hundirê quesre û Hesariyan bicarek birin mala Îsmail. Îsmail Axa, tivingen şervana ji milê wan negirtin û got: "Win gundiyan min in! iro we di ber ape min de xwe da kuştin, siba winê xwe di ber min de ji, bidin kuştin".

Lê apê wî-Mihemedê Salih, dane destê Xelîlê Mihemedê Hecî'-mezinê Rema. Xelîl, ew li malekê danî û Rema pêwanî lê dikirin. Tenê piştî, ko şer bare xwe danî, Hebizbinî û Remî çûne malên xwe. Di vegerê de hate bîra Hebizbiniya û ji hev re gotin: "ma ne şerme ji me re, ko Suleyman bê kuştin û herdû hevalên wî sax bîmînen". Careke dî koma Hebizbiniya vege riya Hesarê û ji Îsmail re gotin: "em niha dixwazin Mihemedê Salihê apê te jî bikujin! Ma me, yekî weke Suleymane Hesen kuştiye, tu jî nikarî apê xwe bikujî? Yan divê tu jî, apê xwe bikujî û yan divê dijminahiya me biki!" Lê Îsmail, nikaribû dijminahiya mirov û hevalbendên xwe, ko jê xurtir û mezintir bûn, biki û naçare apê xwe birin ser bêndera, goya wê wî bibin nav Hebizbiniya! Lê li ser bêndera kuştin û Îsmail, pakêtek fişek têde valakir û vesartin.

Lê Xelîlê Mihemedê Hecî, çawa bihist ko Mihemedê Salih kuştine, wî jî, bi xwe nexwê anî û got: "min bextê xwe dabû Mihemedê Salih û we, ew di bin bextê min de kuşt û win dibêjin, ji ber ko me apê xwe kuştiye, gereke Îsmail jî apê xwe bikujî. Eger wiloye, gereke mala Hesen Şemdin jî, apê xwe Yusif bikujin. Ji ber ko serê bêdê Yusif bû. Çima we herdû alîya apên xwe kuştin û İbrahim û Bedirdîn jî, apê xwe nekujî?"

Li ser vê daxwaza Xelîl, teva gotina xwe kirin yek û şandin pey Kercosya, ko li quesra Hesarê bi hevre hevalbend bicivin. Mala Hesen Şemdin, bi serdarîya İbrahimî Îsmail û Tacidînê Hacı Osman heftêheşte peya bi xwe ra anîn û hatin Hesarê.

İzidîn, bi xurtî û çavşorî jî wan re got: "Bê çawa me, herdû apên xwe kuştine, divê win jî, apê xwe bikujin! Yan na, karê xwe û şerekî dijwar û xwindar bikin!" Lê İbrahim, jê re got: "Heyran, apê me bê şer axatî bi destê me ve berdaye! Ma ji Xwedê ne gunehê, ko em vî kalê ha bikujin?"

Lê Rema û Hebizbiniya karê xwe û bêbextîyekê kirin, ko di quesre de herdiwan bikujin. Tenê Îsmail, hana eşîra Hesarê berdabû hev û bi dizi ji xalanê xwe re got: "Weke mîra li berxwe bidin! Nikarin bê

bextîya li we bikin" û ji hevalên xwe re got: "Naxwazim di mala min da, xalanê min, bi bêbextî biku-jin!", lê ko çûne mala xwe "mêri çê bin û emê tevde herin ser eşîra wan û win ci dixwazin, emê li wan bikin!"

Bi vî awayî, İbrahîm û Tacidîn ji nav pence bazê mirinê filitîn û bi hezar tirs û sawir çûne mala xwe û karê xwe û şer kirin. Û bi serdariya Qeretacdîn, birek peyayê Dekşûrşa ketin gundê Qerqatê, Xirbehê-qinyata û bi şev leşkerê Hesarya, Hebizbiniya çûne ser wan û hewara Reman di cikî dî ve, direjî nav gundê Dekşûrya kirin. Lê şerê Qerqatê, gelek dij-war bû û leşkerê Hebizbiniya û Hesarya, êrişen xurt birin ser kozikê Dekşûrya û gihane ser kozika. Tacidîn Axa û İsmâıl, gazi xalê xwe kirin û gotin: "Xalo rabe! bare me girane! tu nikarî di binde rabî!"

Lê Tacidîn, tim digot: "Ez Rostemê Zal im, Qeretacdînim! Bi Xwedê kim, heta ko win nekevin ser laşê min, kozikê ji we re bernadim! û ji ber we narevim!"

Lê Tacidîn, di vî şerî de hate kuştin û Hesarya, laşê xalê xwe anîn Hesare û şûştin, kefen kirin û bi diyarî ji xalanên xwe re şandin. Û bi vî hawê, şer dawî hat û Qerqat, Qesrik, Kilyas ketin destê me Hesarya. Lê careke dî, Yûsif Axe, dest bi gili kir û leşkerê Turk anî ser dijmîne xwe û di xew de du mirrovê Hesarı, ko nobedar bûn, kuştin û Qerqat û herdû gundê dî, ji Hesarya sitandin. Ji ev çar eşîr bi hevre, belki heftê - heştê gund hene. Tevde di bin siya Mardin de ne û di raste wan de, eşîra Mîhelmiya heye, ko bi erebî dipeyivin, tevlî ko pire wan bi kurmancî zanin. Lê, xwe ji miletê Ereb dijmîrin. Şerefhanê Bedlîsi, vê eşîre ji mezinê eşîren Heskîfe (Hesenkêfê) dijmîre û nabêji, Erebin!

Herwekü ji mala mîre wan re dibêjin, Mala Mîrê Zirav, ko pir diriste ji mala Silahidîne Eyûbi, melekanê Hesenkêf mabin. Ji ber, ko tarîx didî xuyakirin ko yazde bira mabûn, ko dewleta wan hilweşîya û dane destê Turka û di nav eşîran de belav bûn, ci girtin û yek ji wan bû fermandare

Erebkêr û yek bû fermandarê Ruhayê (Ürfayê). Çend caran min ji mîrekê Mihelmiyan pîrsî û ji min re gotin: "Em û mîrekên Ruhayê pismamen hevin".

Herwekû Mîrmihemed Beg, yek ji wan li Cizîra Bota, li nik zavayê xwe -Mîrê Bota- rûniştibû û zarokên wî gelek hebûn. Lê, ez nizanim ci bi wan hatiye?

Ca eger rast bî, ev mîrekên Mihelmiya ji mala Silahidîn bin, pir diriste ko ev eşîra Mihelmiya, ji wan eşîren Kurd bin, ko pêlakê dûr û direj di nav Erebân de mane û dawî, pişti Dewleta Eyûbi, li Hema û Himis hilwesîyan, yek ji wan di gel çend eşîr û leşkerên xwe ve hatine nav Kurdistana Heskîfê û di wir de bûne melîk û mîrên Heskîf. Lê zimanê erebî ji bir nekirine û naçare ji bo zimanê xwe dibêjin, "em Ereb in", tenê Ereb jî, ji wan re dibêjin, "win Kurd in":

Ev hemî, ji nivişa Mîr Serefxanê Bedlîsi hatine guhaztin. Lê her çawa bî, ev eşîra Mihelmiya, yek ji mezinên eşîren Heskîfê û di bin destê mala Silahidîn de bûn, ko di iro de, ji wan re dibêjin "Mala Mîrê Zirav". Di nav wan de, İsmail Beg, Xelef Beg di çaxê min de navdar bûn, ko herdû jî, kuren Haci Mîhemed Beg bûn. Di nav vê malê de navê Xelef û Xelîl, ji kevnare de gelek hebûn û niha jî, hêj mane. Lê ji tevan bêtir, Hesen Beg, şerîn û ciwan û hilaveti bû. Çawa, ko Xelef Beg û İsmail Beg bi destê Turkan hatin kuştin. Lê Hesen Beg, çawa ko dibêjin, bi destê kurê wî û izidînê mala Osman -axê Omeriya bi şev û di xew de hate kuştin.

\*\*\*

## SADÛNÊ AXÊ OMERÎYAN

Sadûn, yan "xwedêkê Çalê", mirovekî zorker û xwînrêj bû, ko ji gundê Stilîlê tenê 40 mirov di hindirwê mîzgefteftê de kuştin û ji ber zor setema wî, çend mezinên Omeriya, xwe dane hev û bi şev cûn, ko wî bi dizî bikujin. Lê, bextê wî sipî bû, ko berfê li wan dayê û nema karibin xwe bigrin u naçare vegeriyan. Lê Sadûn Axa, sibehê şop gerandin û şopa

sê mirovên mezin naskirin; Emerê Çeto, mezinê Bin-yata û du mezinê dî, ko bawer dikim, navê yekî ji wan Keleş bû, hersê anîn oda xwe û bi xencera kuştin. Lê ez, vî şerê ko li ser vê dabaşê hatiye gotin, nizanim. Herwekû serpêhatiyê jî, baş nizanim, lê çawa min bihistîye, wilo ye! Ji lewra, li şuna serpêhatiyê, dixwazim, li ser mala axê hinek bipeyivim.

Mala Axê Omeriya, bûne du perçe: Mala Mihemed Cizîrî û mala Mela Mistefa, ko mala Mihemed Cizîrî, bûne mezinê Etmankiya û mala Mela Mistefa, bûne mezinê Mehmedkiye. Mala Cizîrî, li gundê Çalê rûdinin û mala Mistefa jî, li gundê Metîna rûniştîne.

Lê, çima navê Mihemedê Cizîrî hatiye meydane? Divê em bidin xuyakirin. Çawa ko dibêjin: Carekê, Mîrê Bota hatiye mala Etman Axa û her diwazdeh kûrê Axê, hatine destê Mîr. Mîr ji Axê pîrsîye û gotiye: "Etman Axa! Ev diwazdeh kûr ê tene? Zekat li wan dikevî û dixwazim, yekî bide mîrê xwe, ko di nav zariwên xwe de xwedî bikim!" Etman Axa, bi tore jere gotiye: "Ezbenî! Her diwazdeh, kolê te ne! Mîr ferman biki, bere her diwazdehan ji xwe re bibî û li ber dergehê wî, pêwanîyê lê bikin!" Lê Mîr gotiye: "Xwede wan jî te re bîheli! Lê ez dixwazim, biçukê wan, Mihemed, ji xwe re bibim!" Ü çend salan Mihemed li Cizîrê maye. Lê çawa bavê wî serê xwe daniye, Mîr, ew kiriye Axayê Omeriya û navê wî buye Mihemed Cizîrî.

Lê çawa ji min re hatiye gotin, ji Etman Axa, Mihemed Cizîrî, Mela Mistefa û İbrahim mane, ko Mihemed Cizîrî ketiye şuna bavê xwe, Mela Mistefa bûye mezinê Mehmedkiya û ji Çalê çûye Metîna û ji wê caxê de bûne dijminê hev!

Ji Mihemed Cizîrî, Esed, İsmail, Sadûn, Huseyn mane û Esed şuna bavê xwe sitandiye; İsmail û Heseyn, çûne rojavayê Omeriya û li hindama Tere rûniştîne. Lê Sadûn, axatî kiriye, heta ko serê xwe daniye. Esed, xwestîye ko şuna birayê xwe bigrî, lê herdû birayê dî, bicarek axatî nesipartîne û her yek di cihê xwe de bûne axayê hindamekê.

Lê Esed, li Çalê maye û ji Esed, Suleyman, Osman, Mehmed, Evdirehman, çar kur mane. Osman û

Suleyman, di Çalê de mane û evêñ dî ketine hin gundêñ Omeriya. Lê, Osman û Suleyman di Çalê de li ser axatiyê li hev nekirine û bûne dijminê hev.

Ji Suleyman, Mihemed, Ehmed, Huseyn, Evdela, Mecid, şes kur mane. Çawa, ko ji Osman, Evdilkerim, Yusif, Hesen, Ferhan, Şerif, İbrahim, şes kur mane; û ji Mehmûd, Sadûn, Elî, Huseyn, Mihemed, çar kur mane, lê ji Evdirehman, nizanim kî maye? Ev tev ji zariwêñ Esed in.

Lê zariwêñ İsmail, Ehmed, Şêxmûs, Xelîl, sê kur mane û ji Sadûn, Evdilezîz maye.

Ji Huseyn, Elî, İbrahim, Teter, Reşîd, Evdî, Cemîl, Şêxmûs, Qenco, neh kur navdarin, ko mane. Lê dibêjin, yazde Kurê wî bûn û keçekte wî, bi navê Seyro (Seyran) heye, ko istiranek li ser Huseyn, bi navê "Bavê Seyro" hatiye çekirin û di pêşde derbas bûye û min daye xuyakirin.

Lê ji mala Mela Mistefa, ê navdar Hacı Hesen (ku-re Mela Mistefa) e. Ji Hacı Hesen, Bekir, Tahir, Elî, İsmail, çar kur mane; ji Bekir, Mihemed maye; û ji Tahir, Mehmûd, Mihemed mane; ji İsmail, Mihemed maye. Çawa ko ji Elî, Hemdin, Nezi mane. Lê zariwêñ İbrahim, nedane zanîn! Tenê ji Evdilezîzê kurê Sadûn, bi navê Ehmed kurek maye.

Eşîra Omeriya, gelek mezin û gundêñ wan avane. Hin gund hene, ko hezar mal têde rûniştî ne. Çawa, ko Omerî ji bermayê Metîna (Mîtana) mane, ko navê paytexke wan heta iro ji, Metîna ye. Çawa ko Hewrka, bermayê Hewrên kevnarene, ko Hewr û Mît yet eşîr bûn û bermayê Sobar bûn, ko berî çar hezar sal fermandarê Kurdistan û Rojhilata Navîn bûn û sinorê welatê wan ê jêri heta jera Xezê, jera Felestînê diçû û dostanî û mirovanî bi fermandarêni Misrê re kiribûn. Lê paşê weke me iro, bune du perçe û li ser mezinahiya dewlete şer kîrin û parçekî xwe da ber sîngâ Hêtît û Hewr; xwe da ber sîya Aşûr û dawî herdû dewlet ji, di nav bargiraniya zor û se-tema dijmin de winda bûn.

Çawa, ku ji Kerkük heta Ava Sipî: Ögarît, di bin destê Mîtan, Hewr de bû. Çawa, ko gelek diriste ko

Hewrahîyên iro, ko li jêra Sûriya dikevin, bermayê wan Hewrên kevnare bin! Ji ber, ko kincê jinêwan gelek nêzîkî girêdana Kurden Mîtanî ne. Tenê zimanê xwe ji bir kirine û xwe ji Erebêngîn dijmîerin. Lê ruçikêñ jin û mîrêwan ji, neweke girêdan û rûçikêñ Erebêngîn pêşî ne!..

\*\*\*

## SULEYMANÊ EMER

Suleymano, lo lawo!  
Geli xwedan eynelîna!  
Xwe bidin hafê bêndera!  
Geli xwedan kurmancina!  
Xwe bidin şerê giran û gîrbela!  
Şerê mala kîfir girane,  
Ji êvara xwedê de ketiye  
ser darê bêxwedîyê mawîzera  
Suleymano!

De lolo hekîmo qurba! tê ji Helebê  
tê rabî dermana ji birîna Suleymanê  
min re çêkî ji şekir û şebê,  
Xwedê şes topa têxî mala xwedyê  
gula mawizerê, sê tilî girtime  
Ji serê bêxwedîya vê kezebê  
Suleymano!

De lolo hekîmo qurba! tê ji Ana  
ji birîna Suleymanê min re çêke  
dermana û sêbarî di hetwana!  
Ezê neketime heyra kuştina  
Suleymanê Emer, kuştin kuştina mîra ye,  
Lê ezê ketime xema wê xemê Suleymano!  
Ko cotê xatûnan û zerîyan,  
di piştî çavê Suleymanê min re  
li Bircabelek, bêxwedan û xwedî mane  
Suleymano!

De gelî xwedan eynelîna! xwe bidin  
hafê bêndera!  
De gelî kurmancîna!  
Xwe bidin serê giran û gîrbela!  
Şerê mala kîfir girane,  
Ji êvara xwedê de ketiye  
ser darê bêxwedyê mawizera,  
De laşê Suleymanê mi nazike, Suleymano!  
Dayê!...  
Dane ber qeftê bêxwedîyê di xencera  
Suleymano!

### SEÎDÊ NADO

Bi rastî istirana ser vî gernasî gelek hêjaye, ko  
bê nivisîn. Lê mixabin, ko ez vê istiranê ji ber xwe  
nizanim.

Ü ez tarîxa jîngariya wî jî, nizanim û serpêhatîya  
eşîra wî jî, nizanim. Lê ez, dixwazim bikolim û çawa  
te bîra min, navê Seîdê Nado, di du şeran de hatiye  
gotin.

Herwekû pir diriste, ko ji eşîra Cibiran bî!... Ü  
ev eşîra Cibiran, eşîreke mezin û navdare. Dikevî  
rajore welatê Kurdistanê.

\*\*\*

NAVEROK

BES 1

perçem yekem: HELBEST Ü BERDİLАН

Ez kevokim lê lê	12
Ax û aman Gulê	14
Emoşê	18
Ez Xelefim	22
Baranek barî	23
Bejnê	24
Tu li vê têlê	25
Tê ji Mezrê de	27
Taqîbelekê	28
Sultanê	30
Sêvê	31
Xanikê tu xanî	32
De wer lê lê	34
De berde	36
De kina min, kina min lê	37
Zêr Zeynebê	39
Zêrberbenî	41
Zeko, Zekîya	43
Zeyno, Zeyneba min	45
Zeyno	46
Ji pelê darê	48
Şemlê, Şemlanê	49
Şerînê tevde gul	50
Lê Meyro Meyremê	51
Xeyda	52
Xezala min	54
Ferho	55
Kezîzerê	56
Kemalo	58
Şerefo	59
Kerîm lawo çeqilmast	59
Kerîm lowo mire dew	60
Gundê bêri	61

Gulê hey narê . . . . .	62
Leylo, leylo . . . . .	63
Leylanê . . . . .	64
Lêlê kinê . . . . .	65
Lo şivano . . . . .	66
Lawiko nobedaro . . . . .	67
Lê Nûrê . . . . .	68
Lûrka lûrka . . . . .	69
Lê Gewrê . . . . .	70
Lê Nazê, Nazê, Nazê . . . . .	72
Lê Nazê Nazê. . . . .	72
Masîko. . . . .	74
Lê Canê . . . . .	75
Mamûro. . . . .	76
Mamîro. . . . .	77
Memyanî Memo. . . . .	78
Nazlıyê . . . . .	79
Nofa Nofelê . . . . .	81
Ne li male. . . . .	82
Nêrgizê . . . . .	83
Narûnê Narûna min . . . . .	84
Narinê hey Narîn. . . . .	85
Hey mîro. . . . .	86
hay celebe. . . . .	87
Hay de nayê . . . . .	90
Hay dil, hay dil. . . . .	91
Hayla Bêzê. . . . .	93
Wê li ser banî. . . . .	94
Wele naçme ber garanê . . . . .	95
Yar yar li min Qudretê. . . . .	96

### perçê duwem: BERDAN

Berdan. . . . .	97
Bejna zirav . . . . .	98
Berdestarî. . . . .	101
Baran Bego! dibarî. . . . .	102

**perçê sêyem: BERDESTARI**

Destar gerîya . . . . .	103
De hûrik hûrik. . . . .	104
De bihêñ bihêr. . . . .	104
Eba-gewro . . . . .	105
Girtikê hepsa . . . . .	105
Xanimokê. . . . .	106
Heyla delalê. . . . .	108

**perçê çarem: BERBÜKİ**

Berbuki . . . . .	110
-------------------	-----

**perçê pêncem: STRAN Û LAWIK**

Bazo qurba. . . . .	111
Bavê Seyro. . . . .	112
Bavê Behcet . . . . .	114

**perçê şeşem: LAVIJ**

Bavê Fexriya. . . . .	116
Hesenê Müsa . . . . .	118
Xerabo. . . . .	125
Delalê Beriyê . . . . .	131
Feqî û Eyşanê . . . . .	135
Wî wî li min . . . . .	139
Besna Xelîl . . . . .	151
Sînem Xan . . . . .	154
Eyşana Mîrza Begê . . . . .	160
Gewrê . . . . .	164

**perçê heftem: AVİJË BOTAN**

Lavêjê Botan. . . . .	167
Esmer û gewra . . . . .	168

**BEŞ II**

Avêtinaser, yan ser û serpêhatî . . . . .	173
Ehmedê Hecî Evdila . . . . .	174

Kuştina Seîdê Ehmed . . . . .	176
Ehmedê İskan. . . . .	179
Serpêhatîya Bişarê Çeto . . . . .	181
Cemîlê Çeto . . . . .	184
İskanê Qasim. . . . .	186
İsmailê Xelîl . . . . .	188
Bavê Behcet . . . . .	189
Tahirxanê Cazê. . . . .	192
Tacidînê Hacı Osman . . . . .	193
Sadûnê Axê Omeriyan . . . . .	198
Suleymanê Emer. . . . .	201
Seîdê Nado . . . . .	202

**WEŞANÊN ROJA NÛ**